أَعْلَمُ قَلْبًا كَادَ بِالْبَيْنِ يَثْلَفُ
دَعْوَنِي فِي وَجْدِي وَلَا تَنَكَلْفُوا

وَدَعْنَهَا وَيَدِي الْيَمِينِ لِأَدْمُعِي
قَالَتْ: أَمَا تَحْشِي الْفَضِيحةَ؟ قُلْتُ: لَا

Durun! Ayrılmadan önce bana bir bakış bahşedin, ayrılıktan ölmek üzere olan bir kalbi tedavi edeyim. Bunu bana arz etmek zorsa şayet, beni öylece bırakın, zorlanmayın (1/230).

فَإِلَى مَنِي هَذَا الصُّدُودُ إِلَى مَنِي
فَعَوَانِدُ الْغَرْلَانَ أَنْ تَتَلَفَّتَا
مَا كُلُّ هَذَا الْأَمْرُ يَحْمِلُهُ الْفَتَى

فَلْبُ الْمُتَائِمِ كَادَ أَنْ يَتَفَتَّتَا
يَا مُعْرِضًا عَنِي بِغَيْرِ جَنَاحِيَةٍ
صَدْ وَهَجْرُ رَائِدُ وَصَبَابَةٌ

Aşağıın kalbi parçalanmak üzeredir, bu yüz çevirmek ne zamana kadardır ne zamana? Ey öldürmekten başka benden razı olmayan kişi, ahuların vergileri yüz çevirmektir; Engel, terk, fazlalık ve özlem, genç bütün bunlara nasıl tahammül edebilsin (1/274).

مُسَلِّمًا بِإِشَارَاتِ الْمُحِبِّيَا
لَا نَهُ لَيْسَ يَدْرِي أَيْنَ أَمْسِيَا
لَمَّا مَضَوْا بِي سَرِيعًا مُسْتَخْفِيَا
عَلَى الْغُصُونِ ثُبَاكِيَا وَتَذَعِيَا
مِنَ التَّفَرُّقِ مَا بَيْنَ الْمُحِبِّيَا
وَالَّدَّهُ مِنْ صِرْفِهَا بِالْقَهْرِ يَسْقِيَا
وَعَنْكُمُ الْآنَ لَيْسَ الصَّيْرُ مُجَدِّيَا

بِاللَّهِ يَا دَارُ إِنْ مَرَ الْحَبِيبُ ضُحَى
أَهْدِيهِ مِنَا سَلَامًا رَاكِيَا عَطِرًا
وَلَسْنُثُ أَدْرِي إِلَى أَيْنَ الرَّجِيلُ بِنَا
فِي خُنْجِ لَيْلٍ وَطَيْرُ الْأَيْكَ قَدْ عَكَفَتْ
وَقَالَ عَنْهَا لِسَانُ الْحَالِ وَأَحْرَبَا
لَمَّا رَأَيْتُ كُؤُوسَ الْبُعْدِ قَدْ مُلِتْ
مَرْجِنُهَا بِجَمِيلِ الصَّبْرِ مُعَذِّرًا

Allah'a yemin olsun ki ey yurt, eğer sevgili kuşluk vaktinde buradan geçip sevdiklerimizin işaretiley selam verirse. Bizden ona temiz ve hoş kokulu bir selam hediye et, çünkü o nerede gecelediğimizi bilmez. Bizi nereye götüreceklerini bilmiyorum, beni hızlıca götürdüklerinde ve sakladıklarında. Bir gecenin karanlığında, ike kuşu ise dalların üzerine konmuş bize ağlamakta ve yasımızı

tutmaktadır. Onun hakkında *hal diliyle* söyle demekte: Yazık sevdiklerimizle olan ayrılığımıza. Ayrılık kadehlerinin dolduğunu görünce zaman ise zorla berrak şarabını içirmektedir bize. Özür dilerek onu güzel sabırla karıştırdım, sizin ise sabrınız yoktur şimdi işimize yarayan! (2/174).

Binbir Gece Masalları adeta firak ve visal konusunda hazırlanmış bir kitaptır. Bu eserde ayrılık ve kavuşmanın her türlü ile ilgili pasajlar bulmak mümkündür. İnsanların birbirlерinden ve mekândan ayrılığı ve birbirlerine olan visaline degenirken hayvanlar da unutulmuş değildir. 887. pasajda geçtiğine göre Vezir, Nureddin'in hapsedilmesini, Sâbik ve Lâhik adında kardeş atlarının her birisinin ise farklı diyalara gönderilmesini emreder. Kisra melikleri ve Cezayir beylerinin elde etmek için çaba gösterdikleri bu atlardan birisi göz hastalığına yakalanır. Vezir ülkesinin bütün baytarlarını atı tedavi etmek için getirttiği halde hiçbirisinin tedavisi fayda vermemiştir. Melik'in veziri olan tek gözlü damadı: Efendim bu atları bana teslim edin, tedavi edeyim, der. O da atı Nureddin'in mahpus tutulduğu ahıra götürmek ister ancak at etraftakileri rahatsız edecek derecede bir kişneme ile direnmeye çalışır. Vezir bu durumun ancak atın kardeşinden ayrılığından dolayı olduğunu anlar ve bu durumdan Melik'i haberدار eder. Melik olayı yakından inceledikten sonra şöyle der: Mademki bu bir hayvan olduğu halde kardeşinden ayrı kalmaya dayanamaz, akıl sahipleri nasıl ayrılık acısına dayansın? Daha sonra Melik: Bu atı kardeşinin yanına götürün, diyerek tekrar bu atların bir arada kalmasını sağlar (6/61).

4.2. Vatan hasreti

Binbir Gece Masallarında vatandan ayrı kalmanın hüznü de işlenmektedir. Zira mekânın insan üzerindeki etkisi büyüktür. Kültürümüzde bu durum “coğrafya kaderdir” mottosuyla ifade edilmektedir. İnsan hem maddi hem de manevi bir şekilde mekânın etkisinde kalmaktadır. Buna binaen mekândan ayrılık insana zor gelmekte ve mekâna dönüş insanda olumlu bir intiba bırakmaktadır. Bu durumu *Binbir Gece Masallarında* birçok yerde görmek mümkündür. Mesela; Sultan Ömerü'n-Numân'ın iki oğlu olan Şarkân ve Davû'l-mekân'ın öyküsünün anlatıldığı bölümde, ikiz kız kardeşi Nûzhet'le birlikte kutsal Hicaz bölgesi oradan da Kudüs şehrine giderler. İkisi de yolda hastaları ve Kudüs'te bir otel odasını kiralarlar ve bu sürede yaşanan maceralar sonunda yaşadığı ateşli hastalık sebebiyle bilincini yitiren Davû'l-mekân, gözünü açınca Kudüs'te olduğunu öğrenir. Gurbet ateşi ve sevdiklerinden uzak düşmesi, Davû'l-mekân'ı üzeri ve bu durumu aşağıdaki şiirle dile getirir:

وَمِنْ أَجْلِهِمْ قَامَتْ عَلَيْ قِيَامَتِي فَقَدْ رَقَّ لِي مِنْ بَعْدِكُمْ كُلُّ شَامَتِي ثُخِفَّ أَحْوَالِي وَفَرَطَ صَبَابَاتِي	لَقْدْ حَمَلْنِي فِي الْهَوَى فَوْقَ طَاقَتِي أَلَا فَارِفُوا يَا هَاجِرُونَ بِمَهْجُونِي وَلَا تَمْنَعُوا أَنْ تَسْمَحُوا لِي بِنَظَرِي
---	--

سَأَلَتْ فُؤادِي الصَّبَرْ عَنْكُمْ فَقَالَ لَيْ إِلَيْكَ فَإِنَّ الصَّبَرْ مِنْ غَيْرِ عَادِتِي

Aşkı takatimin üstünde yüklemişler bana, bundan dolayı kıyametim kopmuştur. Ey göç edenler, ruhuma arkadaşlık edin, sizden sonra başıma gelene sevinen herkese acırım. Bana af nazarıyla bakmak isteyenleri engellemeyin, halimi ve aşırı aşkımlı hafifleten. Gönlüme size karşı sabrı telkin ettim, şöyle dedi bana: kendi işine bak, sabır adetim değildir benim! (1/338).

Yukarıdaki şiirlerden de anlaşıldığı üzere Binbir Gece Masalları'nda firak ve visal olgusu ile alakalı pek çok malumat bulunmaktadır. Bu ise, bir makaleden ziyade, alana özgü olarak müstakil bir eserin kaleme alınmasını gerektirmektedir. Bu durum ilgililerin çalışmalarına havale edilmiş ve konu ile ilişkin bilgilerin bulunabileceği sayfalar aşağıdaki gibi listelenmiştir:

1. Cilt: 81, 100, 107, 119, 125, 128, 146, 147, 230, 274, 299, 312, 313, 315, 323, 335, 338, 342, 347, 351, 352, 372, 379, 386, 391, 392, 393, 396, 431, 432, 516, 544.
2. Cilt: 54, 67, 69, 111, 155, 156, 161, 282, 303, 327, 328, 329, 330, 369.
3. Cilt: 25, 47, 49, 61, 150, 151, 166, 173, 175, 343, 396, 497, 507, 527, 528, 538, 550.
4. Cilt: 200, 202, 246, 335, 348, 421, 436, 478.
5. Cilt: 46, 57, 67, 69, 72, 74, 75, 80, 200, 208, 209, 216, 226, 227, 232, 244, 247, 248, 249, 253, 259, 265, 266, 292, 295, 322, 344, 412, 424, 425, 432, 453, 456.
6. Cilt: 20, 27, 28, 45, 52, 61, 66, 157, 186, 280, 286, 338, 359, 370, 371, 378, 448, 468.

Sonuç

Binbir Gece Masalları, yazarı ve yazılan zamanı bilinmeyen, bir ana hikâye içinde örülülmüş ve birbiri ile bağlantısı olan masalların olduğu bir masal külliyatıdır. Yüzlerce hikâyeden oluşan bu masalların ana karakterleri, karışı tarafından ihanete uğrayan ve bundan dolayı bütün kadınlardan nefret eden Kral Şehriyâr ve vezirinin kızı Şehrâzât'tır. Binbir Gece Masalları, destan, masal, hikâye, menkîbe, fıkra vb. eğlendirici anekdotları barındıran zengin bir masal mecmasıdır. Kökeni Hint ve Fars efsanelerine dayanan çerçeveli masal tipinde olup ana masal etrafında birbiri ile bağlantılı veya bağımsız birçok masalı barındıran bu mecmua edebiyat tarihine "Arap Geceleri" olarak da geçmiştir. Doğu halklarının ortak mirası olan Binbir Gece Masalları barındırdığı zengin içerikle tarihten beri dikkatleri üzerine çeken kültürel bir hazine özelliğini taşımıştır.

Binbir Gece Masalları, transferi sırasında temel değişimlere uğramıştır. Orjin olarak Doğu halklarının mezâkını hâvî bu masallar, Arap alemine nakledildiğinde muhteva ve şekil açısından büyük değişimlere uğrayarak adeta Araplaşmış veya İslamideşmiştir. Böylece sadece hikâyelerin temel kahramanlarının isimleri aynı kalmış ve bu hikâyelere sonradan karakterler eklenmiştir.

Binbir Gece Masalları, Abbasî halifesî Harun Reşîd'in devrinde râvîler tarafından eğlence toplantılarında söylenir hale gelmiş ve böylece halk arasındaki popülerliği artmıştır. Ayrıca bu dönemde Bağdat ve civarında eskiden beri anlatılan masalların da bu mecmuaya girmiştir. Binbir Gece Masalları Abbasilerle birlikte Fâtîmîler ve Memlüklüler döneminden beslenerek son şeklini almıştır.

Binbir Gece Masalları, eskiden beri araştırmacı ve edebiyat tarihçilerinin dikkatini çekmiş ve araştırmalara konu olmuştur. Hint, Fars ve Arap dünyasında bilinen bu hikâyeler Batı dünyasına çeviri yoluyla aktarılmıştır. Bu eserin ilk çevirisi Fransızca olup şarkiyatçı Antoin Galland tarafından gerçekleştirılmıştır. Daha sonra Edward William Lan tarafından İngilizceye ve Enno Littmann (ö. 1958) tarafından da Almancaya çevrilmiştir. Bu mecmua Sultan Abdülmecid zamanında Ahmed Nâzîf Efendi tarafından *Terceme-i Elf Leyle* ve *Leyle* adıyla Türkçeye aktarılmıştır.

Binbir Gece Masalları sosyo-kültürel birçok konuyu barındırmaktadır. “Firak ve visal” olgusu bu konuların başında gelmektedir. Firak, bir yerden veya bir kimseden ayrılma, ayrılık demektir ve hicrân ile eş anlamlıdır. Visâl ise bir yere veya bir kimseye varmak veya ulaşmak demektir, sîla ile eş anlamlıdır. Firak ve visal olgusu hakiki ve mecâzi olmak üzere iki çeşittir. Fani bir şeye olan şiddetli tutkuya “aşk-ı mecâzi” denilmiştir. Belli bir aşamadan geçen bu aşk ve sevginin zamanla “aşk-ı hakiki”ye dönüşme imkânı bulunmaktadır.

Arkaik dönemlerden kopup gelerek misafir olduğu her milletin kültüründen nemalanınan Binbir Gece Masallarının Arap kültürüne çok şey kattığı gibi, bu kültürden aldığı zengin bir miras da vardır elbette. Bu yönyle bu masallar din, dil, edebiyat, folklor, kültür, düşünce gibi Arap havsalasının oluşumuna katkı sağlayarak bir “hars” meydana getirmiştir ve bu harsı sonraki kuşaklara aktarmaya aracılık etmiştir.

Kaynakça

- Akalın, Ş. H. (2011). Türkçe Sözlük. Ankara: Türk Dil Kurumu Yayıncıları.
- Attâr, F. (1990). Mantık al-Tayr. Abdülbaki Görpînarlı (trc.) İstanbul: M.E.B Yayınları.
- Aykaç, N. (2023). Binbir Gece Masallarında Kök Değerler ve Masalların Çocuk Edebiyatına Katkısı Üzerine Bir İnceleme. Basılmamış Doktora Tezi. İnönü Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Malatya.
- Boratav, P. N. (2012). Halk Hikâyeleri ve Halk Hikâyeciliği. İstanbul: Tarih Vakfı.
- Câmî, A. (1958). Heft Evreng. Murtazâ Müderris-i Gîlânî (nşr.) Tahran.
- Ed-Da'ca, M. M. (2020). Mezâhirü'l-fesâdi'l-ictimâi fi'l-asri'l-Abbâsî es-sânî. Camiatü'l-Ezher, Mecelletü Külliyyeti'l-lugati'l-Arabiyye Bi-İtâyi'l-Bârûd. Cilt: 33, Sayı: 9. 2. Baskı, ss. 10387-10443. doi: [10.21608/JLT.2020.143533](https://doi.org/10.21608/JLT.2020.143533)
- Ebû Zahv, F. H. M. (2012). Mecâlisü'l-lehvî fî Kusûri'l-Hulefâ fi'lasri'l-Abbâsî el-evvel. Nablus: Camiatü'n-Necâh el-Vataniyye.
- Elf Leyle ve Leyle. (2017). ABD: Müesselü Hindâvî.

- Feeqîyê Teyran&Xemgînê Xanî. (2022). Dîwana Şêxê Sen'anî Bi Xezela Feqehe Teyra
û Xemgînê Xanî. Ahmet Gemî&Aslam Jankır (hz.) Van: Weşanên Peywend.
- Gemi, A. (2016). "Feriduddin Attar'ın Etkisinde Gelişen Gülsehrî ve Feeqîyê Teyran'ın
Şeyh San'an Hikâyesinin Mukayesesi", Uluslararası Sosyal Araştırmalar
Dergisi, Cilt: 9, Sayı: 45, ss. 107-115.
- Gemi, A. (2016). Turks in The Thousand and One Nights. William Taylor (ed.)
Turkey, Looking Behind and Before içinde (s. 172-176). London & İstanbul:
Published by AGP Research.
- Gibb, H. A. R. (2017). Arap Edebiyatı. Onur Özatağ (çev.). Ankara: Doğu Batı
Yayıncıları.
- Goldziher, I. (2012). Klasik Arap Literatürü. Rahmi Er ve Azmi Yüksel (çev.) Ankara:
Vadi Yayıncıları.
- İbn Manzûr. (?). Lisânü'l-Arab. Emin Muhammed Abdülvahhab-Muhammed Sadık
Ubeydî (hz.). Beyrut: Dâru İhyâ'i-Türâsi'l-Arabî.
- İbnü'n-Nedîm, M. (1978). el-Fihrist. Beyrut: Dâru'l-ma'rife.
- Mesûdî. (2005). Mûrûcü'z-zehab. Beyrut: Mektebetü'l-asriyye.
- Mevlâna. (2003). Konularına Göre Açıklamalı Mesnevî Tercümesi. Şefik Can (trc.).
İstanbul: Ötüken Yayıncıları.
- Nicholson, R. A. (2007). "Binbir Gece (Masalları)." Süleyman Tülükü (çev.) Atatürk
Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, sayı: 27, ss. 307-313.
- Oestrup, J. ve Macdonald, D. B. (2001). Binbir Gece. İslâm Ansiklopedisi, Eskişehir:
Millî Eğitim Bakanlığı Yayıncıları, Etam A.Ş. Matbaa Tesisleri.
- Tâberî. (1967). Târîhü't-Taberî. Muhammed Ebü'l-Fadl İbrahim (thk.) Beyrut:
Dâru'l-maarif bi-Mîsr.
- Ulutürk, V. (1992). Binbir Gece. Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi. İstanbul:
Türkiye Diyanet Vakfı Yayıncıları.
- ez-Zevzenî, H. (1992). Şerhü'l-muallekâti's-seb'. Beyrut: Dâru İhyâ'i-t-türâsi'l-Arabî.

Bêcîh û Bêwar: Di Berhemên Fawaz Husêن de Wuslat û Fîraq

Mehmet Şirin Filiz¹

Yersiz Yurtsuz: Fawaz Husêن'in Eserlerinde Firaq ve Wuslat

Öz

Firak ve vuslat antikiteden günümüze edebiyatta sıkılıkla işlenen konularıdır. Bu konular bir şeyden ayrılış ve bu şeye karşı duyulan özlem şeklinde edebiyatta görülür. Bu şey sevgili ya da vatan olabilir. Bu çerçevede vatandaş ayrılmış ve vatana duyulan özlem firak ve vuslatın bir türüdür. Bu tür anlatılarda kahramanın farklı nedenlerden ötürü vatanından ayrılmak zorunda kalması ve ülkesine geri dönerek vuslata ermesi şeklinde edebiyatta görülmektedir. Bu konular daha çok diaspora edebiyatında görülür. Göçmen edebiyatı olarak ta bilinen bu edebiyatta göçmenlerin yeni ulaşıkları kentlerde karşılaşıkları sorunlar ile anavatanlarına duydukları özlem ve geri döème arzusu ana konulardır. Benzer konular Kürt diaspora edebiyatında da görülebilir. Avrupa'ya göç eden Kürtler burada önemli bir kürt diaspora yazar çevresi oluşturdu. Bu çerçevede kırk yılı aşkın bir süredir Pariste yaşayan Fawaz Husêن firak ve vuslat konularını eserlerinde en çok işleyen yazarlardan biridir. Bu nedenle bu çalışma onun anlatı dünyasında firak ve vuslatın nasıl işlendiğini göstermeyi amaçlamaktadır. Bu çerçevede, bu çalışmada onun roman ve öyküleri incelenmiştir. Sonuç olarak görülmüştür ki onun anlatı dünyasının merkezinde doğduğu şehir olan Amûdê ile sürgünde yaşadığı şehir Paris bulunmaktadır. Amûdê çocukluğunun, yarı kalmış düşlerinin şehriyken Paris ise yabancılasmının ve melankololin şehridir. Karakterleri de bu iki şehir arasında yersiz yurtsuz bırakılmış ve bugün vuslata erme umudu ile yaşayan karakterlerdir.

Anahtar Kelimeler: Firak, Vuslat, Göç, Yabancılaşma, Melankoli, Fawaz Husêن.

¹ Dr. Öğr. Üyesi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, mehmetsirinfiliz@gmail.com, ORCID: [0000-0003-0622-5510](https://orcid.org/0000-0003-0622-5510).

Makale Gönderilme Tarihi: 06.06.2024, Kabul Tarihi: 26.08.2024

Homeless: Firaq and Wuslat (Seperation and Meeting) in the Works of Fawaz Husêن

Abstract

Firaq and Wuslat (Seperation and Meeting) are common subjects in literature from antiquity to the present day. These subjects take the form of separation from something and longing for it. This can be a lover or a homeland. In this context, leaving from and longing for the homeland is also a form of firaq and wuslat. In such narratives, the protagonist's leaving from his homeland for various reasons and his return to his homeland are main subjects. These subjects are mostly seen in Kurdish diaspora literature. In this literature, also known as immigrant literature, the main themes are the problems faced by immigrants in the cities they have recently arrived in, and the longing they feel for their homeland and the desire to return. Within this framework, similar themes can also be seen in diaspora literature. Kurds who migrated to Europe formed an important circle of Kurdish writers. Fawaz Husêن, who has been living in Paris for more than forty years is one of the most prominent writers in this context, dealing with the themes of firaq and wuslat in his works. Therefore, this study aims to show how the subjects are treated in his narrative world. In this framework, his novels and short stories were analyzed. As a result, it is seen that Amûdê, the city of his birth, and Paris, where he lived in exile, are at the center of his literary world. While Amûdê is the city of his childhood and unfinished dreams, Paris is the city of alienation and melancholy. His characters are also displaced between these two cities and live with the hope of one day reaching a final resting place.

Keywords: Firaq, Wuslat(Seperation and Meeting), Migration, Alienation, Melancholy, Fawaz Husêن.

Bêcîh û Bêwar: Di Berhemên Fawaz Husêن de Wuslat û Fîraq

Kurte

Fîraq û wuslat ji demêñ kevnare heyâ serdemâ me gelek caran bûne mijar edebiyatê. Ev mijar wekî ji veqetîna tiştekî û bêrîkirina wî di edebiyatê de cih digrin. Ev tiş dikare bibe maşûq an jî welat. Di nav vê çarçoveyê de veqetîn û bêrîkirina welat jî cureyeke wuslat û fîraqê ye. Di vegêranêni bi vî rengî de lehengek ji ber sedemêñ cuda mecbûr dimîne ku ji welatê xwe derkeve û paşê jî vedigere welatê xwe anku digihîje wuslatê. Ev mijar bêtir di edebiyata dîasporayê de têne dîtin. Di vê edebiyatê de ku wekî edebiyata penaberan ji tê dizanîn problemen penaberan ku ew li xeribiyê rûbirû mane û hesret û vegera welat mijarêñ sereke ne. Mijarêñ bi vî rengî di edebiyata kurdî ya dîasporayê de jî têne dîtin. Kurdêñ ku gîhaştin Ewropayê li vir derdorekî giring ya nîvîskarêñ dîasporayê ava kirin. Fawaz Husêñê ku ev jî zêdetîrê cil salî ye li Parîsê dijî, wekî nîvîskarekî dîasporik yek jî wan nîvîskaran e ku herî zêde van mijaran di edebiyata xwe de bi kar anîye. Ji ber vê sedemê ev xebat

dil dike ku destnîşan bike ka gelo di cîhana wî ya edebî de wuslat û fîraq çawa reng vedane. Di nav vê çarçoveyê de di vê xebatê de, kurteçîrok û romanên wî hatine analîzkirin. Di encamê de hatiye dîtin ku di navenda cihana wî ya edebî de bajarê Amûdê ku ew lê ji dayîk bûye û bajarê Parîsê hene ku ew li wir di sirgûnê de dijî. Amûdê bajarê wî yê zarokatiyê û xewn û xeyalên nîvcomayî ye û Parîs jî bajarê biyanîbûn û melankoliyê ye. Karakterên wî jî di navbera van herdu bajaran de bê cih û bê war mane û bi wê hêviyê dijîn ku rojekê vegerin welatê xwe anku bigihîjên wuslatê dijîn.

Peyvîn Sereke: Fîraq, Wuslat, Koçberî, Biyanîbûn, Melankolî, Fawaz Husêن.

Extended Abstract

Fîraq means separation from a person, thing, or object that is longed for, and wuslat eans the end of longing. These concepts have been the subject of different branches of literature. In love narratives, they are mostly seen in the form of separation from and reunion with the beloved, while in religious narratives they take on a mystical appearance and take the form of reunion with God. However, from mythological narratives to modern narratives, wuslat and fîraq are also seen in many narratives in the form of leaving and returning to the homeland. The first known example of this is the *Odyssey*. In this epic, Odysseus' forced leaving from his homeland Ithaca, and the troubles he suffered while returning to his homeland constitute the center of the narrative. From Odysseus to the present day, the themes of migration and return have been covered in literature because the phenomenon of migration continues to be at the center of many political and social problems in the world. In the age we live in, millions of people from different geographies of the world leave their homelands and migrate in search of a better life. These migrant communities create their own artistic and cultural works by forming diaspora communities in the new countries they reach. Within this framework, Kurdish society has also been experiencing the phenomenon of migration for many years. Kurds have been migrating en masse to different parts of the world, especially to European countries, for various reasons, including political, social and economic reasons. Germany, Sweden and France are among these countries. Kurds who migrate to these countries produce their own cultural and artistic works thanks to the opportunities they have gained in these countries. For this reason, we can say that there is a strong Kurdish diaspora literature produced in these countries. One of the most important topics of Kurdish diaspora literature is the problems faced by immigrants in their homeland and the problems they face in which theh have recently arrived. However, it can be said that not every country has a negative image in Kurdish diaspora literature. For example, Sweden has a more positive image in Kurdish diaspora literature because the Kurds living there have better opportunities due to Sweden's immigration policies. France, on the other hand, is not a country that offers good opportunities for immigrant communities. In this country, immigrants, including Kurds, have to live under more difficult conditions than in other European countries. Especially cities like Paris are cities of alienation, poverty and melancholy for immigrants. In this context, as a diasporic writer who has been living in the

diaspora for more than forty years, Fawaz Husêن has deeply experienced the immigration situation. The main subjects of his works are the problems in his homeland and the problems faced by immigrants in Paris, where he lived as an exile. In this context, this study aims to analyze Husêن's works within the framework of wuslat and firaq and to show how the themes of leaving and return are treated in relation to these concepts. Within the scope of the study, Husêن's novels and short stories written in Kurdish were analyzed. As a result, it was seen that the city of Amudê, which he was forced to leave, and the city of Paris, where he was forced to live as an exile, are at the center of Husêن's works. While Amûdê symbolizes the unfinished dreams of his childhood despite all its negativities, Paris symbolizes alienation for immigrants. Therefore, at the center of Husêن's works is the state of being caught between two worlds. The psychological worlds of his characters are also shaped by this in-betweenness. They belong to both worlds and nowhere.

Destpêk

Fîraq û wuslat û di edebiyatê de bi awayêن cuda hatine bikaranîn. Carinan ev herdu têgeh fîraq û wuslata di navbera evîndaran carinan ji wekî ku di edebiyata klasîk de tê dîtin di nav çarçoveyeke olî de têne bikaranîn. Lê ev her du tema bêhtir bi sirgûn û vegera welêt re eleqedar in ku em van di gelek metnêن kevnare de jî dibînîn.² Ligel vê yekê sirgûn û penaberî hêj ji parceyeke jiyana mirovêن modern in, lewra ji ber rêveberiyêن totalîter, îdeolojiyêن fundemantalîst bi milyonan însan mecbur dimînîn ku ji welatê xwe derkevin. Ji ber vê yekê ye ku ev problem di heman demê de, di edebiyatê de jî gelek caran hatiye bikaranîn. Her çend ev wekî tiştekî xerab bê dîtin jî ev yek rê dide ku nivîskarên baş di nav cîhana edebiyatê de derkevin holê (D'addario, 2007: 3). Bo nimûne, li gorî Said (2016: 396) sirgûnbûn ji bo edebiyatê derfetên nû çêdike. Di nav vê çarçevoyê de mirov dikare behsa kesên wekî Sappho, Dante, Comenius, Zola, Mann, Joyce, Beckett bike. Heta îdîa dike ku edebiyata rojava ji aliyêن kesên sirgûn an ji kesên ku li ser sirgûnê ve nivîsine hatiye afirandin. Bo nimûne Beckett, Nabokov, Pound kesên bi vî rengî ne (Said, 2006: 29).

Wekî ku Said ji îdîa dike mirov bi hêsanî dikare bibêje ku di nav edebiyata Ewropayê de sirgûn roleke sereke lîstiye. Ji ber ku gelek nivîskar ji ber sedemên cuda bê cih û bê war mabûn û vê rewşa wan tesir li ser edebiyata wan jî dikir. Ev yek belki herî zêde di nav edebiyata cihûyan de tê dîtin. Lewra dîroka cihûyan ji serdemên kevnare heya serdemâ modern bi sirgûnê re têkîdar e (Volkova, 2021: 11-12). Sirgûn dema ku ne şexsî lê bi girseyî be di encama vê yekê de civakêن dîasporîk derdikevin holê. Ji ber vê yekê ye ku vegêranêن li ser sirgûn û vegerê herî zêde di nav civaka cihûyan de têne dîtin ku em van yekan di metnêن modern ên cihûyan de jî dibînîn. Lewra dîroka wan ya sirgûniyê di heman demê de hişmendiya wan jî ava kiriye. Bo nimûne wekî nivîskarekî modern di berhemên Agnon de ev tema gelek caran xwe didin der ji ber ku Agnon bi xwe jî mirovek sirgûnî bû û mecbûr mabû ku di gelek welatêن cuda de bijî. Ev jî bibû sedem ku sirgûn û veger bibin temayêن sereke di berhemên wî de (Hoffman, 1991). Lê ne tenê di vegaranêن cihûyan de, di heman demê de di gelek civakêن diasporîk yên wekî ermen û yewnan de jî em temayêن sirgûn û vegerê dibînîn.

Heger em di nav vê çarçoveyê de behsa kurdan bikin, mirov dikare bibêje ku ev demeke dirêj e ku kurd ji ber sedemên cuda dev ji welatê xwe berdidin û bi taybetî jî ber bi Ewropayê ve koç dikin. Ev yek jî bû sedem ku dîasporayeke kurdan li Ewropayê derkeve hole. Heya sala 1970yî sedemên koça kurdan ji sedemên siyasî bêhtir ji ber rewşa aborî bû. Lê piştî van salan sedemên koçberiyê guherîn. Lewra ji ber şer û pevçûnan û koçberkirina bi darê zorê, kurd bi girseyî berê xwe dan

² Bo nimûne metna herî kevnare ya di derbarê sirgûnê de pirtûka Sinûhe ye. Sinûhe dema ku Qralê îxtiyar ê Mîsrê dimire dikeve nav fikaran û derdikeve rîwitiyeke dirêj. Ew li Filistînê bi cih dibe lê bi borandina demê rebêriya welatê xwe dike. Dema ku tê fêmkirin tu gunehê wî di kuştina qral de tuneye destûr tê dayîn da ku vegere welatê xwe. Di vê pirtûkê de, Sinûhe behsa çîroka xwe ya sirgûnê dike. (D'addario, 2007: 3).

Ewropayê. Ji ber vê yekê ye ku dîasporaya kurdan beyî fêmkirina rûdanên ku li rojhilata navîn diqewimin nayêن fêmkirin (Wahlbeck, 2019: 5). Lê heger em werin li ser nifşen ewilîn ên ku berê xwe dane Ewropayê, mirov dikare bibêje ku ew ne nifşen politîk bûn. Wekî ku Bruinessen (1998: 8-9) jî diyar dike ev nifşen ewilîn bêtir karker bûn û pir têkîlî sîyasetê nedibûn, lê piştî salên 1980yî ji ber darbeşa leşkerî ya li Tirkîyeyê gelek kesên politîzekerî berê xwe dan Ewropayê. Ev jî bû sedem ku kurdêن li Ewropayê dijîn li nasnameya xwe ya etnîk varqîlin. Bi taybetî jî li Swedê mobîlîzasyona civaka kurdan gelek zêde bû. Ev der ji bo nivîskar, rojnameger û rewşenbîrêن kurdan bû stargehek. Dîasporaya ku li Ewropayê ava bû, di heman demê bû sedem ku jî kurdêن vê derê, ji aliye edebî û çandî ve pêş bikevin. Erê ew penaber bûn lê wan tu carî têkiliya xwe ji welêt nebîrbûn. Lewra wekî Sheffer (2003: 9-10) jî diyar dike civakêن dîasporîk civakêن etno-netewîne. Ev civak her çend bi darê zorê an jî bi daxwaza xwe ji welatê xwe hatibin derxistin jî civakêن sosyopolîtîk in. Ew tu carî peywendiya xwe bi welatê xwe re qut nakin û bi netewa xwe re di nav hevalbendiyeke de hewl didin ku nasnameyek hevpar ava bikin. Di nav vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku dîasporaya kurdan jî dîasporayeke etno-netewîye. Ew bêhtir bi welatê xwe re eleqedar in û têkiliya wan bi welatênen wan tu carî qut nebûye (Wahlbeck, 2002: 225). Li gor Wahlbeck (2002: 232) taybetmendiyêن diasporîk yên civaka kurdan ev in: Ew derbarê welatê xwe de xwedîyê hafizayeke kolektîv in, ji hêla ewropiyan biçûkditîna wan dibe sedem ku ew bibin biyanî û ji ber vê yekê ye ku ew her dem bi wê hêviyê dijîn ku rojekê vegerin welêt.

Ev xalêن ku Wahlbeck diyar dike, di heman demê de, di metnêن edebî yên ku dîasporayê de hatine afirandin de jî bi awayeke aşkera têne dîtin. Her çend ev xal, di nav metnêن nivîskarêن wekî Ferhad Pîrbal, Hêlîm Yûsiv û Firat Cewerî de werin ditîn jî, ev taybetmendiyêن ku Wahlbeck behs dike herî zêde di berhemêن Fawaz Husêن de peyda dibe. Lewra ew ji 40 salî zêdetir e ku li Fransayê dijî û rewşa wî ya penaberiyê bandor li edebiyata wî jî kirîye. Di cîhana wî ya edebî de êşa koçberiyê û hesreta bo welat temayêن sereke ne ku ev yek wekî ku li jor jî hate diyarkirin taybetmendiyên vegêranêن dîasporîk in. Di vê çarçoveyê de ew xebat dil dike ku ka gelo di kurteçîrok û romanêن Fawaz Hûsêن de “fîraq” û “wuslat” bi gotinek din “sîrgûn” û “veger” çawa xwe nîşan didin.³ Ji bo vê yekê jî analîzênen navxweyî tenê têrê nakin di heman demê de hewce dike ku mirov analîzeke sosyopolîtîk jî bike. Heger mirov ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve binêre wekî ku Sapiro (2019: 97- 98) jî nîqaş dike, edebiyata periferîk a ku edebiyata penaberan jî di nav vê edebiyatê de ye, gelek caran li Fransayê bûye mijara analîzênen edebî. Her

³ Di vê xebatê de tene berhemêن wî yên ku bi kurdî hatine nivîsandin esas hate girtin. Ji bilî berhemêن wî yên kurdî hatine nivîsandin berhemeke wî ku hatiye wergerandin bi navê “Qûma Mezopotamya” jî heye. Ev roman pêşî bi frensi bi sere navê “Les Sables de Mesopotamie” hatiye nivîsandin. Paşê jî dîsa ji aliyê Husêن ve hatiye wergerandin û bi sernavê “Piçek Jîyan Qetek Asiman” ji hêla weşanxaneyâ Avestayê hatiye weşandin û paşê jî heman pirtûk vê carê jî bi serenava “Qûma Mezopotamya” ji hêla weşanxaneyâ Ayrıntı hatiye weşandin. Bi awayek balkes di Qûma Mezopotamyayê de hatiye destnîşankirin ev pirtûk werger e lê di “Piçek Jîyan Qetek Asiman” de îbareyek bi vî rengî tuneye. Ji ber vê jî di vê xebatê “Piçek Jîyan Qetek Asiman” esas hate girtin.

çend analizên bi vî rengî bêtir berê xwe didin metnê û analîzên navxweyî bin jî xwendineke sosyopolîtik jî di nav van xebatan de tê dîtin. Lewra serpêhatiyê penaberiyê di metnên nivîskarêن efrîqî de yên wekî Camara Laye, Cheikh Hamidou Kane û Ousmane Soce, bi awayekî taybet têne dîtin. Ji ber vê yekê di vê xebatê de em ê tenê analîzên navxweyî nekin, di heman demê de em ê hewl bidin paşxaneya sosyopolîtik a metnên Hûsêن jî derxin holê. Lewma jî divê pêşî di berhemên wî de welat çawa hatiye teswîrkirin bê destnîşankirin çimkî di berhemên wî de her çend hesret û vegera welat xalêن sereke bin jî di heman demê de rûdanêن ku li welat diqewimin sedemên sirgûniya wî jî ne.

Welat Xeyalê Nîvcomayî

Sirgûn her çend were wateya derketina ji welêt jî carinan mirov dikare li welatê xwe jî sirgûn be. Bo nimûne D'addario (2007: 20) diyar dike ku sirgûna navxweyî (interior exile) jî heye. Sirgûna navxweyî tê wateya ku mirov li welatê xwe jî dikare bibê sirgûn. Ev yek cara yekem ji bo wan kesan hatiye bikaranîn ku mixalifên Hîtler bûn lê dîsa jî mecbûr mabûn ku di bin rêveberiya wî de bijîn. Em heman tiştî dikarin ji bo rewşa kurdan jî bibêjin. Lewra Kurd jî li welatê xwe di bin desthilatdariya rejîmên totaliter ên wekî Baas de mecbûr diman ku bijîn. Ji ber vê sedemê ye ku di navbera kurdêن ku li dîasporayê dijîn îmajeke neyînî ya welat heye. Welat ji bo wan tê wateya girtin kuştin û talanê. Bo nimûne Wahlbeck (2019: 2) diyar dike ku di hişmendiya kurdêن dîasporayê de welat gelek caran cihê trawmayêن kolektîv ên dîrokî ye. Ev rabêj di heman demê de dibe sedema mobîlîzasyona polîtik a tevgera kurdan jî ku ev yek ji bo fêmkirina dîasporaya kurdan jî amûreke baş e. Bi heman awayî li gor Khayati (2008: 158) jî di navbera kurdêن serhedê yên ku li Fransayê dijîn de di derbarê welat de îmajeke neyînî heye. Welat ji bo wan tê wateya îşkence, koçberî, rewşa awarte, aşîmîlasyon, hovîtî, berxwedan û xeribîyê. Ji ber van rûdanen ew mecbûr mane ku dev ji welatê xwe berdin û berê xwe bidin welatê xeribiyê (Khayati, 2008: 3). Ev yek ji bo civakêن diasporik tiştîn hevpar in. Bo nimûne di hişmendiya Diasporaya filistîniyan de welatê wan bûye mêtîngeh û ev yek dihat wateya bêmilk hiştin û înkarkirina dîrok û zimanê wan (Eagleton, Jameson û Said, 1993: 13). Ji ber vê yekê ye ku li gor Said (2009: 210-212) filistînî bêcîh û bêwar hatine hiştinê ew neteweyeke bênasname bûn û ew jî xwe wekî parazvanekî filistiniyên bênasname didît û li gor wî rola rewşenbîr divê nûnerê milleten bindest bûna.

Sirgûn her çend bi giştî parçeyeke vegêranêن dîasporîk be jî di romana kurdî de di romanêن ku li welat hatine nivîsandin jî xwe dide der. Bo nimûne Parîltî û Galîp (2010: 180) dîyar dikin ku di romanêن nîvîskarêن ku ji welat dinivîsinin de jî sirgûn mijareke sereke ye. Lî di yên ku li welat hatine nivîsandin de îmajeke erenî ya welat heye. Bi gotinek din welat hatiye îdealîzekirin lê di yên dîasporayê hatine nivîsandin de welat bi awayeke objektif hatiye teswîr kirin, ew ne cîhekî îdealîzekirî ye. Gund û bajar ji nasnameya xwe ya siyasî bêtir bi nasnameya xwe ya çandî derdi Kevin pêş, karakter ji kesên siyasî bêtir kesên ji rêzê ne. Em van yekan di cîhana edebî ya Husêن de jî dibînin. Welat di berhemên wî de nehatiye îdealîzekirin

lewra ûmajake erenî ya welat tuneye û karakterên wî jî kesên ji rêzê ne. Ew bê cih û bê war in, navê welatê wan li ser nexşeyêñ cîhanê tuneye, bê nasname ne. Bo nimûne Di Evdo û Çend Bêhnikêñ Şadiyê de Evdo welatê xwe bi vî awayî teswîr dike: “Her çend welatê min li ser nexşeya xwiya nebe jî ez dibêjim “Bijî Kurdistan û Yewnanistan dergûşa Îlyada û Odîseyê û hemû xewnêñ rewan!” (Husêñ, 2013: 70). Evdo dema ku diçe Laponyayê ji samiyan re behsa welatê xwe dike û dibêje, Kurdistan xwedî zozanêñ xweşik e, koçer penêr, nivişk û mastêñ xweşik çêdikin lê mixabin li welatê wî kesên wekî Saddam hene ku ev welatî kavil kirine (13). Evdo ji welatê xwe bi darê zorê hatiye derxistin. Lewra li gor wî welatê kurdan cihê dagirkiriyê, dîroka talanêñ bêserî û bêdawî ye. Herkes tê hema ci dikeve ber destê wî ji xwe re dike û dike malê xwe. Em di sedsala 21mîn de ne, lê ne welat ji me re heye ne jî cihekî ewle ku em bikaribin gencîneyêñ xwe veşêrin. Em ji axa bav û kalan koç dikin û mecbûr dimînin ku li welatê xelkê bibin parsek. Em kurd di destê hêzêñ biçûk û mezin de dibin pêlîstok. Em temê doza mafê xwe yê însanî dikin. Li rojhilata navîn li gor dîtina serdestan kurdekî baş kurdekî mirî ye. Kêfa tu kesî ji kurdan, ji zimanê û welatê wan re nayê û Enfal û Helepçeyan layiqî wan dibînîn. Li Suriyê politikaya kemera Erebî⁴, li Tirkîyê jî gund têne valakirin. Li Îranê ji destê softayan kurd êş û azar dikşînin ji destê wan serokê kurdan yên wek Qasimî ji nikarin rizgar bibin. Heya li Ewropayê jî xwîna wan dirijînin. Li rojhilata navîn kurd kerwanêñ bê serî û bê dawî ne (34-35).

Em ûmajâ xerap a welat di Hefteyek Dirêj Li Amedê de jî dibînîn ku li aliyeñî Kurd di bin zextan de ne, li aliyeñî jî kesên ku li ser wan kar dikin xema wan ne zimanê kurdî ye ne jî azadiya gele kurd e. Bêhtir ew ketine li pey berjewendiyêñ xwe yên şexsî û partiyê (Husêñ, 2015: 46). Dîsa ev ûmajâ neyînî di Amîdabadê de jî derdikeye pêşberî me.⁵ Di Amîdabadê de çîrok li Amîdabadê dest pê dikin ku ev der di eslê xwe de Amûdê ye. Vegêr behsa bav û bapîrên xwe dike û dibêje bav û bapîrên me yên ku di gorê de radizin tu carî ne di wê baweriyyê de bûn ku dê rojek wiha çêbibe. Leşkerên Bronzî çav bera gencînî û keçen çavreş û putsipî yên Amîdabadê dabûn. Ew bi ser ketibûn. Gencîniya Amîdabadê ji xwe re birin û leşkerên ên mayî jî çand ziman, orf û edetê xwe bi darê zorê bi amîdabadiyan dane qebûlkirin. Paşê jî leşkerên Bronzî hatin wan jî agir berdan daristanêñ Amîdabadê. Jin û zarokkuştin. Li gor leşkerên bronzî nîjada herî baş û yê mezin ya wan bû. Ji ber van sedeman gelê Amîdabadê mecbûr man ku bidin pey rêya xeribiyê. Koça mezin bi vî awayî dest pê kir. Gelê Amîdabadê dikaribû li ber xwe bidaya lê ew bêhiş bûn û ketin pey riya xeribiyê çareseriyeke erzan (11-14).

Husêñ heman rabêjî di Piçek Jîyan Qetek Asîman de gelek caran bi kar tîne. Heta mirov dikare bibêje ku ûmajâ neyînî ya welat herî zêde bi awayekî aşkera di vê romanê de tê dîtin ku di heman demê de ev romaneke otobiyografiyek e. Di vê

⁴ Polîtîkayêñ erebkirinê gelek caran di edebiyata kurdi de tê dîtin. Bi taybetî jî di nav kurdêñ ku li Suriyê dijîn. Mele Ehmedê Palo jî yek ji wan e ku gelek caran di nav helbesten wî de em rastî vê yekê tên bnr. (Palo, 2022: 45-46-167-238-401)

⁵ Divê mirov bibêje ku di Amîdabadê hey dawî em navê vegêr nabihîsin. Lewra penaber digel ku bênasname ne di heman demê de bênav in jî.

romanê de ew dibêje ku her çend Amûdê warê zaroktiya wî be jî di heman demê de ew cihê êş û azarê ye. Dema ku ew Amûdê pênase dike dibêje Amûda şewitî, paytexta evînê, navnîşana hêvî û birînê ye (Husêن, 2014: 9). Kesekî nabêje Amûda şêrîn heta hin kes dibêjin Amûda şewitî lewra ev der cihê malikwêraniyan e. Cara yekem di sala 1937an de hatiye şewitandin. Lé di sala 1960î de bajar careke din şewitî lê vê carê sinemaya bajêr şewitî Amûdê bi rastî jî bû Amûda şewitî. Sedan zarok bûn qurbanîya vê şewatê. Zarokê Amûdê ji bo ku filmekî temaşe bikin bi darê zorê Sînemeya Amûdê û li wir şewitîn. Li her derê Amûdê tevlîhevî heye. Hin xwe diavêjin ser zarokêni ji şewatê xilas bûne, hin berê xwe didin mizgefta bajêr ji bo ku zarokê xwe yên şewitî bibînin. Bêhna mirinê û goştê şewitî li her derê bajêr berbelav bûbû. Jinan por bi serê xwe nehiştin hin bi cinan ketin. Ji her malê zarokek di wê şewatê de mir (40-42).

Çawa ku desthilatdaran di şewata sînemeya Amûdê de zarokê kurdan ji wan stendibûn bi heman awayî dixwestin ziman û çanda wan jî ji wan bistînin. Bo nimûne Li gor Said (2009: 177) çand di berxwedanê de roleke sereke dilîze. Heger nasnameya siyâsî li ber tunebûnê be, çand ji bo şer û berxwedanê dibe amûreke bêhempa. Lewra parastina çandê di heman demê de parastina hafizayê ye û bi ziman re jî eleqedar e. Bo nimûne li gor Chambers (2005: 37) ziman ne tenê ew tişt e ku bi kêrî ragihandanê tê ew di heman demê de di avakirina nasnameya çandî de jî amûrek e. Bi taybetî jî parastina çand û ziman du xalêngirîn in ji bo civakêngî dîasporîk. Di vê çarçoveyê de mirov dikare heman tiştî ji bo Husêن jî bibêje. Ji bo wî ziman û çanda kurdî rasterast bi nasnameya kurdî re eleqedar e ku rejîma dewleta Suriyê dixwast ziman û çanda kurdî ji holê rake. Rejîma Baas heya sala 1970yî jî politîkaya homojenkirina civaka Sûriyeyê bi rê ve dibir. Li gor vê politîkayê divê hemû hemwelatiyêن Sûriyeyê li derdora îdeolojiya Baasê bûbûna xelek (Tejel, 2009: 59). Em van xalan di berhemên Husêن de jî dibînîn. Bo nimûne di Nameyek Ji Bavê Min Re de ji devê Feremez wiha tê gotin: Li ser axa me ya di navbera Dîcle û Fîratê de, min zimanê frensî û erebî bi hev re li dibistanê xwendin. "Mirov dikaribû fêrî hemû zimanê dînyayê bibûya, tenê zimanê ku ez bi xwey û birayêngî xwe û bi zarokê taxê re dipeyivim qedexe bû." (Husêن, 2021: 36). Dîsa di Piçek Jîyan Qetek Asîman de em rastî heman mijarî tê. Li Amûdê zimanê kurdî qedexe ye mirov nikare li vî bajarî bi zimanê kurdî bixwîne. Ji bo ku mirov kirasê gundîtiyê ji ser xwe biavêje û di nav cihana medenî de cih bigre divê mirov dev ji zimanê kurdî berde û erebêngî ku ji derive têngî divê ji xwe re bike nimûne. Li vî bajarî tenê Mele Ehmedê Herbî bi zimanê kurdî bi zarokan re dipeyive lewra ew ji wî hez dike (Husêن, 2014: 27-28). Mele Ehmedî Herbî di cihana wî ya edebî de cihekî giring digire lewra ew bi kurdî diaxive. Ji ber vê yekê ye ku em Mele Ehmedî Herbî di Nameyek Ji Bavê Min Re de jî dibînîn. Ew qehremanê zarokatiya wî ye.

Li gor Tejel (2009: 63) di politîkayêngî dewleta Suriyeyê de netewperweriya erebî xala sereke bû. Ev yek di sala 1973an de bi awayekî eşkera di makezagona dewleta Suriyê de jî hate nivîsandin. Lewra nasnameya erebî êdî tiştekî wisa bû ku divê herkes bi darê zorê qebûl bikira. Di nav vê çarçoveyê de kurdbûn ji aliyê fermî ve bû tiştekî xeternak. Em van yekan di berhemên Hûsêن de dibînîn. Beriya

desthilatdariya Sûriyeyê, Amûdê cihêkî kozmopolit bû hem warê fileh hem jî ya misilmanan bû. Her çend li vê derê kurd zêde bin jî desthilatdariya siyasî di destê fileh û ereban de ye. Ji kurdan re jî tenê dîn û îman dimîne. Ew ji kurdan re dibêjin tevlî karêni siyasi nebin biçin medreseyan û tenê bi karê axîretê ve mijûl bibin (Husêن, 2014, s. 20). Lê mozaîka ku li Amûdê hebû ji aliyê rejîma Sûriyeyê ve tê xerakirin. Mixaberat dijminatiyi dixe navbera şeniyên bajêr (104). Heta kurd jî herî zêde bi hev du re şer dikin (99).

Rejîma Sûriyeyê bi her awayî dixwaze kurdan tune bike. Ji ber vê sedemê jî ereban li herêma kurdan bi cih dike. Ji ber kemera erebî gelek kurd li ser axa xwe dibin penaber (Tejel, 2009: 62). Ev yek jî di romanê de tê dîtin. Bi şewata zarokêن Sînemeya Amûdê ve Çemê Amûdê jî dikeve ber mirinê. Sed hezar kes li Ceziriyê dibin penaber (Husêن, 2014: 31). Desthilatdariya Sûriyeyê dest datîne ser xaka kurdan û fermandar, cenderme û endamên mixaberatê di wê baweriyê de ne ku ew her ci bixwazin dikarin bi kurdan bikin. Ew bi çavê pez û sewalan li kurdan dînhêrin (86-87). Her çend li Sûriyeyê desthilatdarî biguhere jî ji bo kurdan tiştek naguhere. Kurdbûn wekî afyon e gelek kurd dixwazin ji kurdbûna xwe birevin, hin ji wan xwe dikin ereb hin jî dibêjin em qûreyşî ne (38-39). Li vî bajarî her tişt ji bo ereban serbest e lê ji bo kurdan qedexe ye.

Bo nimûne sînor di Piçek jiyan Qetek Asîman de wekî sembolekê derdikeve pêşberî me. Li gor Nejat Abdullah (2019: 117) piştî têkçûna dewleta Osmanî sînor bû parçeyeke nasnameya polîtik ya kurdan. Lewra erdnîgarî û cîvaka kurdan parce bû. Hamelink û Bariş (2014) di nav vê çarçoveyê de diyar dikin ku sînor bi taybetî di stranêñ dengbêjan de ji ber ku erdnigariya kurdan parçekiriye netiştekî meşrû ye. Sînor tê wateya kuştin, sîrgûn û bêwelatî ku ev gelek caran bûne mijara sînemeya kurdî jî. Bo nimûne di filmêñ Behman Ghobadi em vana bi awayeke aşkera dibinin. Di filmêñ wî de sînor wekî metaforek hatiye bikaranîn. Erdnigariya kurdan ji hêla sînorêñ çêkirî ve hatiye parçekirin. Li gor Kılıç (2009: 150) di filmêñ wî de ya çîrok li sînorê derbas dibin an jî karakter gelek caran di navbera sînorê û Iraqê de diçin û têñ ji ber vê jî sînor cewhera sinemaya Ghobadî ye. Bi heman awayî sînor di romana kurdî de jî mijareke sereke ye ku parçebûna cîvaka kurdan temsil dike (Parıltı û Galip, 2010:182). Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku sînor ji kilamên dengbêjan bigrin heya romana kurdî gelek caran wekî metaforeke ku erdnigariya kurdan parce kiriye hatiye bikaranîn ku em vê yekê di edebiyata Husêن de jî dibinin.

Di Piçek jiyan Qetek Asîman de jî behs tê kirin ku ji bo ereban sînor tuneye. Erebêñ Misrê bi hêsanî dikarin werin Amûdê li wir kar bikin lê di navbera kurdan de sînor hene. Gorêñ wan li aliyê din ê sînor mane ji ber vê jî ew nikarin herin ser gorêñ bapîrêñ xwe jî (Husêن, 2014: 36). Sînor tê wateya leşker, teqîn, memûrêñ xerab yên her du aliyan. Em teswîirkirina îmaja neyînî ya sînor di Amîdabadê de jî dibînin. Di Amîdabadê de vegêr û hevalê wî Seydo xwe bera ber bi sînor didin. Ji sînor tirsa xaza xerdelê kêm nabe, şeniyên bajêr bi vê tîrsê dijîn ku ev referansî qetîfama Helepçeyê dike. Leşkerêñ amerîqî û sovyetê li ber çavêñ wan dikevin. Ew dibe başokeye û difire li ser sînor. Leşkeran bera wî didin ew birîndar dibe. Wê roj sê

milyon kesan dest bi koçê kir û li deriye Ewropayê xistin (Husêن, 2015: 41). Ji ber van yekan mirov dikare bibêje ku sînor tiştekî xerab e di cihana wî ya edebî de. Sînor tiştekî nexwezayî bû, civak û erdnîgariya kurdan parce kiribû û divêbihata rakirin.

Bi îmaja neyînî yê sînor re têkildar, Ferecê Şêxê Koro ku qaçaxçiyekî navdar bû, derdikeve pêşberî me. Li gor Tejel (2009, s. 67-68) qaçaxçitî ji bo kurdên herêma Cizîrê tiştekî giring bû. Bi saya qaçaxçiyen rewşa aborî ya xerab hinek sererast dibû. Her çend Tirkiyeyê dixwast pêsiya vî karî bigre jî qaçaxçitî her ku diçû zêde dibû. Hin qaçaxçî gelek dewlemend bûn û êdî wekî lordên qaçaxçiyen dihatin zanîn. Hin ji van qaçaxçiyen ku girêdayî rejîma Baasê bûn, ji ber vê jî gelek dewlemend bûn û ji xwe re qesran çêdikirin. Lê Ferecê Şêxê Koro berevajî wan dijberî rejîma Baasê bû lewma kurdên herêmê ji wî hez dikirin. Wî ev sînorêñ çêkirî qebûl nedikir. Her du aliyêñ sînor jî welatê wî bûn, ew li ser xaka xwe diçû û dihat û ne mecbûr bû ku li bendî destura her dû hikûmetan bisekiniya. Ji ber vê yekê ye ku Apê Ferecê Şêxê Koro qehremanê Husêن ê zarokatiyê ye. Ew wekî Rustemê Zal, Mîrza Mihemed û Kawayê Hesînkar e. Ew serokê qaçaxçiyen bû û bêhn li desthilatdaran diçikand û digot dewlet ez im. Amûdê ez im (Husêن, 2014:159-164). Lewra Ferecê Şêxê Koro jî wekî Mele Ehmedê Herbî qehremanekî zarokatiya Husêن bû ji ber ku wî jî wekî Mele Ehmedê Herbî desthilatdariya sistema Baasê qebûl nedikir û sînorêñ ku di navbera kurdan de hatibûn xêzkirin parce parç dikir.

Piçek Jîyan Qetek Asîman romana bajarê Amûdê û ya serpêhatiyêñ zarokatiya Husêن e. Ev bajar di bin destilatdariya Suriyeyê de bi mixaberatê hatiye dagirkirin ji ber vê êdî jiyanekî bi aram li vî bajarî nemaye. Ji ber vê jî ew di dawiyê de mecbur dimîne ku Amûdê bihêle û biçe Parîsê. Bi awayekî balkêş dema ku Sûriyeyê terk dike polîsên ku pasaportên wî kontrol dikin jê re astengî dernaxin lewra li gor erebperest û mixaberetê kurdek jî Sûriyeyê derketa ev tiştek baş bû, ji ber ku wan nedixwestin ku kurdek jî li navçeyê bima. Wî wekî Mîrza Mihemed marê ziya nedikuşt û azadiyê li bajarê xwe venedigerand lê herî kêm wî dizanibû ew kî ye û xwe nedifroşt hêzên biyanî. Ew kurdek bû ku nikaribû xwe ji xewnêñ zarokatiya xwe xîlas bike (Husêن, 2014: 261). Erebperestî rî nade ku mirovên li Amûdê dijîn bi rengên xwe bimînîn lewra ew dixwazin herkes bibe wekî hev anku bibin ereb. Ebu Kato jê re dibêje ku divê ew dev jî vî bajarî berde û biçe Parisê anku bajarê ronahiyê. Baweriya wî ew bû zimanê fransî ji bo wî hatiye çêkirin lewra divê ev biçûya Sorbonnê da ku zimanê fransî bixwîne (141). Lê wekî ku em ê di berhemên Husêن yên din de bibînîn çûyîn her çend wekî rîya felatê bê dîtin jî ew ê bi xwe re ês û eleman jî bîne.

Fîraq: Penaberî, Melankolî û Biyanîbûn

Çûyîn ji bo hemû penaberên rîya felatê ye. Ew ji bo ku jiyanekî aram û dewlemend bibînin û ji zilm û zordariyê, ji kuştin, girtin û talanê xîlas bibin direvin. Ji ber vê yekê ye ku penaberî problemeke sereke ya hemû dewletên cîhanê ye lê ji ber ku ji her derê cihanê bi milyonan kes ji bo jiyanekî çêtir berê xwe didin Ewropa û Emerîqayê, herî zêde problema cihana Rojava ye. Êdî komên penaberan li

bajarêن mezin ên wekî London, Berlîn, New York û Parîsê bêhtir xwiya dikan. Her çend welatê cîhana sêyemîn ji hêla welatên Ewropî ve hatibin paşguhkirin jî bi rêya penaberiyê ew dibin parceyeke jiyana Ewropayê. Ew bi xwarin vexwarin, mûzîk û bi aboriya xwe vegeriyan bajarêن Ewropayê û van deran bi her awayî dagir kirine (Chambers, 2005: 12). Bi taybetî jî Parîs bajarekî wisa ye, li vî bajarî ji mêtîngahêن kevnare gelek kes dijîn (Said, 2016: 47). Lê ev rewş dibe sedem ku di nav Ewropayê de gelek problemêن navxweyî derkevin. Bo nimûne îro civakêن dîasporîk li Ewropayê ji hêla gelek nijadperestêن ewropî ve wekî mirovêن nebaş û xetere têne ditîn. Li gor wan ji ber penaberan li Ewropayê aramî nemaye. Digel van yekan ji ber sedemêن civakî, çandî û aborî di navbera civakêن xwedîmal û penaberan de şer û pevçûn derdi Kevin (Sheffer, 2003: 29).

Di nav vê çarçoveyê de her çend kurd wekî civakêن cihana sêyemîn ne ji koloniyên kevin bin jî jiyana wan a koçberiyê ji penaberêن ku li Parîsê dijîn ne zêde cuda ye. Ew jî wekî penaberêن din êşa penaberiyê dikişînin. Heger em behsa hatina kurdan a Fransayê bikin, em dikarin bibêjin ku kurd ji salêñ 1960î ve ji ber sedemêن cuda berê xwe dane Fransayê. Lê ev hejmar her ku diçe zêde dibe. Sedemêن sereke şerê navxweyî ya başûr, Şoreşa İslâmî ya Îranê û darbeya leşkeri ya Tirkiyê ne (Khayati, 2008: 142-143). Le her çend kurd ji bo jiyanekê çêtir hatibin vî welatî jî rewşa heyî û tiştê ku wan hêvi dikirin ne wek hev bûn. Bo nimûne li gor Khayati (2008: 49) kurdêñ li Fransayê dijîn bi taybetî jî kurdêñ serhedê li gorî kurdêñ Swêdê di nav şert û mercêñ xerab de ne. Her çend penaberî tiştek zehmet be jî ji bo kurdêñ serhedê du carê zehmet e. Ew nikarin adapteyî civakê fransiyen bibin, divê mîna ku ew di nav vê civakê de tunene tevbigerin. Ew nikarin xwe bigîhînin saziyên civakî û yên dewletê. Penaberêñ li vir dijîn wekî Swedê di qadêñ sîyâşî û civakî de ne xwedî hêz in. Sedema vê yekê cudabûna polîtîkayêñ fransî yên ji Swêdê ne. Ji ber van yekan ji bo penaberan Fransa ne cihekî mayînê ye, bêhtir wek cihekî transît e. Kurdêñ ku têne vir dixwazin herin deverêñ din yên Ewropayê (Khayati, 2008: 253). Her çend Khayatî van bi taybetî jî bo kurdêñ serhedê yên li Fransayê bibêje jî ev yek ji bo hemû penaberan derbasdar e. Lewra penaber bi rihetî nikarin adaptayî civaka xwedîmal bibin. Said (2014: 249) di nav vê çarçoveyê de dibêje ku sirgûnî xwe her dem wekî çîna dûyemîn dibinin. Ew ziman û çanda serdestan hîn bibe jî ev rastî ew ê neguhere penaberî tiştekî seyr. Ew vê yekê herî zêde dema ku Filistîn di sala 1948an de tê dagirkin hîs dike. Said berê xwe dide New Yorkê ku ev bajar ew ê hêdî hêdî giyana wî bikuje. Li vî bajarî bala tu kesekî ne li ser wî ye, ew tenê penaberek ji rojhilata navîn e (184-185). Li gor wî sirgûnbûn ji aliye zihni ve valahiyek e. Pir zehmet e ku mirov êşa sirgûniyê ji ser xwe biavêje ji ber vê yekê ye ku hem tarîx hem jî edebiyat vê êşê jixwe re kirine mijareke sereke. Her çend mirovê sirgûnî li sirgûnê gelek tiştan bi dest bixe jî ew ê her dem biyaniyek be (Said, 2006: 28). Sirgûnbûn ruhê zivistanê ye û bêcîh û bêwarbûn e (42).

Said (2006: 15-16) ne tenê rewşenbîrekî bû ku derbarê sirgûniyê de hin tişt dînîsandin wî bixwe jî sirgûniyê tecrûbe kiribû. Ji ber vê jî ew psîkojîya sirgûnbûnînê baş dizanibû. Sirgûnî li gor wî di navberê de maye; hem aîdî her derê ye hem jî aîdî ne tu derê ye. Wekî ku Safran (1991) jî diyar dike ku penaber dê tu

carî ji aliyê civaka xwedîmal ve neyên qebûlkirin û ev rewş ew ê bibe sedem ku kesên sîrgûn bibin biyanî û melankoli û xemgînî ji bibe parçeyeke derûniyeta wan (Sazzad, 2017: 1). Di nav vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku wekî ku Mishra (2007) ji dibêje hemû civakên diasporîk xemgîn in lê xemgîniya wan ji hev cuda ne lewra wan barê sîrgûniyê girtine ser milê xwe. Em van xalênu ku heya niha hatin behskirin bi hêsanî di berhemên Husêن de dibînîn. Ji ber ku melankolî û biyanîbûn parçeyên cihana wî ya edebî ne.

Ji ber ku sîrgûnî ji hemû nas û dostênu xwe û nasname û dîroka xwe tê veqetandin sîrgûn serpêhatiyeke travmatîk e (D'addario, 2007: 8). Sîrgûnî ji erdnigariya xwe hatiye veqitandin lê ew ê nikaribe bibe parçeyeke cîvaka nû ji (Said, 2006: 36). Ev yekan ji bo edebiyata Husêن ji derbasdar e. Parîsa ku bajarê evîn û romantîzmê e ye ji bo hemû karakterên wî warê tenhayî, biyanîbûn û melankoliyê ye. Bo nimûne di Evdo û Çend Bêhnikên Şadiyê de Evdo Kurdekî Helepçeyî ji qetlîamê xilas bûye û Bijişkên Sînor Nasnakin wî dîbin Parîsê. Lî li vir tu carî nikare xwe aîdî Parîsê bibîne her dem di hismendiya wî de vegera welat heye. Parîs her çend bajarê xewnan be ji, ji bo Evdoyê Helepçeyî bajarê tenhayî ye. Wî tenhayiyê li xwe mahr kiriye (Husêن, 2013: 14). Disa di Nameyek Ji Bavê Min Re de vegêr her dem di navberê de maye. Li hêlekê şowba koronayê li hêlekî ji tevliheviya rojhilata navîn heye. Lewra dibêje “Ji ber çikin baranê çû ber mezrîbe” pir li min tê (Husêن, 2021: 90). Rojênu koronayê ne û ew 42 sal in li Parîsê dijî, ew der êdî bûye welatê wî yê duyemîn lê dîsa ji ji xaka xwe dûr e û ev dûrbûn wî diêşîne (9). Fransa ji welatê wî pêşketîtir e lewra ev welat ji bo wî dil û can be ji ne ya wî ye, ew bê welat e (115)

Di Amîdabadê de ji dîsa em rastî rewşa melankolîk û biyanîbûnê tê. Li Ewropayê jiyan ji bo penaberên wekî wan ne baş bû (Yekdeş, 2015-2016). Hevalê wî Seydo destê xwe xistibû ber makineyê, destê wî jê bûbû û makîne destê jêkirî daqûrtandibû nav xwe. Dema ku ew û Seydo li istgehê hev dibînin ji bêr êş û azarênu wan kişandine hev du hembêz dikin. Ew û hevalê wî Seydo xwe bera binê erdê metroye didin. Dema dikevin binê erdê başoke û eylo li ezmanekî şîn baskê xwe li hev dixin (Husêن, 2015: 41). Li Parîsê dema dengê hevalekî xwe ji welat dibîhîze her dem kêfxweş dibe. Seydo hevalê wî ye û bi zimanê dayika wî diaxive. Her çend li vî bajarî bi milyonan însan bijîn ji ew di nav tenhayiyek de ye. Ew her dem siwarê mîhina êşê⁶, biyaniyek bi tena serê xwe ye. Dema ku ew berê xwe dabû Parîsê di wê baweriyê de bû ku keçen porzer ji bo lawikên wekî wan porreş dîn û har dibûn, ew ê bûbûna xwedî mersedesên sor lê rastî yekcar cuda bû (36-37). Ev bajar cihê tenhayiyê ye li vir mirov nikare behsa kul û kederên xwe ji kesekî re bike (89).

Di Evdo û Çend Bêhnikên Şadiyê de êşa penaberiyê careke din derdikeve pêşberî me. Vegêr dibêje dema kurd li Ewropayê dîbin penaber kesekî guh nade wan. Penaberiya wan were qebûlkirin ji frensî weke kuçikan li wan dinhêrin. Ne

⁶ Ev çîrok di heman demê de di Siwarênu Êşê de ji heye. Siwarênu Êşê yekem pirtûka Husên e. Ev berhem li ser bergê wê wekî “novel” hatiye pînasekirin. Lî hin besen vê pirtûkê di Amîdabadê wekî çîrok cihigrin.

wekî kûçikêن xwe jî wekî kûçikêن efrîqî, Rohjilata navîn û hemû welatên bêxwedî (Husêن, 2013: 35). Evdo piştî vegera Îthakayê dema ku berê xwe dide meyxaneyê, hevalêن xwe yên frensî dibîne û dibêje ev frensî bê bext in gelek tiştan bi dû mirovan dikin. Ev jiyana xwe wekî çemekî dibîne jiyana wî li Kurdistanê dest pê kiribû û li taxên Parisê dimire (108)

Parîs bi rastî jî ji bo penaberan bajarê tenhayî û biyanîbûnê ye. Ev bajar bi penaberên xwe navdar e û di heman demê de cihekî wişa ye ku mirov di nav tenêtiyekê de bi awayekî biyanî dimirin (Said, 2006: 31). Em van bi awayekî aşkera di Parîsabadê de dibînin. Di Parîsabadê de veger dema ku nûçeya mirina bavê xwe dibihîze ev yek tesîreke mezin li ser wî dike. Jixwe li vê Parîsa xopan bi tenê bû û difikirî ku li vê derê ew ê di nav tenêtiyê de biçilmise (Husêن, 2010: 17). Dema li Parisê dijî her dem welat di bîra wî de ye. Li vî bajarî her tiş Amûdê tîna bîra wî heya dema ku lehmecûnan dixwe jî lingên wî li axa Amûdê dikevin (21). Parîs bajarekî xweşik û cihê kêtî û şahîyê ye lê ji bo kesên wekî wî ev der cihê biyanîbûn û melankoliye ye (31). Parisî û frensî di hişmendiya wî de ne kesên baş in. Parisî xwînsar û frensî xweperest in. Pascal her çend mirovek baş be jî dixwaze henekê xwe bi penaberên wekî wî bike ji ber vê lîstikek tîne serê wî. Ji ber vê jî ew dibêje ku tu kes nikare vî dewarî biguherîne (72).

Husêن di Barê Şevê de aliyêneyîn yên Parîsê bi awayekî aşkera radixe ber çavan (Çiftçi, 2022; Yeşilmen, 2014: 65-90). Wekî ku Khayati jî diyar dike (2008: 83-85) koçberî tiştekî zehmet e û kurdên dîasporayê jî gelek caran van zehmetiyan dîkişînîn. Tirsa derbaskirina sînor û polîsan, kuştin, qeçaxçıyan, qezayêن keştiyan kampên penaberan û pêvajoya penaberiyê hişmendiya wan ava dike. Di dawiyê de ew ê bigihijin Ewropayê lê ev nayê wateya xelasbûna êş û azarêñ koçberan ku em van rasterast di Barê Şevê de dibînîn. Di vê romanê de çar karakterên sereke, ji çar parçeyen welat hene. Ew rojekê amedekariya xwe dikin da ku biçin bihuşa ser dînyayê ye anku Ewropayê. Sîno kurê Mele Gundiro ye ku ew mirovek sextekar bû. Li Amedê her tiş xerab e. Mirov mecbûr dimînin ku dev ji gundêñ xwe berdin û Mele Gundiro jî berê xwe dide Amedê li vir dest bi çêkirina nivişt û berbêjnkan dike. Sîno mirovekî jêhatî bû, fransızî hîn dibe û ji bo ku ji hemû tiştên xerab yên vî bajarî xîlas bibe berê xwe dide Ewropayê (Husêن, 2012). Ji bo Sîno Tirkîyê cihê xirecîrê ye û ji bo paşerojeke baş divê Sîno biçûya Ewropayê (22). Li gor Dara gelek xortêñ navçeyê berê xwe didan Ewropayê. Piştî çend salan dewlemend dibûn li otomobîlekî siwar dibûn, vedigeriyan gund û sînga xwe wekî elokan dinepixandin (26). Dara jî ji bo hinek jîyan pars bike berê xwe da Ewropayê (38). Şêrko xortekî ji Mahabadê ye wî tu tiştek ji jiyana xwe ya Kurdistanê û Îranê fêm nekiribû, wekî gelek xortan dixwest ku li Ewropayê bigihîjî jiyaneke bextewar (39). Li gor baweriya Şêrko heger ji destê wanbihata tu kesek jî li rojhilata navîn nedima, dê hemûyan jî berê xwe bidaya Ewropayê (42). Ristemê Zalê Rojavayî ne qehremanê Şehnameyê bû beravajî vê ew li ser xaka xwe bûbû penaber û mecbur mabû ku berê xwe bidana Ewropayê (51). Çûyina Ewropayê ji bo her çar karakteran wekî reya felatê bû lê di heman demê de destpêka êşen nû bû jî. Lewra tiştên ku ew li hêviyê bûn û rastî ew ê li hev nehatana.

Dema ku her çar karakter digel êş û azarêن xwe digihîjin Parîsê ji bo wan jiyanekê nû dest pê naked. Ew tenê penaberêن ji rêzê ne û ne di xema tu kesî de ne. Wekî Eliassi (2012: 100) jî diyar dike penaber di rabêja netew dewletan de yên din in. Her çend ew rojekî bibin hemwelatî jî ew ê tu carî nikaribin bibin wekî hemwelatiyênen resen ên van dewletan. Ev yek bi taybetî ji bo Fransayê jî derbasdar bû. Gelek kurdêن koçber piştî gelek êş û azaran dema ku digihijin Fransayê rastî zehmetiyênen nû têن. Carinan jî ji hêla polîsên frensî ve dihatin tacizkirin (Khayati, 2008: 149). Em ê van tiştan di Barê Şevê de jî bibînin. Her çend, her çar karakterên sereke piştî gelek zehmetiyân xwe bigihînîn Parîsê jî girtina mafê penaberiyê dê ji bo wan bibe işkence. Ev bajarê ku ji bo gelek kesan bajarê xewn û xeyalan bû dê ji bo wan bibûya goristanek. Ew ê her dem mecbûr bimînin ku ji ber polîsên frensî birevin.

Her çar karakter jî serî li penaberiyê didin û li benda roja pesendkirina kaxêzên xwe dissekinin. Bi vî awayî sê sal derbas dibin lê Ristemê Zal nikare kaxiza penaberiyê bi dest bixe. Rojek dibihîse ku heger birîndar bibe ew ê zûtir kaxiza penaberiyê bi dest bixe ji ber vê jî xwe diavêje bin erebeyeke lê nafilete û dimire (Husêن, 2012: 79). Şerko jî nikare mafê penaberiyê bistîne ji ber vê jî hikûmeta frensî jê daxwaz dike ku welat biterikîne lê vegej ji bo wî tê wateya mirin an zîndanê. Ew dixwaze bibe wekî kûçika xanima frensî ku her roj didit. Ew li kêleka Çemê Seinê rûniştiye û difikire. “Ew ji bo vê xewnê, bajar û malbata xwe bi sedên qonaxan li dû xwe hiştibûn û wê şeve, li kêleka çemê Seinê bibû wek parsekekî nizanibû ci xweli li serê xwe bikira lê ne poşman bû. Ew ji sêdar û hemû şewatên Kurdistanê dûr ketibû û wî ji can û dil dixwast bibûya weke segê wê rojê, ew çarnigê bê serêş û bê qirktalî.” (87). Ew bi van bîr û baweriyan li kêleka çemê ji serma diqûlife û dimire. Darayê başûrî jî di heman rewşê de ye. Lê ligel wî em rastî penaberekî din têن ku dara evîndarê wê bûbû. Zîbaya ku efrîqî bû li kolanên Parîsê laşe xwe difiroşe lê dema ku vedigere welat porê xwe digre, Qûranê dixwîne û rojî digre. Ew jî wekî Dara bê cih û bê war e. Ji Dara ducanî bû. Dema zarokê wan çêbibe dê navê wî bibe Hîwa. Daxwaza Dara ya penaberiyê tê redkirin û ji ber vê derûniyeta wî xirap dibe û xwe bi dar ve dike (95-114). Di nav her çar karakteran de tenê Sîno dikare mafê penaberiyê bistîne ji ber ku ew jî wekî bavê xwe mirovekî sextekar bû, xwe wekî êzdiyekî pêşkêş kiribû û bi vî awayî mafê penaberiyê stendibû (120).

Husêن bi vî awayî rewşa penaberan nîşan dide. Li gor wî penaberî bênasnametî, bêcîh û bêwarbûn e. Wekî ku di şexsê her çar karakteran jî nîşan dide ku ew dikaribûn vegejiana welatê xwe lê di berdila vegejê de wan kûçiktiyê hilbijart. Bi taybetî jî di çîroka Şerko de em vê rabejê dibinin. Lewra ew qîma xwe bi jiyana segan li Fransayê dianî lê ne bi ya mirovên rojilata navîn. Ew dikaribû welatek azad daxwaz bikirana lê berdila wî de ew dixwast bibûna kûçikê ew jina frensî (88). Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku Husêن rexneyên tûj bi taybetî li penaberan lê bi giştî li civaka xwe jî dike ku ev yek gelek caran di rabêja diasporayê de tê dîtin. Bo nimûne (2009: 26) Said her çend wek nûnerê doza filistîniyan bihata

dîtin jî di heman demê de rexneyên tuj li hember civaka xwe jî dikir. Li gor wî sedema pêşvemeçûna demokrasiyê di nava civakên rojhilata navîn de ne tenê bi emperyalîzm, despotîzm û rejîmên dejenere re eleqedar bû. Di heman demê de civak û rewşebîrên rojhilata navîn jî ji hişmendiya demokrasî, azadî û mafêñ mirovan bê par in. Ji ber vê jî divê rewşenbir her dem li ser rewşa civaka xwe bifikirin û xwe rexne bikin ku ev yek ji bo pêşvebirina civakê xaleke sereke bû. Bi heman awayî li gor Eliassi (2012: 130-131) jî hişmendiya dîasporayê di heman demê de bîr baweriya netewperweriyê di nav xwe de dihewîne. Ji ber ku penaber tam nikaribin bibin aîdî welatê ku koçî wir kirine û bêhtir berê wan li welatê wan e. Lewra êş û azarênu ku kurdan li welat kişandine jî her dem hişmendiya wan ava dike.

Di nav vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku li gor Husêñ hişmendiya netewperwerî di nav penaberan de kêm bû û berdila jixwe re welatek ava bikin jiyanek biçük tercîh dikirin ku ew yek taybetmendiya nivîskarêñ dîasporîk e. Bo nimûne li gor Said sirgûnbûn her çend xwedî gelek aliyêñ neyînî be jî çalakiyeke rewşenbirî ye. Lewra sirgûnbûn di heman demê de rê dide sirgûnî ku cihana ew tê de dijî bi çavekî dine bibîne û binirxîne (Sazzad, 2017: 18-19). Sirgûnî hewl didin ji xwe re cîhanek alternatif ava bikin bi gotineke din hewl didin welatê xwe yê resen restorîze bikin. Ji ber vê yekê ye ku dîaspora di heman demê de maka netewperweriyê ye jî. Sirgûn û netewperwerî du têgehêñ ku bi hev du re peywendîdar in. Lewra netewperwerî ew tişte ku aîdî zimanek çandek û erdnigariyeke. Sirgûn ji van tiştan bê par maye lê hewl dide ku van tiştan carek din bi dest bixe. Lewra netewperwerî xelasbûna ji biyanîbûnê jixwe re dike mijar û divê ji bo ku dawî li biyanîbûne were divê sirgûnî vegere welatê xwe. Ji bo vê yekê jî azadkirina welat elzem e (Said, 2006: 31-32). Sirgûnbûn di heman demê de çalakiyek daxwaza azadiyê ye (Sazzad, 2017: 25). Dema ku welatê wan azad bibe dê sirgûnî bikaribin vegeerin welatê xwe. Ji ber vê yekê ye ku vegera welat ji bo civakên diasporîk xaleke sereke ye. Kesêñ ku ji xaka xwe bi darê zorê hatine derxistin divê rojek vegeerin welatê xwe, li ser xaka bav û kalan ku em vê yekê di berhemên Husêñ de aşkera dibînin.

Wuslat: Veger, Astengî

Li gor Brah (2005: 188) di hişmediya civakên dîasporîk de welat cihekî mîstîk e, ew cihekî wisa ye ku vegera wî jî ne mimkin e. Welat hem biranînê neyînî hem jî erenî di nav xwe de dihewîne, cihê serpêhatiyêñ zindî ye. Helbet ji bo daxwaza vegera welat gelek sedemên cuda hene lê sedema sereke ew e ku penaber tu carî bi awayekî rast û dirûst nikarin adapteyî civaka xwedîmal bibin. Ew ê her dem mecbûr bimînin wekî kesekî biyanî û yên din bijîn. Lewra Eliassi (2012: 12) ji tecrubeyêñ xwe derdikeve rê û dibêje her çend li Swêdê bi awayekî kolektif û fermî nijadperestî tunebe jî ew bixwe jî rastî tevgerên nijadperestî hatiye û jê re hatiye gotin ku ev der ne welatî wî ye divê ji vir biçe. Ev nîşan dide ku mirov xwedî pasaporta Swêdê be jî dîsa dikare rastî tevgerên serdestiyê were anku bi awayekî nefermî be jî dikare biçük were dîtin (164). Swêd ji aliyê şert û mercen penaberan ve belkî jî welatê herî baş e lê li vî welatî jî îhtîmala ku mirov rastî nijadperestiyê

were heye. Penaber her dem di navberê de dimînin, ew dizanin ku cihekî wan ê mayînde tuneye (Chambers, 2005: 11). Ji ber van sedeman e ku penaber her çend xwedî şert û mercên baş bin jî her dem di hişmendiya wan de rojekê vegera welêt heye ku em van di berhemên Husêن de dibînin.

Bêrîkirina welat anku gîhîştina wuslatê xalên sereke ne di berhemên Husêن de. Bo nimûne di Parîsabadê de di her kîliyê de Amûdê tê bîra vegêr; dema ku nexweş e li mala xwe ya qatê heftan a di nav şînkahiyê de ye. Amûdê jî wekî Parîsê di nav şînkahiyê de ye, çemê wê wek berê diherike (Husêن, 2010: 79). Di hişmendiya wî de navê Kurdistanê li ser nexşeyan tuneye her çîqas welatekî xeyalî be jî mirov dîsa -dikare bi saetan li ser bipeyive. Rast e ku li vî welatî ji bilî çemê miçiqî û havînên pir germ tu tişt tuneye lê dîsa jî mirov dikare saetan pesnê wê bide û behsa gul û çîçekên wê bike (90). Welat ji bo wî di berdêla bavê wî de ye. Bavê wî û welat dabin yek û her kîliya ku bavê wî tê bîra wî xwe di nav ewlehiyê de hîs dike (80). Ew piştî 25 salan vedigere welatê xwe, çavê wî li bavê wî digere xwişkê wî xwe diavêjên hêmbêza wî û bixêrhatina wî dîkin (93). Dema ku dikeve nav xwişkên birayê xwe ji bextewariyê kelogirî dibe. Lî êdî ew mirovekî biyanî ye ew êdî ne ew xortê ku 25 sal bere ji vî welatî koç kirî ye (95) Vegêr bi dilekî xemgîn berê xwe dide gorê da ku bavê xwe yê mirî bibîne û di rê de rastî navê bapîrê xwe dibe. Dixwaze biqîre lê deng jî gewriya wî dernakeve. Ji ber ku dema ew mir ew ne li ber serê wî bû û lêborînê ji bavê xwe dixwaze (96-97).

Di Amîdabadê jî em heman tiştî dibinin. Erê li welat şer û pevcûn hebû lê ew ê rojekî vegeriya welatê xwe. Ew li Parîsê di odayeke pîsîk de bi karekî biçûk debara xwe dike. Bi şev kar dike bi roj radikeve, ji civakê îzole bûye. Her çend li kîleka Çemê Seinê bijî jî di hişmendiya wî de her dem Çemê Amîdabadê heye. Her çend ew çem li gor Seinê wekî çîravek bû lê li ber dile wî şîrîn bû. Ew di wê baweriyê de ye ku rojekî ava vê çemê dê ber bi bihûste ve biherike (Husêن, 2015: 32-34). Her dem di hişmendiya wî de cihekî gîring digire. Lewra di destpêka çîroka Siwarêن Eşê di vegêr wiha dibêje: “Wek ku di destpêkê de em dilê taya çûyînê bûn, anîha jî em gîrtiyê nexweşîya vegevê ne. Di şev û rojîn welatên derbideriyê de, xewna vegera li ser warê kal û bavan, me digire û bernade. Ew xwe berdide canê me, geh biryara vegevê xweş û hêsan dike, geh wê dike astengeke bêpayan zehmet û xewneke tije kâbus.” (51).

Dema ku ew êdî nikare xwe li ber wan hestan bigre dest bi karûbarêñ vegevê dike. Ew ê vegeerin malê anku Amîdabadê. Lî herî zêde Seydo kîf dike lewra wan Parîsê ji parisîyan dihişt û pişta xwe didan êşen sirgûniyê, ew ê li trêna xwe siwar bibûna û berê xwe bidana Amîdabadê. Lî ew ê nikaribe vegere lewra li ïstgehê ew ê riya xwe wenda bike; trêna ku dê wî bibe Amîdabadê ji zû ve çûye û ew li paş maye. Di hişê wî de bavê wî heye. Bavê wî bi riha xwe ya spî li ïstgehê bi çavên şîlmaskî li benda wî ye lê ew vê carê jî nikare biçe. Her dem dixwaze biçe Amîdabadê lê ew ê nikaribe biçe. Rojekê ji rojan ew ê jî li trenê siwar bibe û biçe, lê îroj ne ew roj e (51-60). Em daxwaza vegera welat di Nameyek Ji Bavê Min Re de jî dibinin. Bavê wî her dem li hêviya wî dimîne (Husêن, 2021: 51). Dawiya dawî vegêr

dîsa berê xwe dide welatê xwe yê resen anku axa bav û kalan Amûdê, ber gora malbatê û ber serê bavê xwe (116).

Hefteyek Dirêj Li Amedê li gor Fawaz hem romana Amedê hem jî ya Amûdê ye. Karakterê sereke Ferzende 50 salî ye û berê xwe dide Amedê û bi tenê 5 salan ji Odesîüs mezintir e. (Husên, 2015: 15). Berê Ferzende li Amûdê ye, ew dixwaze xwe bigihijîne Amûdê û ji dûr ve jî be warê xwe yê kevnare bibîne (18). Ferzende li otobosa ku diçe Amûdê siwar dibe û xwe wekî Odîsîüsê ku dabû riya Îthakayê dibine, lê otobes berê xwe diguherîne û diçe bakur (158). Odesîüs qehremanê destanê Odesia bû ku wî jî wekî Ferzende dixwast vegere welatê xwe, lê di rê de rastî gelek astengiyan hatibû. Em ê çroka Odesîüs di Evdo û Çend Bêhnikêن Şadiyê de bibînin ku Husên di vê romanê de di navbera Evdo û Odesîüs de analojiyek ava kiriye. Evdo Odesîüs bi xwe ye wî jî wekî wî berê xwe daye grava Îthakayê lê Odesîüs di dawiyê de gihiştibû girava xwe anku welatê xwe lê Evdo dê nikare bigihêje Halepçeyê (Husên, 2013: 20). Evdo berî ku bigihije Îthakayê dile wî mîna teyrê hûr, şahbaz, eylo, qertel û xelekan li dora xwe çêdiye (86). Evdo di rê de rastî bilêtfiroşekî tê, ew hewl dide ku wî bi pereyek erzan bişîne Îtalyayê lê Evdo dibêje heger ew tevahiya Îtalyayê jî bide wî ew ê dîsa bere xwe bide Îthakayê. Gelek kes dixwazin wî jî rîya wî vegeŕinîn lewra Îthakaya anîha ne wekî ya serdema Odesîüs e bi kérî pişkûlekî jî nayê. Lê dîsa jî jî rîya xwe venagere (88). Evdo dema ku digihije Îthakayê tenhayîya xwe ya Parîsê ji bîr dike mîna ku ew gihiştiye welatê xwe (99). Li Îthakayê her dem welatê wî anku Helepçe tê bîra wî. Dibêje heger xaza xerdelê nebûya ew ê li ba Nazenînê bûna li ser çoka wê bi şew li çiyayên Kurdîstanê binhîrta. Ev bextewariya herî mezin bû ji bo wî (103). Ew dibêje ez ê li ser grava Îthakayê ji Pênelope û Têlêmakos re behsa Odesîüsên demên nû bikim (25). Di encamê de Evdo wekî Odesîüs gihaşt girava Îthakayê lê ew nikare bigihêje Îthakaya xwe ya rasteqîn anku Helepçeyê.

Encam

Vê xebatê dil kir ku ka gelo çawa fîraq û wuslat di berhemên Fawaz Husên de reng vedaye. Di encamê de hate dîtin ku di hemû berhemên wî de fîraq anku sîrgûn û wuslat anku veger mijarên sereke ne. Di berhemên wî de îmajeke neyînî ya welat heye. Lewra li welat kuştin, talan, komkujjî, zindan û rejîmê totaliter hene. Ji ber vê jî her çend Amûdê warê wî yê zarokatiyê be jî, cihê êş û azaran e jî. Li welat du qehremanê wî yê zarokatiyê hene. Yek ji wan Mele Ehmedê Herbî bû ku wî ziman û çanda kurdî temsîl dikir yê din jî Ferecê Şêxê Koro bû ku wî jî desthilatdariyê û sînorên ku desthilatdar danîbûn qebûl nedikirin. Welat her çend cihê bîranîn wî yê zarokatiyê be jî ew li vir jî sîrgûneke naxweyî ye. Rewşa welat dîbe sedem ku karakterên wî dev ji welatê xwe berdin û berê xwe bidin koçberiyê. Çûyîn her çend wekî rîya felatê were dîtin jî koçberî bi xwe tiştek seyr e. Parîsa ku bajarê evîn û romantîzmê bû ji bo hemû karakterên wî cihê melankolî û biyanîbûn e. Ev der ji bo penaberan goristanek e. Kurd li vir nasnameya xwe û hebûna xwe wenda dikan. Lewra karakterên wî nikarin adapteyî vî bajarî bibin û her dem di

navberê de ne. Ew beriya welatê xwe dikin û bi wê hêviyê dijîn ku rojekê vegerin welatê xwe ew anku li hêviya gîhîştina wuslatê ne.

Çavkanî

- Abdulla, N. (2009). İmparatorluk Sınır ve Aşiret, Kurdistan ve 1843-1932 Türk-Fars Sınır Çatışması. (M. Aslan, Wer.) İstanbul: Avesta.
- Brah, A. (2005). Cartographies of Diaspora: Contesting Identities. London and New York: Routledge.
- Bruinessen, M. V. (1998). 'Shifting National and Ethnic Identities: The Kurds in Turkey and the European Diaspora'. *Journal of Muslim Minority Affairs*, 18(1), 39-52.
- Chambers, I. (2005). Göç, Kültür, Kimlik. (İ. Türkmen, & M. Beşikçi, Wer.) İstanbul: Ayrıntı.
- Çiftçi, M. (2022). Penaberî di Lehengşazîya Romana Barê Şevê ya Fawaz Husêن da li Gorî Rêbaza Realîzma Efsûnî. *Nûbihar Akademî*, 5(17), 55-69. doi:DOI: 10.55253/2022.
- D'addario, C. (2007). Exile and Journey in Seventeenth-Century Literature. Cambridge: Cambridge University Press.
- Eagleton, T., Jameson, F., & Said, E. W. (1993). Milliyetçilik, Sömürgecilik ve Yazın. (Ş. Kaya, Wer.) İstanbul: Kabalci.
- Edwards, B. H. (2003). The Practice of Diaspora, Literature, Translation, And The Rise of Black Internationalism. Cambridge, Massachusetts and London: Harvard University Press.
- Eliassi, B. (2012). Ülkemde Bir Yabancı İşveç'teki Kürt Gençlerinin Aidiyet Politikaları. (H. İlhan, Wer.) İstanbul: Avesta.
- Hamelink, W., & Barış, H. (2014). Dengbêjs on borderlands: Borders and the state as seen through the eyes of Kurdish singer-poets. *Kurdish Studies*, 2(1), 34-60. file:///C:/Users/mehmet/Downloads/Hamelink.Baris_Dengbejs on borderlands.pdf
- Hoffman, A. G. (1991). Between Exile and Return; S. Y. Agnon and the Drama of Writing. New York: State University of New York Press.
- Husêن, F. (1994). Siwarêن Îşê. Li Derveyî Welat: Weşanên Welat.
- Husêن, F. (2010). Parîsabad. Stembol: Avesta.
- Husêن, F. (2012). Barê Şevê. Stembol: Avesta.
- Husêن, F. (2013). Evdo û Çend Bêhnikên Şadiyê. Stembol: Avesta.
- Husêن, F. (2014). Piçek jiyan Qetek Asîman. Stembol: Avesta.
- Husêن, F. (2015). Amîdapad. Stembol: Avesta.
- Husêن, F. (2015). Heftiyeke Dirêj Li Amedê. İstanbul: Avesta.
- Hûsêن, F. (2015). Qûma Mezopotamya. (F. Husêن, Wer.) İstanbul: Ayrıntı.
- Husêن, F. (2021). Nameyek Ji Bavê Min Re. İstanbul: Avesta.
- Karataş, A. (2019). Diyasporada Kurt Gençliğinin Gelişimi. Ankara: Töz.
- Khayati, K. (2008). From Victim Diaspora To Transborder Citizenship? Diaspora formation and transnational relations among Kurds in France and Sweden. Linköping University: Linköping.

- Kılıç, D. (2009). Bahman Ghobadi'nin Filmlerinde Kurt Kimliği ve Kültürüün Temsili. M. Arslan Di nav, Kurt Sineması; Yurtsuzluk Ölüm ve Sınır (s. 137-174). İstanbul: Agora Kitaplığı.
- Mishra, V. (2007). The Literature of the Indian Diaspora Theorizing the Diasporic Imaginary. London and New York: Routledge.
- Palo, M. E. (2022), Cîvîna Nemiran Mela Ehmedê Palo, Amd. Yıldırımçakar M. , Rêzan P. , Başçı, V., Aykaç Y, İstanbul: Nûbihar
- Parıltı, A., & Galip, Ö. (2010). Kurt Romanı Okuma Kılavuzu. (M. Tanaydîn, Amd.) İstanbul: Sel.
- Safran, W. (1991). "Diaspora in modern societies: myths of homeland and return",, Diaspora, 1(1), 83-99.
- Said, E. (2006). Kış Ruhu. (T. Birkan, Wer.) İstanbul: Metis.
- Said, E. (2009). Kültür ve Direniş David Barsamian'la Konuşmalar. (O. Akınay, Wer.) İstanbul: Agora Kitaplığı.
- Said, E. W. (2004). Relections on Exile and Other Essays. Cambridge, Massachusetts: Harvard University Press.
- Said, E. W. (2014). Yersiz Yurtsuz. (A. Üçer, Wer.) İstanbul: Metis.
- Said, E. W. (2016). Kültür ve Emperyalizm. (N. Alpay, Wer.) İstanbul: Hill.
- Sapiro, G. (2019). Edebiyat Sosyolojisi. (E. C. Gürcan, Wer.) Ankara: Doğu Batı.
- Sazzad, R. (2017). Edward Said' Concept of Exile Identity and Cultural Migration in The Middle East. London û New York: I.B. Tauris.
- Sheffer, G. (2003). Diaspora Politics at Home Abroad. New York: Cambridge University Press.
- Tejel, J. (2009). Syria's Kurds History, Politics and Society. (E. Welle, & J. Welle, Wer.) New York: Routledge.
- Volkova, B. (2021). Forms of Exile in Jewish Literature and Thought Twentieth-Century Central Europe and Migration to America. Boston: Academic Studies Press.
- Wahlbeck, Ö. (2002). The concept of diaspora as an analytical tool in the study of refugee communities. Journal of Ethnic and Migration Studies, 28(2), 221-238. doi:<https://doi.org/10.1080/13691830220124305>
- Wahlbeck, Ö. R. (2019). The Future of the Kurdish Diaspora. Di nav M. M. Gunter, Routledge (s. 413-424). London: Taylor & Francis Group. doi:<https://doi.org/10.4324/9781315627427>
- Yekdeş, Ö. F. (2015-2016). Sirgûnek Di Nav(ber)a Rabirdû û Niha De. Wêje û Rexne, 183-201.
- Yeşilmen, D. (2014). Temaya Sirgûnê Di Çar Romanên Kurdî (Kurmancî) De. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi.

**Evîn û Leheng: Wuslet û Firaqa Lehengî di Şahnameyên
Kurdî de**

Shahab Valî¹

**Aşk ve Kahraman: Kürtçe Şahnamelerde Kahramanın Vuslat ve
Ayrılığı**

Öz

İnsanı duyguların en önemlilerinden biri kuşkusuz “aşk” ve “âşik olma” duygusudur. Aynı zamanda aşk duygusu iki önemli kavram vasıtasyyla anlam bulur: Vuslat ve Firak. Âşik olan kimse, âşik olduğu andan itibaren, tüm varlığıyla tek bir amaca odaklıdır: sevdigiine kavuşmak ve ondan ayrı kalılmamak. Dünya edebiyat tarihinin önemli bir bölümü ünlü âşik-müşüklerin bu iki kavram (vuslat-firâk) üzerine verdikleri emek ve yaşıdıkları maceralar üzerine kurulmuştur ve aşk maceraları farklı edebi türlerin önemli bir konusu olmuştur. Aşk kavramı Kürt edebiyatının da önemli temalarından birisidir ve çok eski bir geçmişe sahiptir. Aşkin farklı boyutları (kutsal/kutsal olmayan) detaylı bir şekilde söz konusu edebiyatta işlenmiştir. Kürt edebiyatında aşk ve âşik olma hikâyelerinin işlendiği edebi eserlerden biri de Kürt Şahnameleri'dir. Kahramanlık destanı olarak değerlendirilen bu eserlerde aşk, birçok maceranın ana teması olmuştur. Bu makalenin amacı Kürt Şahnameleri'nde geçen bazı aşk hikâyelerini inceleyip, Kürt mitolojik/destanı kahraman figürünün “vuslat” ve “firâk” kavramları karşısındaki tutum ve davranışlarını irdelemektir.

Anahtar Kelimeler: Aşk, Vuslat, Firak, Kahraman, Kürt Şahnameleri.

**Love and Hero: Conjunction and Separation of The Hero in Kurdish
Shahnamehs**

Abstract

One of the most important human emotions is undoubtedly the feeling of “love” and “falling in love”. At the same time, the feeling of love finds meaning through two important concepts: Reunion and separation. From the moment of “falling in love”, the person in love (lover) focuses on a

¹ Dr. Öğr. Üyesi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, vali.shahab@gmail.com, ORCID: [0000-0003-0580-1598](https://orcid.org/0000-0003-0580-1598).

Makale Gönderilme Tarihi: 06.06.2024, Kabul Tarihi: 26.08.2024

single goal with all his/her being: to meet his/her beloved and not to be separated from her/him. A significant part of the history of World literature is based on the efforts and adventures of famous lovers and on these two concepts (Reunion-separation) and love adventures have been the subjects of different literary genres. The Concept of love is one of the most important themes in Kurdish literature too and has a long history in this literature. One of the literature genres in Kurdish literature that deals with love and love stories is the Kurdish Shahnamah. In these Works, which are considered as heroic epics, love has been the main subject of many adventures. The aim of this article is to examine some of the love stories in the Kurdish Shahnamahs and to examine the attitudes and behaviours of the Kurdish mythological/epic hero figure towards the concepts of “conjunction” and “separation”.

Keywords: Love, Conjunction, Separation, Hero, Kurdish Shahnames.

Kurte

Bêşik yek ji hestên însanî yên herî girîng hesta “hezkirin” û “evîndarbûn”ê ye. Ev hesta evînê bi du têgehêن bingehîn watedar dibe: Wuslet û firaq. Kesê evîndar dema ku evîndar dibe, bi hemî hebûna xwe li ser armancekê radiweste: gehîstina maşûqa/ê xwe û dûrnemayîna ji wê/wî. Dikare bê gotin ku beşike girîng a tarîxa edebiyata cîhanê li ser têkoşîn û serpêhatiyê aşiq-maşûqên navdar, li ser van her du têgehan (wuslet û firaq) ava bûye û serpêhatiyên evînê bûne mijara cureyên edebî yên cuda. Têgeha evînê, yek ji mijarêن bingehîn ên edebiyata kurdî ye jî û di vê edebiyatê de xwedî tarîxeke pir kevn e. Di edebiyata navborî de pîvanêن cuda yên evînê (pîroz/nepîroz) bi berfirehî têne behskirin. Di edebiyata kurdî de yek ji berhemêن edebî yên ku riwayetên evîn û evîndariyê lê hatine vegotin, Şâhnameyên Kurdî ne. Di van berheman de evîn wekî mijareke sereke ya gelek serpêhatiyan hatiye bikaranîn ku wekî destanê lehengiyê tên qebûlkirin. Armanca vê gotarê nîşandan, analîz û nirxandina helwest û reftarên lehengê mîtolojîk/destanî yên kurdî ye li hemberî têgehêن “wuslet” û “firaq”ê.

Peyvîn Sereke: Evîn, Wuslet, Firaq, Leheng, Şâhnameyên Kurdî.

Extended Abstract

The feeling of “love” is one of the most important and fundamental human emotions and “man” is accepted as a being in need of loveing and being loved. This feeling manifests itself in different forms: Love for a sacred Being (God/Creator-mystical/sacred love) or love for another human being. It must be said that the second type of love can also reach a sacred dimension/positoin according to its depth-reality. These two forms of love have been one of the main themes of poets/writers throughout the history of World literature. In other words, “love”, as a theme, has always been one of the most important sources of inspiration for poets/writers in different literary genres, and although the concept of “love” has undergone a change in meaning in the modern period, it has maintained this central position until today. The depth, reality and sacredness of emotion of love in question is manifested through two concepts:

“separation” and “desire for reunion”. It can be said, the adventure of love consists of a series of stages: 1) meet/recognising the beloved (which can be direct seeing, or indirectly, such as seeing in a dream, hearing her/his qualities etc.) 2) falling in love 3) separation and 4) reunion. In “love stories”, the meaning of the deep feeling of two lovers for each other, the degree of reality and sometimes the sanctification of love between them are described through the concepts of “separation” and desire for “reunion”. The more painful, unbearable, longer the separation and the more passionate the desire for reunion, the more the depth of love is revealed. In Kurdish literature, too, love, in its various forms, is an important and fundamental theme and one of the sources of inspiration for this literature. This theme has been treated in detail by poets/writers in different genres of Kurdish literature. One of the most important of these genres is the Kurdish Shahnamahs. The main subject of Kurdish Shahnamahs, as a section of epic literature, which has a very long history in Kurdish geography, includes the adventures of Kurdish mythological/epic heroes. The adventures of these heroes are based on two basic themes: war and love. The adventures of these heroes, who have an important, superhuman and sometimes sacred position in the collective memory of the society, are based on these two themes. At the same time, these two themes are related to two different dimensions of the mythological/epic hero’s character. In Kurdish Shahnamahs, the mythological/epic hero reveals the “heroic” dimension of his character the “war” (his social duty/life), which is directly related to the homeland to which he belongs, the existence or extinction of his nation and national interests, and becomes a “soldier”, superior to normal man, ready to sacrifice his life for his nation. However, the issue of “love” passes into the scope of “personal life” of the hero in question. Since national interests are no longer at stake in this matter, it reveals a different dimension of hero’s character. The main purpose of this article is to reveal and analyse the attitude of the hero figure in Kurdish Shahnamahs, one of the most important parts of Kurdish epic literature, towards “separation” and “desire for “reunion” during his love adventure.

Destpêk

Dikare bê gotin ku tarîxa edebiyata cîhanê tu carî ji têgeha evîn/eşq û serpêhatiyyen evînî bêpar nebûye. Herçend di serdemên cuda yên tarîxî de, li gorî şert û mercên dem û sîstema jiyana civakî bîrbirî, idrak û bikaranîna têgeha “evîn”ê xwedî hin ciyawaziyan be jî, şair/nivîskaran tu caran behsa evînê û râvekirina vê têgehê ji bîr nekiriye. Ev ciyawazî, ku encama şert û mercên taybet ên her serdemê ne, bi piranî dikarin di helwestên aşiq-maşûq, cewhera evînê (ilahî-dînyewî bûn), evîna li hemberî şexsekî/ê, an jî evîna ji bo însaniyet-welatî bêñ dîtin. Lê herçend têgeha “evîn”ê li gorî şert û mercên civakî yên taybet ên serdemâ xwe û di baweriya şexsî û cîhanbîniya şairêñ her serdemekê de bi rengekî cuda hatibe vegotin û beyankirin jî, herdem di berhemên edebî de hebûna xwe bi kûrahî nîşan daye.

Çibûn, xweza û pênameyev evînê jî hertim bûye yek ji wan mijaran ku ehlê zanistê hewl daye vê hesta taybet pêname û rave bikin. Li gorî Mewlana: “ji bo evînê pênameyek tunebû û tuneye û tenê evîn dikare evîn û evîndariyê rave bike” (Mewlana, 1389: 9). Di ramana Platon de jî heman wate tê dîtin: “Hîn jî kesê nekariye ji bo rûmeta evînê rêzeke hêja binivîsîne” (Platon, 2018: 11). Ji ber ku “evîn” wekî girêdanekê ye ku însanan bi Xwedê ve girê dide û wekî “hest” eke qedîm (li hemberî hadisê) tê qebûlkirin. Çawa ku Şemsê Tebrîzî dibêje: “Heq, Qedîm e. Ji Qedîmê, tiştek bi te ve girêdayî ye û ew, evîn e” (Şemsê Tebrîzî, 1369: 69). Lê dîsa jî dikare bê dîtin ku gelek pênameyêñ cuda li ser têgeha evînê hatine pêşkêşkirin. Evîn bi piranî wekî hezkirina kesê/kesa din a çawa ku ew hene, tê pênamekirin, (Stuhlmann, 1987: 307).

Li gorî Platon sedema hesta “evîndarî/aşiqbûn”a di navbera du kesan de, lihevhatina rûhî, hestî û adetî ya wan e (Platon, 2018: 103). Lê tê qebûlkirin ku evîn bi awayê ku em difikirin dest pê nake û naqede (Baldwin, 1985: 234). Evîn wekî tayê ye ku bêyî iradeya însanan tê û diçe û temenek jî ji bo vê nîne (Stendhal, 1891: 12).

Ji aliyê teorîk ve têgeha evînê bi du awayêñ cuda tê dabeşkirin: evîna mecazî; yanî evîn di navbera du kesayetînî dînyewî de, yanî di navbera aşiq û maşûq de û evîna ilahî an îrfanî; ku maşûq tenê Xweda ye û aşiq jî însan. Lê divê bê gotin ku li gorî hin nêrînan, evîna mecazî jî, eger rastîn û heqîqî be, dikare pîroz be û di encamê de bigehêje asta ilahî. Wekî Mewlana dibêje “evîn, çi dînyewî be çî ilahî, di di dawiyê de ber bi “Jor”ê ve rêberiya me dike” (Mewlana, 1389: 9).

Têgeha “evîn”ê di eslê xwe de, di diyalektîka du têgehêñ “wuslet” û “firaq”ê de watedar dibe. Wuslet bi wateya “gehiştina hezkiriyê xwe” û firaq bi wateya “dûrbûn û dûrmayîna ji hezkiriyê xwe”, temayêñ sereke ne di rîwayeta evînê de. Aşiq, ji dema aşiqbûne, ji bilî “wuslet”ê li tiştekî nafikire û di pêvajoya dûrbûn/dûrmayînê de, yanî di firaq û hîcranê de, hertim ji vê firaqê dişê û gazinan dike. Zîra wuslet, pileya herî dawî ya evînê û tekane arezû û xwesteka

aşiqan e. Hesteke bêîrade ye ku hin caran evqasbihêz e ku aqilê wî/wê pûç dike û dibe sedema mecnûnbûna aşiq. Zîra tekane armanceke wî/wê wuslet e, yanî pileya herî dawî ya evînê. Ji ber vê jî evîn wekî dînbûneke demkî ye ku tenê bi “wuslet” an jî bi rizgarkirina “nexweş/aşiq” jî bandorêne sebeba nexweşiyê, derman dibe. Lé ev nexweşî carinan dikare bibe kujer (Bierce, 1911: 202). Èşa firaqê û perîşanbûna aşiq, carinan bûye sedema nêrîn û şîroveyên pir tund li hemberî evîn û evîndariyê. Wekî mînak, li gorî Lewis evîn û evîndarî, di rastiyê de, bêparastinmayîn e û hezkirina ji her tiştî, bêguman dibe sebeba qelişîna dilî û bi îhtimaleke mezîn, şikestina dilî. Eger mirov bixwaze dilê xwe saxlem bîhêle, divê dilê xwe nede tu kesî, heta nede heywanekî jî. Yekane cih, li derveyî bîhuştê, dojeh e ku mirov dikare ji hemî xeter û perîşaniya evînê bi tevahî ewle be (Lewis, 1960 :138-139). Di hemî rîwayetên evîn û evîndariyê de, ji bo aşiq, firaq û dûrbûn/dûrmayîna ji maşûqê xwe, wekî dojehê hatiye teswîirkirin. Lé digel vê yekê jî evîn, wekî hesteke ku neceribandina wê jî dojeh be, tê ravekirin. Wekî Dostoyevskî dibêje: “Dojeh çî ye? êş û jana nikarîna evîndarbûnê ye (Dostoyevsky, 1967: 336). Ji ber vê jî divê mirov evîndar bibe, bê tirs û bê îtiyat, bêyî ku ji èşa ku dê ji firaqê bikêse, bitirse. Zîra îtiyat û baldarbûn di evînê de, belkî tiştê herî kujer e li hemberî bextewariya rastîn (Russell, 1948:185).

Digel ku di hemî rîwayetên evînî de armanca sereke (ji bo aşiq) wuslet e, lê dikare bê gotin ku rîwayeta evîn û evîndariyê, rîwayeta firaqê ye û di têgeha firaqê de “evîn” watedar dibe û evîndar sînorên xwe yên hebûnê derbas dike û kamil dibe. Çawa ku li gorî Şemsê Tebrîzî, firaq dibe sedema rabûna xavbûna aşiq (Şemsê Tebrîzî, 1369: 163).

Di rîwayetên evînî de tê dîtin ku herçiqas êş û derdê firaq, hîcran û dûrbûn/dûrmayîna ji maşûq kûrtir, bêtehemiltir û girantir be, evîna aşiq li hemberî maşûqa/ê xwe, meqbûltir xuya dike. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku pîvana dereceya heqîqîbûna evîn/hezkirinê, èşa firaq/hîcranê ye. Herçiqas firaq dirêjtir be, èşa aşiq zêdetir û kûrtir dibe û heqîqî/rastbûna evînê tê pejirandin. Bi gotineke din, ev têgeha “firaq” û tunebûna wusletê ye ku dibe sebeba pîrozbûna evînê. Yanî, di rîwayeta evîn û evîndariyê de, wusleta dînyewî wekî dawîya evînê tê qebûlkirin. Evîna îdeal, evîna bêdawî an jî cavîd û nemir, ew evîn e ku li vê dînyayê rê nade wusletê. Nemimkuniya wusletê, evînê digehîne pileyeke din. Ev pile, pileya pakbûna ji şehwetê ye ku wekî wateya rastîn a evînê jî tê pejirandin. Evîna ku digehije vê pileyê, wekî evîneke îlahî/pîroz û di felsefeya rojavayî de jî wekî evîna Platonîk tê nirxandin ku bi piranî xwedî encameke “trajîk” e.

Beşeke girîng a tarîxa edebiyata cîhanê, helbest an pexşan, qada rave û vebêja vê evîna pak û pîroz di nav aşiq û maşûqê de ye ku wekî nimûneyên îdeal ên evînê hatine qebûlkirin û nemir bûne. Eger rîwayetên evînî yên herî nasraw ên edebiyata cîhanê wekî Leyla û Mecnûn, Romeo û Juliet, Tristan û Isolde, Hamlet û Ophelia, Şîrîn û Ferhad, Aslı û Kerem, Mem û Zîn, Xec û Siyabend bêñ muqayesekirin, bi zelalî tê dîtin ku xala hevpar a ku bûye sebeba cavîdanî û nemirbûna navê aşiq û maşûq, derd û èşa firaqê, tunebûna wusletê û dawiyekê

trajîk e. Eger serpêhatiya evîndariyê wekî qonaxên hevdîtin (rasterast an nerasterast, wekî mînak di xewnê de dîtina maşûq û evîndarbûn an jî evîndarbûna bi bihîstina wesfên maşûqê), evîndarbûn, firaq û wusletê bêñ dabeşkirin, tê dîtin ku di mînakêñ jorî de qonaxa “wuslet”ê pêk naye. Bi gotineke din, îsbata heqîqbûna evîna aşiq/maşûq, cavîdanmayîna navê wan û pejîrandina serpêhatiya wan wekî nimûneyêñ evîna heqîqî, “firaq”ê ne û tunebûna “wuslet”ê ne.

Di edebiyata kurdî de jî evîn mijareke sereke ye û xwedî tarîxeke pir kevn e. Nimûneyêñ cuda yên serpêhatiyêñ evîndarî û “firaq/wuslet”a aşiq û maşûq hertim bûne mijara gelek berhemêñ edebî di nivîsêñ edîbêñ kurd de. Nîmuneya herî nasraw a evîna li jorê jî hat nîşandan, “Mem û Zîn” û “Xec û Siyabend” e.

Lêkolînêñ li ser tarîxa edebiyata kurdî nîşan didin ku rîwayetêñ evînê û têkiliya aşiq/maşûq di vê edebiyatê de, bi taybetî di warê qonaxêñ serpêhatiya evînê de, bi awayêñ pir cuda hatine vegotin. Ev cudahî bi taybetî di rîwayetêñ evînî yên di destanêñ lehengîya kurdî de hatine vegotin, berceste dibin.

1. Nêrînek li ser Tarîxa Destanêñ Lehengî-Evînî di Coxrafyaya Kurdan de

Destan, bi piranî wekî helbesteke ku bi gelempêrî jî kevneşopiya devkî ya kevnar, di forma vegotineke domdar de, destkeftiyêñ yek an jî çend karakterên lehengî ên dîrokî an jî efsanewî, pîroz dike, tê pînasekirin û ji aliyê rexnegirîñ serdema Ronesansê ve wekî cureya herî payebilind a giştî ya cureyêñ edebî hatiye qebûlkirin. (Abrams & Harpham, 2012: 107). Di heman demê de destan, di warê kevneşopî û desthilatdariyê de, bi cihê xwe yê taybet, di lûtkeya hiyerarşıya cureyan de, bi îdîaya xwe ya herî kevnbûnê û ji ber vê yekê jî ya herî desthilatdar, wekî bavê hemî cureyêñ edebî, tê destnîşankirin (Hardie, 2019: 26).

Kevneşopiya destanê di coxrafyaya Îranê de, di esasê xwe de, hikayeta împaratoriyyêñ Îranê vedibêje, ku wekî dewreke domdar a padışahan hatiye dizaynkirin. Vê keneşopiyê di çanda Îranê ya berî İslâmê de dest pê kiriye û piştî İslâmê jî dewam kiriye. Belgeyêñ tarîxî û edebî eşkere nîşan didin ku piraniya hikayetêñ lehengî yên çanda Îranê, bi taybetî bi destanêñ rojavayê Îranê, yanî herêma kurdan, berî têkçûna împaratoriya Sasaniyan hatibûn berhevkirin (Vali, 2021: 23).

Belgeyêñ tarîxî, bi taybetî çavkaniyêñ ku ji hêla nivîskarêñ Yewnanî ve hatine nivîsîñ derbarê tarîxa kevneşopiya destanêñ lehengî-evînî de, di coxrafyaya ku iro kurd lê dijîn de, yanî derbarê navenda împaratoriya Medan de (678 b.z.-549 b.z.) agahiyêñ sûdmend didin û dikare bê gotin ku ev berhem, berhemêñ herî kevin in ku li ser vê mijarê de agahiyen didin me. Di berhemêñ nivîskarêñ Yewnanî de tê dîtin ku behsa destan, çîrok, meselok û helbestêñ serdema Medan hatiye kirin. Wekî mînak, Athenaeus di *Deipnosophistae*yê de ji kesekî bi navê Dinon neqîl dike ku di serdema padışahiya Astiyagê de (585-550 b.z.), padışahê dawî yê Medan, wî bi hevalêñ xwe re şahî li dar dixist. Di şahiya wî

de kesekî bi navê Angares destanê menzûm bi awayekî ahengî distira ku di nav stranbêjan de yê herî navdar û hozanê padişah bû (Athenaeus, 2010: 232-233).

Di heman demê de, tê dîtin ku di çavkaniyêن Yewnanî de hin nimûneyên destanê lehengî-evînî yên Medan têن dayîn. Naşîna nimûneyên destanê Medan ji bo analîzkirina destanê lehengî-evînî yên kurdan girîng in. Ji ber ku, her wekî tê dîtin, van destanast rasterast bandor li ser destanê kurdî yên serdemêن îslamî kirine.

Mînaka herî kevn a destanê Medî ku hatiye tomarkirin, destana Stryangaisoyê û Zarinaiyê ye ku ji aliyê Ctesias ve hatiye neqîlkirin. Ctesias (4 b.z.) di Persicayê de behsa rîwayeta lehengî-evînî ya Stryangaisoyê Med û Zarinaia, şehbanûya Seka dike (Ctesias, 2010: 156-158).

Dîsa Athenaeus jî di berhema xwe de nimûneyeke din ji destanê lehengî-evînî yên serdema Medan dide ku wekî destana “Zariadres û Odatîs”ê tê nasîn. Li gorî rîwayetê “Du bira, Hystaspes û Zariadres li ser welatê Medan û axêن jora deryaya Xezerê hikim dîkin. Zariadres, serlehengê destanê, di xewna xwe de Odatîsaya keça padişahê welatê Marathoiyê dibîne û aşiqî wê dibe. Odatîs jî bi heman awayî, di xewna xwe de Zariadresî dibîne û aşiqî wî dibe. Zariadres ji Homaratesê padişahê Marathoiyê keça wî dixwaze, lê padişah daxwaza wî qebûl nake, ji ber ku padişah dixwaze keça xwe bide kesekî ji welatê xwe. Ji ber vê yeke jî şahiyeke li dar dixe da ku keçik yek ji mezinêن welatî wekî hevserê xwe hilbijere. Gava ku Zariadres ji vê bûyerê agahdar dibe, bi dizî ve û bi rûyê pêçayî diçe welatê Marathoiyê û besdarî şahiye dibe. Padişahê welatî qerarê dide ku Odatîs qedeha kê bi şerabê tijî bike, ew dê bibe hevsera wî. Di şahiye de Odatîs Zariadresî nas dike û qedeha wî tijî dike. Piştre aşiq û maşûq bi dizî ve li wasiteya Zariadresî siwar dibin û ji welatê Marathoi direvin (Athenaeus, 2010: 329-333). Li ser destana jorî heta niha gelek xebat hatine kirin (Boyce, 1955: 463-477), lê dikare bê gotin ku destana Zariadres û Odatîs berî her tişti hem ji aliyê naverokê ve hem jî ji aliyê kesayetan ve pir dişibe destana Memê Alan (Lescot, 1942: XVII).

Belgeyên tarîxî nîşan didin ku kevneşopiya destanê lehengî li rojavayê Îranê ku iro kurd lê dijîn, piştî serdema Medan jî dewam dike. Ji van destanê lehengî-evînî yên herî nasraw yên rojavayê Îranê, yên serdema Part/Eşkanî destana “Vîs û Ramîn” û destana “Bîjen û Menîje”yê ne.

Destana “Vîs û Ramîn” yek ji destanê nasraw ên Îrana berê îslamê ye ku carinan wekî romansekê jî tê binavkirin. Ev destan li gor Sadiq Hîdayet, di wateya modern ya peyyê de, romanek e û tiştê ku “Vîs û Ramîn” ji çîrokêن din ên romantîk ên kevn cuda dike, naveroka wê ye. Ji ber ku berevajî rîwayetê evînî yên kevn, mijara “Vîs û Ramîn” pir bi rehetî/gustaxî hatiye hilbijartin (Hidayet, 1377: 381).

Digel ku guhertoya pehlewî ya “Vîs û Ramîn” negehiştiye ber destê me, lêkolînêن berfireh ên li ser vê destanê îsbat dîkin ku ew aîdê serdema Partî ye. Li gorî Minorsky destan li ser “pehlewiyek” kevn e û gelek ji beşen wê, wan hest û

helwestan vedibêjin ku bi ramanên zewac, jin û evînê yên serdema Îslamî re naguncin (Minorsky, 1946: 741-763). Rîwayeta destanê ku ji aliyê Fexredîn Es'edê Gurganî (ss. 5a koçî) ve bi helbestkî û bi farisî hatiye honandin, wiha ye: “Di cejna bîharê de (Newroz?) Şahê Merwê, Şehrûya şahbanûya bedew a Mehabadê dîbîne û aşiqî wê dibe. Lê Şehrû eşqa wî qebûl nake, ji ber ku jineke zewicî ye û hem ji emirdirêj e. Lê Şahê Merwê ku mirovekî şehwetbaz e, dev ji wê bernade û dixwaze herî kêm bi keçikeke wê re bizewice. Şehrû bi fikra ku êdî di vî temenî de ne mumkin e ducanî bibe, sozê dide ku eger rojekê keçikeke wê çêbibe, dê wê bide Şahê Merwê. Lê piştî demekê Şehrû ducanî dibe û keçikeke pir bedew û delal tîne dînyayê. Navê wê dikin Vîs û wê didin dadokekê da ku wê perwerde bike. Vîs li cem dadokê, ligel ‘Ramîn’ê birayê biçük yê Şahê Merwê mezin dibe. Sal derbas dibin û Vîs digehije temenê zewacê. Şehrû dixwaze wê bide Vîroyê birayê wê. Lê Vîs nerazî ye. Dema Şahê Merwê hay ji vê bûyerê dibe, soza dayî tîne bîra Şehrûyê. Lê ne Şehrû û ne ji Vîs ji vê zewacê razî ne. Şahê Merwê arteşa xwe amade dike û êrişî wan dike. Di dema şerî de, Qarenê Şahê Mehabadê, mîrê Şehrûyê ji tê kuştin. Paşî Şahê Merwê diyariyan ji Şehrûyê re dişine û dîsa daxwaza xwe ya zewacê vedibêje. Vê carê daxwaza wî tê qebûlkirin. Şahê Merwê birayê xwe ‘Ramîn’ dişîne da ku bûkê bîne cem wî. Ramîn ligel Vîs, tevî karwanî dikeve rê, ji Mehabadê ber bi Merwê ve diçin. Lê di rê de, ji nişka ve bayek radibe û perdeya erebeya Vîsê vedive. Ramîn bi nihêrîna yekem, evîndarî Vîsê dibe û tê bîra wan ku ew bi hev re mezin bûne. Vîs, mecbûr bi Şahê Merwê re dizewice. Lê Vîs bi hinceta şîna bavê xwe, Şahî ji xwe dûr dixe û ji dadoka xwe dixwaze rîyeke bibîne da ku wê ji Şahî xilas bike. Dadok efsûnekê amade dike û hêza cinsî ya Şahî têk dibe. Dema ku Şah ji evîna Vîs û Ramîn haydar dibe, hêrs dibe û wan tehdîd dike. Vîs û Ramîn ji welatî direvin lê Şah wan peyda dike û vedigerîne û wan ji hev cuda dike. Ramîn di nav xema evînê de dişewite, çengekê çêdiye û ji bo Vîsê stranan distire. Şah dîsa wî tehdîd dike. Bi pêşniyara rûspîyan, Ramîn ji welatî tê aforozkirin. Ramîn terka welatî dike û bi keçikeke bi navê Gul re dizewice da ku Vîsê ji bîr bike, lê bi ser nakeve û Gul ji wî berdide. Ramîn bîryarê dide ku bi dagirkirina bajarî xwe bigehîne maşûqa xwe. Şeveke ku Şah çûye nêçîrê, bi cil zilamên ku cil û bergên jinan li xwe kirine, êrişê koşka Şahî dike û wî cihî talan dike. Piştî dagirkirina koşkê, Ramîn xwe ji bo şerî li hemberî Şahî amade dike lê beriya şerî, berazek êrişî Şahî dike û wî dikuje. Bi mirina Şahî, Vîs û Ramîn digehijin hev û bi salan, bi hev re dijîn heta ku pîr dibin û Vîs giyanê xwe ji dest dide. Ramîn, bi xemgîniyeye mezin wê dixe gorê û ew ji sê salan li kêleka gorê, di perestgeha agîrî de dimîne heta ku giyanê xwe teslîm dike” (Gurganî, 1377: 41-127).

Destana lehengî-evînî ya “Bîjen û Menîje”yê ji yek ji navdartirîn destanên evînî-lehengî yên çand û edebiyata Îranê ye. Girîngiya vê çîrokê, ji bilî behsa naverok û mijara wê, ew e ku aîdê serdema Partî ye (Xakeqî Mutleq, 1369: 286) û paşî derbasî edebiyata destanî ya serdema Îslamî ya Îranê bûye. Di lêkolînên edebiyata cîhanê de versiyona herî nasraw a vê çîrokê riwayeta Firdewsî ye (ss. 10-11 z.) ku di berhema xwe ya navdar Şahnameyê de pêşkêş kiriye, lê ev destan di

nav gelek etnîşîteyênu ku îro li coxrafayaya Îranê dijîn jî berbelav e. Serlehengê vê çîrokê (ku bi navênu cuda, wekî “Bîjen û Gurazan (berazan)” jî tê nasîn), Bîjen e. Bîjen li gorî rîwayetênu kurdî kurê Gîwê kurê Guderzê kurê Geşwad e û ji nişâ Kawayê Hesinkar e. Dêya wî Banû Goşesb jî, keça Rustemê Zal e. Menîje jî keça bedew a Efrasiyab, padışahê Tûranê ye. Ji ber ku di beşa sêyem a vê gotarê de, dê ev destan bi berfirehî bê ravekirin, em li vir kurteya wê nadin.

Ji xeynî hevsengî ûhevşibiyênu vegotin û naveroka her sê destanêne lehengî-evînî yênu ku li jorî hatine destnîşankirin, xala herî girîng a hevpar a van her sê rîwayetan ev e ku, di dawiya çîrokê de “firaq” bi dawî dibe û aşiq û maşûq li hev tênu û “wuslet” pêk tê.

2. Şahnameyên Kurdî: Qada Şerî û Evîna Lehengî

Rîwayetênu mîtolojîk/destanî yênu ku îro wekî Şahname tên naskirin, di eslê xwe de mîraseke edebî ne ku ji rîwayetênu Îranê yênu berî İslâmeh gehîstine roja me û bi zimanênu cuda yênu îranî yênu wekî farisî, kurdî, lorî û hwd. hatine vegotin. Yek ji milletênu ku rîwayetênu destanî yênu berî İslâmeh parastine û di çanda xwe ya edebî de wekî cureyekî bi navê “Şahnameyên Kurdî” domandiye, kurd in.

Şahnameyên Kurdî, ku bi zaraveyênu cuda yênu kurdî hatine gotin, kuliyyateke mezin e li ser gotegot û çîrokênu mîtolojîk, hemasî û lehengî ku kevneşopiya neteweyî, ayînî, dînî û civakî ya kurdan veveyan dike. Ev mecmue bi piranî ji rîwayetênu mîtolojîk û destanî yênu pehlewanî-lehengî û car caran ji evînî yênu çanda kurdan pêk hatiye û ji bo nasînâ ayîn û kevneşopiyen kevin ên kurdan ji çavkaniyeke gelekî girîng e. Çîrokênu Şahnameyê dikarin wekî yek ji navgînênu girîng bênu dîtin ku kurdan tarîxa mîtolojîk-lehengî-efsanewî yan “tarîxa zêrîn” a xwe pê veguhestiye. Yanî, çîrokênu Şahnameyê hem di çanda kurdan de cihê xwe yê folklorîk girtine û hem ji bi awayekî xurt bi tarîxa kurdan re têkilhev bûne (Vali, 2021: 23-24).

Divê bê gotin ku diyarkirina tarîxa nivîsîna Şahnameyên Kurdî karekî zehmet e, lê tê bawerkirin ku ew çîrok berî Şahnameya Firdewsî ava bûne (Neqîsbendî & Kazzazi & Dawudabadi 1393: 152) û vegotina wan di serdemênu cuda de, di nav kurdan de dewam kiriye. Zîra çavkaniyênu tarîxî behsa hebûna berhemên destanî li rojavayê Îranê, yanî li herêma kurdan, beriya serdema Firdewsî dikin. Ev sê berhem ku mixabin negehiştine roja me, “Kitêbî Seksîran” an “Sekîkîn”, “Şahnameya Pîrozan” û “Gurdnameya Rustem Larcanî” ne û taybetiya van ji neqîlkirina serpêhatiyênu Rustemê Zal û malbata wî bûne (Akbarî Mafaxir, 1401: 9-11).

Di Şahnameyên Kurdî de kesyetê navendî, leheng e. Di riwayeta mîtîk/destanî de, leheng, kesayetekî sereke, rastîn yan xeyalî ye ku bi cesaret, hêz û zerafeta xwe, li hemberî astengî û xetereyan disekine, ji bo fedakariyê amade ye, têdikoşe, şer dike û car caran ji giyanê xwe feda dike. Di heman demê de, leheng kesekî xudan hêzeke der-mirovî (superhuman) ye, wêrekiya laşî heye, nîv-xudayî, rûmetdar û parêzvan e. Lehengê destanî ji hêla pênaseyê ve “serfiraz” e.

Ew serfirazî, ji bo ku alikariya azadiyê bike, “pêwistî” yan “bextê xweş” aktif dike. Ev jî tiştê ku azadî nikare bi cih bîne, ev bi cih tîne (Schelling, 1989: 248).

Li gorî Frye, di fiksiyona edebî de tevnê rûdanê ji karê kesekî pêk tê. Ev kes, eger “şexs” be, leheng e û fiksiyona wî/wê jî ne li gor qistasên exlaqî, belkî li gorî çalakiyêñ lehengî tê dabeşkirin ku ji yên xelkê mezintir, kêmter an jî wekhev in. Frye li gorî kiryarêñ lehengî, cureyêñ lehengan dabeş dike û dibêje ku di fiksiyona edebî de em rastî pênc cure lehengan tê: 1. Lehengê mîtîk, ku ji mirovên din û derdora wan, ji aliyê cewherê xwe ve bilindtir e. Ew leheng hebûneke pîroz/xwedayî ye û çîroka wî jî wekî çîroka xwedayekî, mythos e. 2. Lehengê romantîk, ku li gorî dereceya xwe ji mirovên din û ji derdora xwe baştir e. Kiryarêñ wî ecêb in lê ew bi xwe wekî însanekî tê nasîn û cîhana wî wisa ye ku ji qanûnêñ asayî yên xwezayê dûr nasekine. Cesaret û bêhnfirehî ku ji me re xwezayî ne, ji wî re jî xwezayî ne. 3. Rêber, ku li gorî dereceya ji insanêñ din balatir e, lê ji havirdora xwe ya xwezayî, ne balatir e. Hêza desthilatdarî, azwerî û ifadeya wî ji me zêdetir e lê tiştêñ ku dike, girêdayî rexneyêñ cîvakî û sîstema siruştê ne. 4. Eger ne ji mirovên din û ne jî ji havirdora xwe bilindtir be, leheng yek ji me ye. 5. Eger ji aliyê hêz û zîrekiyê ve ji me kêmter be jî, leheng aîdê moda îronîk e (Frye, 1990: 33-34).

Lehengên Şahnameyên Kurdi ji aliyê kesayetî ve bi piranî di kategoriya lehengên mîtîk û destanî de cih digirin û bi piranî xwedî xislet in ku wekî taybetiyêñ lehengê mítolojîk (Raglan, 1956: 174-175) tê qebûlkirin. Dayika wan lehengan bakîreyeke esîl e, bavê wan padışah/mîr e, dê û bavê wan ne xizm in, bi awayekî dersirûştî dikeve malzaroka dêya xwe, car caran wekî kurê Xwedê tê pejirandin. Pirî caran bav dixwaze zarokê xwe bikuje, li cihekî nepenî an jî li welatekî dûr, ji aliyê malbatekê ve tê xwedîkirin, behsa zaroktiya wan nayê kirin, gava dikemilin diçin wî cihê ku dê lê bibin qral, piştî têkbirina padışah, ejderha, dêw an jî heywanekî wehşî bi prenresa keça padışahê berîya xwe re dizewicin, dibe padışah/mîr, demekê bê teşqelete welatî bi rê ve dibin, zagonan dînîvisin lê dûvre hezkirina xwedayan an jî gel, ji wan re namîne, ji text û bajîr tê dûrxistin, bi awayekî nepenî û bi piranî li ser girekî dimirin, ku kurêñ wan hebin jî nabin xwedî text/rêveberiyê, termê wan nayê veşartin lê xwedî tirb an jî tîrbeyêñ pîroz in. Lîbelê tê gotin ku di navbera mînaka lehengê rojavayî û yê rojhilatî de cudahî hene. Lehengê rojavayî takekes e, ji ber vê jî bi awayekî traîk mecbûr e bi êş û sirra demê re mijûl bibe. Lî lehengê rojhilatî cewher e. Ew di zat û eslî xwe de ne xwedî karakterekî ye lê temsîliyetekî wî ya ebediyetê heye. Ew lehengê destlênedayî, ji bandora têkiliyêñ dînyaya fanî dûr maye an jî ew bi awayekî serkeftî xwe ji wan xilas kiriye. (Campbell, 1962: 243).

Wekî tê zanîn, di zanista edebiyatê de menzûmeyêñ destanî û menzûmeyêñ lîrîk wekî du cureyêñ edebî yên cuda û serbixwe têne qebûlkirin. Menzûmeyêñ destanî bêhtir riwayetên kiryan, ên pehlewanî, egîdî û mîrxaşî yên leheng (an) in. Di berdêla vê de, menzûmeyêñ lîrîk bi piranî vebêj û rîwayetên hestêñ însanî yên wekî evîn, dostanî, êş, hîcran û firaqê ne. Lîbelê hin caran

menzûmeyên destanî û menzûmeyên lîrîk dikarin têkilhev bibin. Zîra serpêhatiyên lehengî dikarin bibin sebeba peydabûna evînê yan jî berefajiyê vê, evîn carinan dikare bibe sedema peydabûna destaneke lehengiyê. Di gelek berhemên edebî de em dikarin vê têkiliya destan û evînê bibinin. Yanî têgeha “evîn”ê dikare bibe hêmana sereke ya destaneke lehengiyê. Ji ber vê jî di destanên lehengî de, têgeha evînê, dikare wekî temayekê bê bikaranîn. Zîra evîn, hesteke taybet a însanan e û di xwezaya wî/wê de ye û lehengên destanan jî berî her tiştî “însan” in. Di Şahnameyên Kurdî de serpêhatiyên evînî yên lehengan ji du aliyan ve girîng in: berî her tiştî serpêhatiya evînî yan evîndarbûn dikare bibe sedema şerî, yanî serpêhatî û destanên nû. Di heman demê de jî, evîn û evîndarbûna lehengî/ê ji bo jidayikbûna lehengên nû pêwîst e.

Wekî berê jî hat gotin, di Şahnameyên Kurdî de, kesayetekî bingehîn û sereke tê dîtin: leheng. Ev kesayet di pêvajoya rîwayetên Şahnameyan de ewqas berbiçav e ku Şahnameyên Kurdî, bi gelemerpi, dikarin wekî çîroka “leheng” an bêñ nirxandin. Serpêhatiyên van kesayetên bingehîn jî dikarin di bin du bûyerên esasî de bêñ dîtin: şer û evîn. Bi gotineke din, riwayetên Şahnameyên Kurdî bi giştî qada şer û evîna lehengän in.

Bi analîza rîwayetên Şahnameyên Kurdî, di rîwayetên navborî de “leheng” xwedî du karakteran e ku bi tevahî jî hev cuda ne. Ya yekem kesayeta wî ye ku di dema şerî de, gava ku berjewendiya welat-neteweyê di bin xetereyê de ye, derdikeye hole. Jixwe di rîwayetên Şahnameyên Kurdî de peywîra yekem a lehengî şerkirina li hemberî dijmin, parastina sînor û axa welatî, gel û textê padîşah e. Ev dijmin carinan padîşah û artêşa welitekî cîran e, carinan jî hebûneke mîtolojîk/dersirûştî wekî dêw an ejdeha û hwd. e. Leheng hertim bi cesaret û hêza xwe, li hemberî astengî û xetereyan radibe, xwe ji bo fedakariyê amade dike, şerî dike û car caran ji bo armanca xwe ya pîroz giyanê xwe feda dike.

Karakterê duyemîn ê lehengî jî di sepêhatiyên wî yên evîndariyê de derdikeyê holê. Ev karakter dikare wekî karakterê “veşartî” yê lehengî jî bê binavkirin. Gava ku mijar evîn û serpêhatiyên evînî be, bi awayekî eşkere tê dîtin ku “leheng”, bi peywendîdanîna ligel “anima”, bi wateya “laş/beden” li hemberî “animus” an “ruh” (Hillman, 1987: 18), maskeyê xwe yê “lehengî” yê radike û dide aliyevê, xwe ji kesayetîya xwe ya “lehengî” yê dûr dike, dibe mirovekî jirêzê û hetta dibe kesayetê herî bêhest. Di eslê xwe de, dikare bê gotin ku “lehengî” maskeyek e ji bo her lehengekî. Maskeyekî wisa ku “leheng”, li gorî daxwaz û hêviyên gel û civakê, mecbûr e li xwe bike. Lê gava ku leheng aşiq dibe an ji jinekê hez dike û dixwaze xwe bigehîne wê, maskeyê ku me behs kir, ji holê radibe û kesayetekî din, bi tevahî cuda ji yê ku tê nasîn, derdikeye holê. Ëdî armanca “leheng”, armanceke şexsî ye û bi berjewendiya şexsî ve girêdayî ye. Loma jî “evîn” a wî ne pîroz e, ne îdealîstîk e û bêtir realistîk e. Ji ber vê jî pirî caran reftar û helwesta lehengî (aşiq) li hemberî müşûqa xwe xelet, egoîst û bêhest xuya dike.

Di rîwayetên evîn û evîndariyê lehengî de, di Şahnameyê Kurdî de çend taybetmendiyêner sereke têr dîtin: di van rîwayetan de evîn tiştekî hissî û dînyayî ye, yanî ne xwedî alîyekî îlahî ye. Taybetmendiya din jî ev e ku berevajî rîwayetên evînî yên klasîk ku tégeha “fîraq”ê temaya sereke ye û wusleta aşiq-mâşûq bi cih nabe, “evîn”ê Şahnameyê Kurdî bi piranî xwedî “dawî”yeke xweş û netrajîk in û di encamê de aşiq û müşûq, piştî fîraqê, digehin wusletê.

Di heman demê de evîna lehengî di rîwayetên Şahnameyê Kurdî de, evîneke derveyî (exogamic) ye. Yanî padişah/lehengê Şahnameyê Kurdî her tim aşiqê keç/jineke biyanî dibin û ji ber vê jî lehengê herî navdar ji aliyê dayikêñ xwe ve, ne kurd/îranî ne. Dayikêñ wan hemî ne-kurd/îranî ne û bi piranî tûranî ne. Lîbelê divê bê diyar kirin ku berovajî vê yekê, qet ne mimkun e. Yanî zelamekî (leheng) biyanî tu carî nikare aşiqê keç/jinek kurd/îranî bibe. Derbarê koka kevneşopiya zewaca derveyî (exogamy) de gelek nêrînên cuda hene (bnr. Frazer, 1910: 71-169), lê cuda ji nêrîn û teoriyên hebûn û belavbûna kevneşopiya zewaca derveyî di civatên kevn de, sebeba zewaca kesayetên kurd/îranî, ku sembola ronahî/başiyê ne, digel jînîn biyanî -bi piranî neteweyêñ dijmin yên wekî tûranî-ku sembola tarî/xirabiye ne, dikare wekî diyalektîka ronahî/tarî, du tégehêñ bingehîn di cihanbîniya İranê ya beriya İslâmî de bêñ nirxandin. Ronahiya mutleq û tariya mutleq hertim di şerî de ne û bi tena sere xwe de jî ne kamil in. Lî encama zewaca lehengê kurd/îranî ligel keç/jineke biyanî, di eslê xwe de, tê wateya tevlihevbûna van du hêzên dijber ku encama vê bûyerê jî jidaykibûna lehengekî “kamil”, xwedî hêz û sifetên der-mîrovî ye. Ji ber vê jî ew dibin serlehengêñ riwayetên kurd/îranî. Çimkî ew, cihê xuyabûna dervatîrîn nirxêñ civatê ne û di laşen xwe de hêzên herî ronî yên herî tarî bi hev re dihewînin.

Wekî berê jî hat gotin, rîwayetên evîndariyê xwedî çend qonax û merheleyan in. Yekem qonax, qonaxa naskirinê ye ku aşiq-mâşûq hevdu nas dîkin. Ev qonax di rîwayetên cuda de dikare bi awayêñ cuda pêk bê. Di vegérana edebiyata cîhanê de tê dîtin ku aşiq bi dîtina rasterast an ne rasterast (di xewna xwe de), an bi dîtina sûretê müşûqê, an jî tenê bi bihistina wesfîn wê/wî, dikare evîndar be. Piştî qonaxa aşiqbûnê, bi piranî qonaxa fîraq û hîcrañ dest pê dike. Di rîwayetên evînî yên klasîk de, wekî hat diyarkirin, ev qonax heta dawiya rîwayetê dewam dike û “wuslet” tu carî pêk nayê. Aşiq û müşûq her di êş û derdê fîraqê de dimînîn, bi arezûya wusletê dişewitin û di dawiyê de jî giyanê xwe ji bo eşqa xwe teslîm dîkin. Wekî hat gotin Leyla û Mecnûn, Romeo û Juliet, Şîrîn û Ferhad û Mem û Zîn nimûneyêñ herî navdar ên vê evîna îdealîzekirî ne.

Di rîwayetên Şahnameyê Kurdî de jî destpêka serpêhatiyêñ evînî yên lehengî wekî nimûneyêñ li jorê diqewimin. Aşiq (keç/jin be an zelam) bi dîtina rasterast an ne rasterast, an jî tenê bi bihistina wesfîn wê/wî, evîndar dibe. Piştî vê qonaxa yekem, cudahiya di navbera serpêhatiyêñ evînî yên di Şahnameyê Kurdî de û sepêhatiyêñ evînî yên “klasîk” derdikevin holê.

Di vegérana Şahnameyê Kurdî de piştî ku leheng evîndar dibe, yan yekser bi müşûqa xwe re digehine hev, yan aşiq û müşûq demeke kurt ji hev dûr dibin, lî

di dawiyê de dîsa digehin hev. Yanî digel hebûna merheleya “firaq”ê, encama serpêhatiya evînî, “wuslet” e.

Xaleke din a girîng jî ew e ku di rîwayetên evînî yên navborî de ne pêkan e ku leheng (aşiq) dema cudabûn/cudamayına ji машۇقا xwe, behsa derd û êşa “firaq”ê bike. Yanî digel ku evîn çînên civakî û cudahiyêni nijadî ji holê rake jî, di rîwayetên Şahnameyê de tu carî leheng li ber jineke (maşûq) biyanî xwe şermezâr û biçük nake (Battesti, 1400: 34). Di hin rîwayetên evînî yên Şahnameyên Kurdî de, wekî em ê bibînin, dibe ku piştî wusletê, firaq di navbera aşiq û müşûqê de çêbibe. Lê dîsa jî aşiq (leheng) qet gazinan ji derd û êşa evîn û firaqê nake.

Serpêhatiyêñ herî navdar ên evînî yên ku di Şahnameyên Kurdî de hatine vegotin evîna “Zal û Rûdabe”, “Rustem û Tehmîne”, “Rustem û Keça Mesîhayê Abid”, “Bijen û Menîje”, “Berzû û Hûrlîqa” û “Berzû û Mîhrê Cihansoz (Sîmîn Uzar)” in.

3. Nimûneyên Wuslet û Firaqa Leheng di Şahnameyên Kurdî de

3.1 Zal û Rûdabe

Yek ji serpêhatiyêñ evînî yên navdar ên rîwayetên Şahnameyên Kurdî, evîna Zal û Rûdabeyê ye. Li gorî mîtolojî û destanêni Îranî, Zal kurê Sam û bavê Rustem e. Navê wî wekî “Zalê Zer” derbas dibe ku peywa “zal” û “zer” her du di wataya “kal” de ne (Sefa, 1363: 561).

Li gorî rîwayetên destanî kurê Sam nebû û dilê wî zarokek dixwest. Jineke wî ya xweşik hebû û jê hêvî dikir ku kurekî bide wî. Ev jin bi hemle bû û piştî neh mehan kurekî xweşik anî dinyayê lê porê vî zarokî gişt spî bû. Dêya wî zarokekî wisa anîbû dinyayê ku newêrabû ji Sam re behsa wî bike. Heft rojan kesekî newêrabû ji Sam re bibêje ku jina wî zarokekî kal anîye dinyayê. Dawiya dawî, dêşîra wî bi wêrekî diçe cem Sam û jê re dibêje ku Xwedê tiştê ku xwestiye dayê. Sam ji textê xwe dadikeve û ji bo dîtina zarokê xwe diçe cem. Zarokekî pir xweşik dibîne li hemberî xwe ku ew xweşikbûn di kêm însanan de heye, lê serekî wekî yê kalan ku tu caran nedîtiye. Wexta ku kurê xwe dibîne hemî hêviyê xwe yên cîhanê wenda dike. Ji kurê xwe şerm dike û diqehire, neletê li qedera wî dike û fermanê dide ku wî zarokî bibin derveyî welêt (Vali, 2021: 63).

Zarok li derekî nêzîkî çiyayê Elborzê, tê terkkirin. Hêlîna Sîmurx, teyrê efsanewî, jî li ser vî çiyayî bûye. Gava ku çêlikên Sîmurx birçî dibin, çûka hêzdar ji bo peydakirina xwarinekê difire û Zalê sava dibîne ku ew ji birçiyân digirî. Sîmurx dadikeve, wî digire û tîne hêlîna xwe û dibe xwedîyê Zal û wî perwerde dike. Zal demeke dirêj li hêlîna Sîmurx dimîne. Sîmurx Zalî xwedî dike, navê Destanê Zend lê dike (Vali & Ölmez, 2022: 315). Li gorî riwayetên Şahnameyê Sam di xewna xwe de kurê xwe dibîne. Piştî jîxewrabûnê gazî yên mezîn û zana dike û behsa xewna xwe dike. Yên zana jê re dibêjin ku bila biçe û li kurê xwe bigere. Sam biryarê dide û derdikeve rê, ber bi çiyanan ve diçe da ku kurê xwe bibîne. Sîmurx derdikeve

ser çiyayî, Sam û alîgirêن wî dîbîne. Dizane ku Sam ji bo kurê xwe hatiye. Zarokî amade dike ji bo çûyîna wî. Sîmurx, Zalî teslîmî Sam dike û yek ji perên xwe dide wî, da ku di bin siya hêza wî de bimîne (Vali, 2021: 67). Zal ji çiyayî dadikeve û diçe cem bavê xwe û dibe lehengenkî navdar û Sam jî textê xwe teslîmî Zal dike û rêberiya artêsa xwe dide wî. Zal dibe pehlewanê Menûçêhrê Padişahê Îranê. Zal hertim rojêن xwe bi nêçîr û şahiyê derbas dike:

Ev saete dewran mestanê mey bî
 Şay Menûçêhr padişay Key bî
 Rojî ne rojanê Menûçêhr Key
 Saqî ne dewran bade çenî mey
 Zal pehlewan bî ve paytextê şâ
 Ve fermanîş bî temamî sipa
 Hey binwaz binwaz badey erxewan
 Serxweş bîn ve mey Şa pehlewan
 Her roj ve şikar şevan bi şadî
 Seday kûs meçiya wadî ve wadî
 Bêhtir ve şahan Keyananê Key
 Meçiya ve gerdûn naley def û ney
 Her ye karış bî Menûçêhr ve text
 Îmcar bişnewîm ve şahanê wext (Hemzeyî, 1393: 909- 910).

Jiyana Zal bi nêçîr û şahiyê derbas dike heya ku ew wesfa bedewiya keça Mihrabê padişahê Kabulê dibihîze. Li gorî riwayetan, Mihrab ji malbata Zehak bû û hemî welatê Kabulê yê wî bû. Her sal xerac û bac dida Sam, lewre nikarîbû li hemberî wî şerî bike. Li gorî Şahnameyên Kurdi Mihrab xwedî keçekê bû bi navê Rûdabe, bi husn û cemal û kemalê di dinyayê de navdar bû. Gava ku Zal terîfa bedewiya Rûdabeyê dibihîze, bêyî ku wê bibîne evîndarê wê dibe. Lê ji ber ku Mihrabê bavê Rûdabeyê, neviyê Zehak e (Shahbazi, 2002) Menûçêhr û Sam naxwazin ku Zal bi Rûdabeyê re bizewice:

Mihrab ve bane textê wêş berqerar bî
 Padişay Babul nev roj ve kar bî
 Yek duxterî daşt wêney hûr perî
 Zuleyxay Yemen Belqîs şay perî
 Meşhûr bî ve nam ew husn û kemal
 Ta kêm kêm yava te'rîfiş ve Zal
 Her ve nedîde mihriş nîşt ve dil

Munadî ve zewq Zal nemana batil (Hemzeyî, 1393: 910).

Lê di dawiyê de Zal dikare wan razî bike ku bi Rûdabeyê re bizewice û wuslet di nav wan de pêk tê:

Ve sed felaket Zal bî qerîn

Resî ve wisal ev hûrî cemîn (Hemzeyî, 1393: 910).

Wekî tê dîtin, qonaxêv evîna Zal û Rûdabeyê wekî “Bihîstina wesfa maşûq, aşiqbûn, firaq û wusletê dikare bê rêzkirin. Lê xala balkêv ev e ku berî her tiştî, di pêvajoya rîwayetê de tenê di nîv-beytekê de behsa derdê firaqa Zal, derbas dibe. Aşiq jî qet gazinan ji derd, êş û zehmetiya firaqê nake. Di heman demê de dema firaqa aşiq (Zal) ji maşûqa xwe pir kurt e û piştî vê dema kurt a firaqê, wusleta aşiq û maşûq pêk tê.

Divê bê gotin ku çîroka evîna Zal û Rûdabeyê herçiqas kurt be jî di destanê lehengî-evînî yên cîhana Îranê de xwedî cihekî taybet e. Zîra bi saya vê evînê lehengê sereke yê destanê kurdo-îranî yanî Rustemê Zal ji dayik dibe. Li gorî rîwayeta Şahnameyên Kurdî, piştî zewaca Zal û Rûdabeyê, neh meh û neh roj derbas dibin û Rûdabe kurekî tîne dinyayê ku navê wî dikin Zeware (Hemzeyî, 1393: 910). Heft sal şûnde Rûdabe careke din bardar dibe. Lê barê wê giran û zikê wê pir mezin e. Bijîşkêv navdar nikarin dermanê derdê wê bibînin. Di dawiyê de bi alîkarî rînenşandana Sîmurx, Rustem tê dinyayê. (Hemzeyî, 1393: 911-912).

3.2. Rustem û Tehmîne

Wekî hat gotin, Rustem bêguman lehengê sereke ye di hemî rîwayetên mîtolojîk û destanî yên rîwayetên edebiyata kurdî û îranî de. Kesayeta wî bi piranî bi şerîn li hemberê dêw, ejdeha û padişahê wek Efrasiyabê Tûranî tê zanîn. Rustem wekî lehengekî, xwedî hêzêñ derasayî ye. Hertim parêzvanê sînorêñ welat û textê padişah e. Tacbexş û rizgarker e û amade ye da ku giyanê xwe ji bo nirxêñ neteweyî feda bike. Lê ji bilî van mijarêñ navborî, serpêhatiyêñ evînê yên Rustem jî hene. Dikare bê gotin ku serpêhatiyêñ lehengiya Rustem ewqas girîng in ku macerayêñ wî yên evînî bi piranî têñ piştguhkirin. Li gorî rîwayetên Şahnameyên Kurdî, Rustem xwedî sê kurêñ bi navê Suhrab, Feramerz û Cihangîr; û sê keçen bi navê Guşesb Banû, Zer Banû û Gîsiya Banû ye. Lê di rîwayetên Şahnameyên Kurdî de bi tenê serpêhatiya evîniya wî ya bi dêya Suhrab û Cihangîr re û di hin rîwayetan de ya Feramerz hatiye vegotin.

Serpêhatiya evîna Rustem û Tehmîneyê, keça padişahê Semenganê, di destana trajik a ku bi piranî wekî “Rustem û Suhrab” navdar e, hatiye vegotin. Destan bi çûyîna Rustem a ji bo nêçîrê dest pê dike. Rustem diçe nêzîkî sînorê Tûranê ji bo nêçîrê. Wexta ku nêzî bajarê Semenganê dibe, derekî tijî bi kerkûviyan dibîne. Hespê xwe tevdigerîne û dest bi nêçîrê dike, çend kerêñ kûvî dikuje. Yekî ji wan dipêje û dixwe. Dûv re xwe dirêj dike û dixwaze hinek bêhna xwe bide dema ku hespê wî Rexş diçêre. Çend siwariyêñ tirk têñ, Rexşî dibînin. Dixwazin wî bigirin û çend toran diavêjin hemberî wî. Hesp xwe diparêze, lê wî

digirin ú dibin bajêr. Dema ku Rustem şiyar dibe, li hespê xwe digere lêbelê li tu derê nabîne. Bi hêrs, dikeve rêya Semenganê. Dema ku nêzîkî bajêr dibe, padişah û yên mezin hîn dibin ku Rustem bi peyatî hatiye bajarê wan. Hemî dixwazin wî bibînin. Padişah bi peyatî tê cem wî. Rustem ji wan re dibêje şopa lingên hespê wî heta Semenganê tê. Rustem hespê xwe terîf dike. Heke wî peyda bikin Rustem dê gelek minetdar be. Lê heke Rexş neyê peydakirin, dê serê mezinan jê bike. Şahê Semenganê dixwaze Rustem aram bike, jê re dibêje Rexşê Rustem nikare bê veşartin, ji ber ku herkes wî nas dike. Sozê didine wî ku ew ê lê biggerin û dê bi lez wî bînin. Ev gotin kêfa Rustem tîne, çûyîna cem padişah qebûl dike û yên mezin pêşwaziya wî dikin bi ziyafetekê. Rustem westiya ye, ji ziyafetê radibe û diçe radikeve (Behramî, 1389: 54-57).

Wê şevê, Tehmîneya keça şahê Semanganê diçe odaya Rustem. Tehmîne yekane jin e ku di Şahnameyên Kurdî de navê wê wekî jina Rustem hatiye tomarkirin û wekî piraniya çîrokên Şahnameyê, Rustem rastî vê jinê tê ku ne ji koka wî ye û ne jî ji welatê wî ye (Vali, 1369: 176). Rustem şiyar dibe û rûyê Tahmîneyê dibîne. Rustem navê wê dipirse û dixwaze hîn bibe ka li çi digere di tariya şevê de.

Tehmîne xwe dide nasîn û jê re dibêje ku yekane keça şahê Samanganê ye (Behramî, 1389: 57-58). Tehmîne jê re dibêje ku wexta egîdiya Rustem seh kiriye, evîndarê wî bûye û jî bo ku Rustem were Semanganê, planek çekiriye. Ferman daye siwareyên xwe ku hespê Rustem bidizin û wê bi vî awayî Rustem anîye bajarê xwe (Lutfiniya, 1399: 112) û niha jî ji bo eşkerekirina evîna xwe hatiye cem wî. Tehmîne daxwaza xwe tîne ziman: wuslet û anîna kurekî ji Rustem:

Jewsa ve sewday tom keft ne xeyal
 Ve xem wiyerdim roj û mang û sal
 Ji dewrê qedîm her ta ve îsa
 Coftê min perî tu nemebû peya
 Er kurik je min jî piştê te bû
 Seranser ‘alem ve hem mekûbû (Behramî, 1389: 58).

Di nav jinênu ku di rîwayetên Şahnameyê de hatine behskirin, Tehmîne wekî jineke biaqil tê dîtin (Basirizadeh & Raoufzadeh & Zaheri, 2020: 772) ji ber vê jî jê re soza peydakirina Rexş jî dide. Piştre Tehmîne radibe û diçe odeya xwe. Rustem jî ji bedewiya Tehmîneyê matmayî dimîne û evîndarê wê dibe:

Pîlten heyran daney laleş bî
 Aşuftey cemîn zulf û xaleş bî (Hemzeyî, 1393: 342).

Li gorî hin nêrînan, Rustem teswîra “anîma”ya xwe di Tehmîneyê de dibîne (Alimoradi & Eşrefzade, 1398:216). Di heman demê de xwesteka Tehmîneyê (daxwaza kurekî ji Rustem) dikare wekî xwestekeke xweperest (egoîst) jî bê nirxandin (Abdullaeva, 2012: 41). Roja din, Rustem gazî padişahê

Semenganê dike û ji padışahî keça wî dixwaze. Padışahê Semenganê bi vê daxwazê pir kêfxweş dibe û keça xwe dide Rustem. Daweteke mezin tê kirin û Rustem û Tehmîne şeşekê bi hev re derbas dikin û wusleta wan pêk tê:

Ev şev ke cem biyan be şadimanî

Kamrewa bibîn dil be temamî (Lutfiniya, 1399: 113).

Ev şev ta ve su razan mekirdin

Ne camê hem şerbet wesil mewirdin (Behramî, 1389: 58).

Murad hasil bîn her du çenî hem

Şad biyen we hem Tehmîne û Rustem (Hemzeyî, 1393: 342).

Roja din, piştî peydabûna hespê wî, Rustem Tehmîneyê dihêle û vedigere welatê xwe. Beriya ku jê veqete, Rustem mucewherekî, ku li ser milê xwe girê dabû, dide Tehmîneyê û jê re dibêje: heke tu keçekê bînmî dinyayê, vê daynê ser porê wê, lê heke kur be, bi milê wî ve girê bide. Ji neh mehan şûnde Tehmîne kurekî tîne dinyayê ku dişibe Rustem. Navê wî dikin Suhrab. Di dewama vê destana trajîk de Suhrab mezin dibe û gava ku hîn dibe ka bavê wî kî ye, artêşekê amade dike û diçe şerî da ku bavê xwe bike şah. Lê bi lîstika qederê bav û kur, bêyî ku hev nas bikin, di qada şerî de rû bi rû dimînin, şerî dikin û Rustem kurê xwe dikuje. Li gorî hin guhertoyê destanê dema Tehmîne xebera mirina kurê xwe dibihîze, artêşekê amade dike û êrîşî Rustem dike da ku wî bikuje û tola kurê xwe veke. Lê Zal dibe navbeynkar, Rustem û Tehmîne aştiyê pêk tînin û bi vî awayî Feramerz ji dayik dibe (Lutfiniya, 1399: 15; Hemzeyî, 1393: 387).

Di serpêhatiya evîna Rustem û Tehmîneyê de çend xalên girîng tê dîtin. Berî her tiştî aşiq, Tehmîne ye ku bi bihîstina wesfa lehengî û egîdiya Rustem, evîndarê wî bûye. Îcar Rustem di pozisyonâ “maşûq” de ye. Ew piştî dîtina bedewiya Tehmîneyê, evîndarê wê dibe. Meseleya duyemîn a girîng jî ew e ku qonaxa “wuslet”ê pir hesan, bêyî êş û derdê firaq û hîcrana aşiq û машûqê pêk tê. Mijareke din a ku balkês jî ev e ku “wuslet”a wan tenê şeşekê berdewam dike û roja din, Rustem terka Tehmîneyê dike. Li vir dikare bê gotin ku “firaq”a rasteqîn di navbera Rustem û Tehmîne de ji vir dest pê dike. Lîbelê di berdewamiya destanê de, heta dawiya rîwayetê, qet behsa derd, êş an zehmetiya firaqê nayê kirin. Rustem di vegotina destanê de qet behsa Tehmîneyê an jî qet gazinan ji derd û êşa firaqa wê nake. Tehmîne jî carekê tenê, gava ku aşiqê Rustem bûye gazinan ji firaqê dike û dibêje ku hertim di hêviya dîtina Rustem de bûye:

Îne çen sal in min arezûm in

Ne fikir û xeyal dîdinî tum in (Lutfiniya, 1399: 112).

Piştî wuslet û çûyîna Rustem jî tenê carekê behsa girîn û hawara Tehmîne ji bo Rustem, hatiye kirin:

Daîm pêy Rustem menala we derd

We emrê Xuda bar hemliş kird (Hemzeyî, 1393: 344).

Daîm pêy Rustem menala ce derd

Gerdanay Gerdûn barê hemliş kird (Lutfiniya, 1399: 114).

3.3. Rustem û Keça Mesîhayê Abid

Rîwayeta evîna Rustem û Keça Mesîhayê Abid ku di destana Cîhangîrnameyê de hatiye vegotin, yek ji serpêhatiyêv evîndariya Rustemê Zal e ku di Şahnameyên Kurdî de tomar bûye. Li gorî destanê ku heta niha versiyona kurmancî û goraniya wê hatiye dîtin, rojekê bûyera Suhrab û mirina wî tê bîra Rustem. Ji ber vê xemgîniyê siwarê hespê xwe dibe û diçe ser gora Suhrab. Ji hespê xwe peya dibe, li ser gora kurê xwe digire û demekê li wir dimîne. Piştre siwarê hespê xwe dibe û diçe. Di versiyona goranî de Rustem digehije ser kaniyekê. Li ber kaniyê keçke bedew dibîne û evîndarê wê dibe. Ji xelkê dipirse ka ev keç kî ye? Dibêjin keça Mesîhayê Abid e:

Yawa ve gîlan ve yek çeşmey av

Diya duxterê çûn şemey aftav

Aşiq bî ve bedr nûrî cemaliş

Şeyda ve lîve bî pirsa hevalîş (Lutfiniya, 1400: 175).

Li gorî versiyona kurmancî ya destanê jî Rustem Îranê terk dike û diçe Mazenderanê. Li wir keça Zahid, şahê Mazenderanê dibîne û dilê wî dikeve keçikê û aşiq dibe:

Padişahê zahid kiçekî hebû

Xuştıqî û nazenîn mehbûbe ew bû

Ew kiçe rojekê hate layê Rostem

Bi qudra ta Xudayê xalqê alem

Rostem aşiqî ew kiçe bûbû

Li gel wê kiribû çend giftugo (Oremarî, 2002: 115).

Divê bê gotin ku ne di versiyona goranî de ne jî di versiyona kurmancî de navê vê keçê nehatiye diyarkirin. Di her du versiyonan de jî wekî “keça padişah” û piştî ku kurê xwe (Cîhangîr) tîne dinyayê kî wekî “dêya Cîhangîr” hatiye behskirin.

Li gorî rîwayeta destanê Rustem bangî padişahî dike û ji padişahî keça wî dixwaze. Padişah jî ji daxwaza Rustem pir kêfxwêş dibe lê ewîlî ji keça xwe dipirse. Keçik jî ji bavê xwe re bersiva erêni diyar dike. Padişah ji bo Rustem û keça xwe daweteke mezîn çêdike û keça xwe dide Rustem. Rustem û keça padişahî cil roj û cil şevan di heremê de derbas dîkin:

Abid rîzaş bî duxter kird nîkah

Her îd perî wêş zana ray selah

Heta ke cil roj ce xelwetxane
Bî ne şewq û zewq eyes merdane (Lutfiniya, 1400: 175).
Wekî roj li xerbî ava bû temam
Çerde berdbûn yêt taze xiram
Rustem wê şevê bi meqsûd şad bû
Xwe digel nazenîn ta fecr şad bû (Oremarî, 2002: 117).

Berdewamiya vê destanê wekî destana “Rustem û Suhrab” e. Li gorî versiyona goranî ya destanê, roja din Rustem keça padışahî dihêle û terka welatê padışahê Mazenderanê dike. Beriya ku jê veqete, Rustem dîsa mucewherekê dide keça padışahî û jê re dibêje: “Ez dizanim ku tu ducanî yî, heke tu keçekê bînî dînyayê, vê dayne ser porê wê, lê heke kur be, bi milê wî ve girê bide” (Lutfiniya, 1400: 175). Bi vê gotinê dikeve pey serpêhatiyênen xwe yên lehengî. Di versiyona kurmancî ya destanê de behsa mucewherehî nayê kirin û rojekê Rustem diçe nêçîrê û bi vî awayî jina xwe terk dike, diçe dû serpêhatiyênen xwe û êdi Rustem û keça padışahî hevdu nabînin.

Digel ku destana Cîhangîrname dewam dike jî, êdî qet behsa “keça padışahî” û evîndariya Rustemê Zal nayê kirin.

Di serpêhatiya evîna Rustem û keça Mesîhayê Abid de jî çend xalên bingehîn têr dîtin. Berî her tiştî navê “maşûq” tu carî derbas nabe. Kesayeta wê bi kesayeta bav û kurê wê tê diyarkirin. Rustem bi dîtina wê, aşiq dibe, lê wusleta wan, dîsa pir hêsan, bêyî derbaskirina “firaq”ê, pêk tê. Piştî “wuslet”ê, “firaq” di nav wan de dest pê dike, lîbelê di berdewamiya destanê de, heta dawiya rîwayetê, qet behsa derd, êş an zehmetiya firaqê nayê kirin. Rustem di vegotina destanê de qet behsa maşûqa xwe, an gazarinan ji derd û êşa firaqa wê nake û ev keç/maşûq bêyî hîc şopekê ji sehneya Şahnameyên Kurdî wenda dibe.

3.4. Bîjen û Menîje:

Wekî hat gotin destana lehengî-evînî ya Bîjen û Menîjeyê destaneke kevn e ku ji serdema Partî wekî mîrateke edebî gehîştiye roja me. Ev destan ku wekî “Bîjen û Gurazan” jî tê naşîn, hem di edebiyata farisî û hem jî di edebiyata kurdî de xwedî çendîn versiyonan e û tê gotin ku yekem çîroka Şahnameya Firdewsî jî, çîroka kevn a “Bîjen û Menîje” bûye (Sefa, 1363: 177). Bîjen û Menîje weke destaneke kamil ku ne lazim e tiştekî lê bê zêdekirin, ne jî kêm kirin (D’Avril, 1888: 70) tê qebûl kirin.

Bîjen (aşiq), serlehengê destanê, li gorî hin pisporêن wek Roland, lehengê destanî yê rojavayî ye, di çanda ûranî de. Û car caran jî destana Bîjen ligel destana Parzival jî tê berawirkirin (Coyajee, 1371: 124) û dikare bê gotin ku kesayeta Menîjeyê jî, kesayeteke taybet e di nav maşûqên lehengên Şahnameyên Kurdî de, ji ber vê jî li gorî hin lêkolîneran Menîje bi sade/safbûn û xwezayîbûna xwe, bi

aramî û nefsbîçûkiyê, bi tevahî xwe dide ber nezera aşiqê xwe wekî “jina îdeal“a serdema destanî hatiye qebûlkirin (D’Avril, 1888: 71).

Di çiroka Bîjen û Menîjeyê de bihevketina di navbera du evîndaran de ya ji ber nakokiyên evîndarî û netewetiyê, mijareke girîng e di destanê Şahnameyê de. Ji ber wê jî em dikarin wan destanan wekî destanê dramatîkî bihesibînin (Xaleqî Mutleq, 1381: 91).

Li gorî rîwayetê Şahnameyên Kurdî serpêhatiya evîna Bîjen û Menîjeyê di serdema padişahiya Key Xusrew de diqewime. Wekî hat gotin, Bîjen kurê Gîw e û ji aliyê dêya xwe Banûguşesbê ve jî neviyê Rustemê Zal e.

Çiroka evîna Bîjen û Menîjeyê di Şahnameyên Kurdî de bi hatina komeke însanan dest pê dike ku ji welatê Ermanê têr ji bo dîtina Key Xusrew. Ev welat, li gorî erdnîgariya xeyalî ya Fîrdewsî, di navbera Îran û Tûranê de ye. Ew têr cem Key Xusrew û jê alîkariyê dixwazin da berazan bikuje, ji ber ku beraz welatê wan tarûmar dikin. Padişah jî mezinên artêşa xwe re dibêje ka kes dixwaze tevî wan biçe daristanê û berazan bikuje. Ji xeynî Bîjen, kesek bersiva padişahî nade. Bîjen vê peywirê hildigire ser xwe û bi Gurgîn re derdikeve rê, yê ku rêberiya wî dike ber bi welatê Ermanê ve. Dema ku digehijin daristanê, berazan dibîne û amadehiya nêçîrê dike. Roja din, Bîjen ji hevrîyê xwe Gurgîn re dibêje em bi hev re biçin nêçîra berazan. Lîbelê Gurgîn red dike, ji ber ku Bîjenî xwest vî karî bike û divê ew bike. Bîjenê ku bi bersiva Gurgîn şaş dimîne, dide pey şopa berazan û xwe ji bo şerî amade dike û hemiyan dikuje. Gurgîn ji serkeftina Bîjen diheside û fenekê lê dike. Ji Bîjen re behsa bedewiya Menîjeyê, keça Efrasiyab û baxçeyê wê dike ku kêm der hene bi wê xweşiyê û jê re dibêje bila biçe wî baxçeyî da ku bibe yekî bi navûdeng.

Cew teref ce milkê şay Efrasiyab
 Hisarî kêşan ve baxçey bû gulab
 Seaviş ce terhê bîhişt memanû
 Ne derîş durrac û qumrî mewanû
 Her sal kenaçey şay Efrasiyab
 Meşû ve seyran baxçey bû gulab
 Zulfan emberîn Menîje namiş in
 Çend hezar şahan girtarîş in (Mokri, 1966: 5).

Bîjen vê pêşniyazê qebûl dike û diçe baxçeyê Menîjeyê. Lê ji ber ku westiyaye, li bin darekê radizê. Yek ji xizmetkarê Menîjeyê wî li bin darê dibîne û ji Menîjeyê re behsa rûyê bedew ê Bîjen dike. Dilê Menîjeyê bi tiştênu ku dibihîze germ dibe. Radibe û diçe ba Bîjen û dema ku wî dibîne, evîndarî wî dibe. Bi nermî, destê xwe dide rûyê Bîjen û wî şiyar dike. Nav û nîşana wî dipirse û gazî wî dike ku bê meclisa wê (Mokri, 1966: 6-8). Lê li gorî versiyoneke din a çiroka Bîjen û Menîjeyê, gava ku Bîjen diçe baxçeyê Menîjeyê, ji dûr ve lê dinêre. Dema porê

Menîjeyê, yê wekî Şehmaran û rûyê wê yê wekî Camê Cemê dibirîqe dibîne, evîndarê wê dibe:

Westin ce balay dîbay bû gulab
Niştin Menîjey şay Efrasiyab
Zulfan çûn şamar çem werdin ve hem
Cemîn wêney Camê Cîhannumay Cem
Bîjen çunke dî zamiş xeter bî
Aşıq be zulfan çetrê qemer bî (Lutfîniya, 1399: 102).

Menîje jî bi dîtin û nasîna Bîjen, evîndarî wî dibe dilê wê bi evîna Bîjen dişewite:

Belê Menîjey şay Efrasiyab
Nihanî ce eyş diliş bî kebab (Lutfîniya, 1399: 105).
Belê Menîjey şay Efrasiyab
Nihanî ce eşqê ev bî dil kebab (Mokri, 1966: 8).

Bîjen û Menîje çend rojan bi hev re derbas dikin. Lê paşê Bîjen dixwaze here welatê xwe. Lîbelê Menîje, ku hem xwedî xisleta bedewbûn û hem jî lehengî ye (Vaccha, 1950: 169) nikare dev ji Bîjenî berde:

Watiş kenîzan bala zer sitûn
Derûnim ce eşq ser pirr in ce hûn
Ev ro ke balay Bîjen dîm ve çem
Sûçiyam wêney perwane lay şem (Mokri, 1966: 9).

Ji ber vê jî dermanê hisibîr dide Bîjen û wî dixe nav sindoqekê û Bîjenê razayî dibe welatê xwe. Bi dizî wî dibe qesra xwe û dema ku Bîjen şiyar dibe, xwe li qesra Menîjeyê, li paytextê Efrasiyab, dibîne. Bîjen li wir dimîne heta ku xulamek bi wî dihese û ji Efrasiyab re dibêje. Efrasiyab pir hêrs dibe, birayê xwe dişîne da ku Bîjen bi zincîrê girê bide û biavêje nav çalekê. Efrasiyab fermanê dide ku qesra keça wî hilweisînin da ku wê ji mal û milkên wê mehrûm bike. Menîjeya bêçare, li cem çalê dimîne. Bi rojan parsekiya nanî dike û bi şevan jî diçe cem çalê û nanê ku berhev kiriye, ji qula ku vekiriye, digehîne Bîjen û ew jî li cem çalê ji derdê firaqê gazinan dike (Behramî, 1383: 309-310).

Piştî demekê, Rustem bi cilên bazirganan, bi karwanekî dikeve rîya Tûranê ji bo azadkirina Bîjen. Dema ku Menîje xebera li ser karwanî seh dike, berê xwe dide Rustem û alîkariya wî dixwaze ji bo Bîjen. Rustem xwe eşkere nake da ku ewle bibe. Wê demê, Rustem xwarinê amade dike, gustîlka xwe tê de vedişêre û dide Menîjeyê da ku ji Bîjen re bibe. Dema ku Bîjen gustîlkê bibîne ew ê fam bike Rustem li wir e. Menîje wê xwarinê dibe û dide wî û Bîjen gustîlka Rustem tê de peyda dike. Bîjen ji Menîjeyê re dibêje bila careke din biçe cem karwanî û bi vî awayî Rustem xwe pê dide naşîn. Bi daxwaza Rustem, Menîje li

nêzîkî çala Bîjen êzingan kom dike. Dema ku dibe şev, Menîje agirekî vêdixe û rêberiya Rustem dike ji bo dîtina çalê. Rustem Bîjenî azad dike û piştre tevî lehengên din, berê xwe dide qesra Efrasiyab da ku cezayê wî bide. Şerekî mezin diqewime û Efrasiyab direve. Piştî şerî jî Menîje û Bîjen, bi Rustem û lehengên din re diçin Îranê. Key Xusrew pêşwaziya wan dike, fermanê dide ku bila şahiyevê amade bikin û Bîjen û Menîje digehijin hev” (Mokri, 1966: 39).

Weki tê dîtin, di destana Bîjen û Menîjeyê de jî piştî hevdîtin û aşiqbûnê, digel ku di nav aşiq û maşûqê de firaqek diqewime, di dawiya destanê de, dîsa aşiq û maşûq digehijin hev û wusleta wan pêk tê.

3.5. Berzû û Maşûqên Wî

Yek ji serpêhatiyêñ evînî yêñ Şahnameyêñ Kurdi jî evîna Berzûyê kurê Suhrabê kurê Rustemê Zal û maşûqên wî ye. Divê bê gotin ku serpêhatiyêñ evînî yêñ Berzû, yek ji nimûneyêñ herî balkêş e di destanêñ lehengî-evînî yêñ Şahnameyêñ Kurdi de.

Li gorî rîwayeta destanê di şerê Îran û Tûranê de Rustem artêşa Tûranê têk dibe û Berzû jî esîr dike. Lê paşî eşkere dibe ku Berzû di eslê xwe de kurê Suhrab e, yanî neviyê Rustem e. Hemî welat jî vê xeberê kîfxweş dibe. Dema Rustem egîdî û lehengiya Berzû dibîne, dixwaze meqamê fermandariya artêşa Îranê bide wî. Feramerzê kurê Rustem li dijî vê biryarê derdikeve. Ji ber ku xwe layiqî fermandariya artêşê dibîne. Dema Rustem dibîne ku di navbera kurê xwe û neviyê xwe de maye, ji bo bidestxistina vî meqamî şertekî tayîn dike: Girtina Fuladwendê Dêw ku li sînorê welatê Çinê ye. Gava mîrxas navê wî dibihîzin, hemî paşde diçin. Tenê lehengek dimîne: Berzû.

Berzû xwe amade dike û ji bo erka xwe bi cih bîne dikeve rê. Di pevajoya serpêhatiyêñ xwe de Berzû digihije baxçeyekî ecêb û ji baxçevanî dipirse xwedîyê vî baxçeyî kî ye û baxçevan jê re dibêje ku ev baxçeyê Hûrîliqayê ye, keça Cihangîr Şah, padişahê Xarezimê ye, ku niha çûye nêçîrê û dê di demek nêzîk de vegere:

Ey bax ezîz Hûrîliqa hen

Ferzendê ezîz Cihangîr Şah en

Çiyan ve şikar mahê cîhantab

Ha wext in beyû mah agitab (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 39)

Ji ber vê jî divê ji baxçeyî derkeve. Le Berzû jê re dibêje ku bêyî dîtina keça padişahî, terka baxçeyî nake û naçe. Gava ku Hûrîliqa ji nêçîrê vedigere û Berzû dibîne, silavê dide û xêrhatina wî dike û wî vedixwîne koşka xwe. Li koşkê, ji Berzû re meclîsekê saz dike û bi hev re dest bi vexwarinê dikin:

Yawa ve nizîk şêrê dilawer

Silam da ne rûy Berzû şêr ejder

Berzû wat eleyk qîbley yeqînim

Yarê dilnewaz xorşîd cemînim

Liqa wat ciwan xweş amay ve çem

Balat menîrim ve ban dîdem (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 41)

Di vê meclîsê de Berzû û Hûrîliqa evîndarî hev dîbin.

Banû mesê eşq Berzû mesê çem

Îd çûn perwane, ew çûn şûley şem (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 43)

Berzû û Hûrîliqa şeva xwe bi hev re derbas dikin, lê berî razanê, Berzû şûrê xwe dikişîne û dixe navbera xwe û Hûrîliqayê. Dadoya Hûrîliqayê xeberê ji Cihangîr Şah re dişîne. Padişah, Berzûyî gazî cem xwe dike û dibêje amade ye ku keça xwe bide wî, lê bi şertekî: kuştina ejdehayê Xarezmê. Berzû jî şertê padişahî qebûl dike:

Liqa medem pêt ve şert îqrar

Namerdan mebûn bê qewl û qerar“

“Berzû wat ey şah Xarezmî diyar

Herfit qebûl in ve şert îqrar (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 56)

Roja din Berzû xatirê xwe ji Hûrîliqayê dixwaze û ji bo kuştina ejdehayî dikeve rê û bi vî awayî firaq di navbera aşiq û maşûq de dest pê dike:

Des kerd ve gerden Liqay wefadar

Watiş nazenîn Xuda nigeħdar

Himmetxwahî kird ve Hûrîliqa

Liqa zarî kird rû kird ve bala

Wat Berzû biçû Yezdan yarit bû

Firêştey firset nigadarit bû (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 59).

Piştî gelek serpêhatî û zehmetiyan, Berzû ejderhayî dikuje û vedigere cem dildara xwe. Padişah jî soza xwe bi cih tîne û keça xwe dide wî û wusleta aşiq û maşûq pêk tê:

Şah des Berzû girde bî ve des

Wezîr hem awerd Liqay dîdemes

Cîhangîr cenî wezîrê pir fam

Des ve des kirdin du şoxê behram (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 73-74).

Lê piştî mehekê Berzû maşûqa xwe berdide û ji bo ku peywira xwe, girtina Puladwendê Dêw, bi cih bîne, dikeve rê û dîsa firaqa wan dest pê dike. Xala girîng ev e ku êdî di destanê de qet behsa Hûrîliqayê nayê kirin. Tenê di destana

Teymûrnameyê de hatiye gotin ku piştî çûyîna Berzû Hûrîliqa di derd û êşa firaqê de rojên xwe derbas dikir:

Daîm pey Berzû her ne zarî bî

Şevan waweyla bê qerarî bî (Lutfinia, 1400: 54).

Ji neh meh û neh rojan şûnde Hûrîliqa kurekî tîne dinyayê û navê wî dike Teymûr (Lutfinia, 1400: 54). Li gorî destana Cewahirpoş, destaneke din a Şahnameyên Kurdî jî Teymûr dema mezin dibe, bêyî ku bizane bavê wî kî ye, diçe bi Rustem re şer bike, lê têk diçe. Rustem dixwaze wî bikuje. Wê gave Hûrîliqa ku rûyê xwe veşartîye derdikeye meydanê, rûyê xwe vedike û xwe dide nasîn û dibêje ku Teymûr kurê Berzû ye (Behramî, 1383: 226).

Di rîwayeta Berzûnameyê de gava ku Berzû dikeve rê da ku peywira xwe bi cih bîne, bi dêwan re şer dike û birîndar dibe. Qerlanê hespê wî, wî tîne baxçeyê Mîhrê Cihansozê Sîmîn Uzar, keça Efrasiyabê tûranî. Gava ku Mîhrê Cihansoz Berzûyê birîndar dibîne fermanê dide ku wî derman bikin. Birînê Berzû derman dibin lê Berzû aşiqê Mîhrê Cihansoz dibe, Mîhrê Cihansoz jî evîna wî qebûl dike û bi ví awayî Berzû û Mîhrê Cihansoz mehekê bi hev re derbas dikan:

Aşiq bî ve eşq cemînê alas

Heyran mende bî we şîrîn balaş (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 103).

Velhasil Berzû ta wadey yek ma

Ne êyş noş bî şîrbeçey şeca (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 107).

Lê piştî demekê Berzû dixwaze biçe nêçîrê. Mîhrê Cihansoz jê re dibêje ku nikare jî wî dûr bimîne û tehemula firaqê bike, lê Berzû guh nade wê, xatira xwe ji wê dixwaze û dikeve rê "(Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 113-114). Berzû di pêvajoya serpêhatiyêن xwe de rastî gelek zehmetîyan tê û dîl dikeve, bi dêw û cadû û artêşa tûranî re şer dike û dîsa dîl dibe. Lê di dawiya destanê de piştî şerekî mezin, di nav Îran û Tûranê de, lehengên Îranî bi ser dikevin, Berzû rizgar dibe û dîsa digehije maşûqa xwe Mîhrê Cihansoz. Key Xusrew, padışahê Îranê, fermanê dide ku bila daweteke mezin amade bikin û Berzû û Mîhrê Cihansoz digehijin hev" (Ahengernijad &, Perwîzî, 1390: 356-361).

Wekî tê dîtin, di serpêhatiyêن evînî yên Berzû de jî, leheng pir hêsan aşiq dibe. Bi hêsanî "wuslet" jî bo wî pêk tê. Bi heman hêsanîyê dikare maşûqa xwe bihêle û ji bo peywireke "girîngtir" terka wê bike. Leheng dikare careke din evîndarê keçekte din bibe û piştî demeke kurt wê jî bihêle û biçe dû peywira xwe. Di dema firaqê de qet jî derd û êşa firaqê gazinan nake û di dawiya serpêhatî de jî dîsa digihêje maşûqa(ên) xwe û wuslet ji nû ve bo wî pêk tê.

Encam

Wekî hat dîtin di destanê Şahnameyên Kurdî de serpêhatiyên evînî yên lehengê mîtolojîk/destanî mijareke berbelav e ku ji aliyê şairan ve hatiye vegotin.

Lehengê mîtolojîk/destanî di serpêhatiyêن xwe de aşiq dibe û evîna wî dikare bibe mijara firaq û wusletê. Di eslê xwe de, wekî li jorê jî hat nîşandan, serpêhatiya evînî ya lehengî jî xwedî hemî merhaleyêن serpêhatiyêن evînî ye. Lehengê mîtolojîk/destanî qonaxêن hevdîtin, evîndarbûn, firaq û wusletê tecrube û derbas dike. Lîbelê tê dîtin ku berevajî “evîn”êن klasîk ku her behsa derdê firaq û hîcran û dûrbûn/dûrmayîna ji maşûq tê kirin û tê de “wuslet” wekî merheleyekê ku ne gengaz e aşiq bikare xwe bigehînê, di serpêhatiya evînî ya lehengî de, “wuslet” dikare bi hêsanî pêk be. Bi gotineke din, ji bo lehengê mîtolojîk/destanî du têgehêن bingehîn ên evînê, yanî wuslet û firaq, xwedî wateyeke cuda ne û pîvana dereceya heqîqîbûna evîn/hezkirinê, ne eşâ firaq/hîcranê ye.

Lehengê mîtolojîk/destanî bi hêsanî aşiq dibe. Leheng ji bo pêkanîna wusletê têdikoşe, hewl dide û di dawiyê de dikare bi hêsanî xwe bigehîne maşûqa xwe. Lîbelê xwestek û daxwaza “wuslet” a lehengê mîtolojîk/destanî ne hesteke platonîk e. Di rîwayetên behskirî de, bi zelalî dikare bê dîtin ku berevajî evînên “klasîk”, xwesteka “wuslet” a lehengê mîtolojîk/destanî hesta şehwetê jî dihewîne. Lê “wuslet” a leheng û maşûqa wî hertim di çarçoveya exlaq û edetên cîvakî (xwazgînî, dawet û hwd.) de pêk tê.

Di heman demê de lehengê mîtolojîk/destanî piştî “wuslet”ê jî dikare bi hêsanî, ji bo peywireke pîroz, maşûqa xwebihêlê û qet ji firaqê gazinan neke. Ji ber ku ji bo lehengî, evîn tiştek/mijareke şexsî ye û ji ber vê jî ne pîroz û ne îdealîzekerî ye. Tarîxa riwayetên destanêن lehengî-evînî yên coxrafiyaya kurdan nîşan dide ku ji destanêن berî İslâmê heta destanêن ku di Şahnameyên Kurdi de hatine vegotin, di warê evîn, wuslet û firaqê de heman pêvajo dewam dike û tu carî merheleya firaqê heta mirina aşiq û maşûqê dewam nake û wuslet hertim pêk tê. Evîn ji bo lehengê mîtolojîk/destanî yê kurdan ne tiştekî pîroz e lê serpêhatiyeye lazim e. Ji ber ku leheng jî berî her tiştî “însan”ê û dixwaze hez bike û bê hezkirin. Ji bo lehengê mîtolojîk/destanî evîn sehayeke şexsî ye û ne sehayeke neteweyî ye. Ji ber vê jî leheng tê de dikare maskeyê xwe yê lehengiyê rake, wekî însanekî jirêzê tevbigere û carinan bibe egoist û bêhest. Di heman demê de aşiqbûn û pêkhatina wusletê ji bo rîwayetên mîtolojîk/destanî lazim e, ji ber ku dibe sebebê serpêhatiyêن nû û jidayîkbûna lehengêن nû. Çawa ku hat dîtin ji evîn û wusleta Zal û Rûdabeyê, Rustem tê dinyayê, ji evîna Rustem û Tehmîneyê Suhrab û Feramez tê dinyayê, ji evîna Rustem û keça Mesîhayê Abidê Cîhangîr tê dinyayê û ji evîna Berzû û Hûrîliqayê jî Teymûr tê dinyayê û her yek ji wan dibin lehengêن destaneke nû û xwedî serpêhatiyêن nû.

Çavkanî

- Abdullaeva, F. (2012). *Woman in the Romances of the Shahnama, di Love and Devotion: From Persia and Beyond*, ed. S. Scollay, Melbourne & Oxford: Macmillan Art Publishing, rr. 41-45.
- Abrams, M.H., Harpham, G.G. (2012). *A Glossary Of Literary Terms*, tenth Edition, Boston: Wadsworth.
- Ahengernijad C. &, Perwîzî, Q. (1390) *Berzûname*, Kirmanşah: Baxê Ney.

- Akbarî Mafaxir, A. (1401). Negahî No bê Edebiyatê Hemasî der Îran, di Pejûhişhayê Zebanî ve Edebiyatê Karbordî, Danişgahê Wilayetê Îrânshahr, Dufeslname yên texessusî, sal 1, şomarê 2, Payîz-Zimistan, rr. 1-30.
- Alimoradi, M. & Eşrefzade, R. (1398). Meşûqê Pehlewan, Bazşenaxtê Sûretê Duganeyê Kohenolgûyê Perî der Teqabol ba Şêş Şexsiyetê Hemasî, Pejûheşnameyê Edebê Xenayî Danişgahê Sîstan ve Belûçistan, sal 17, şomarê 33, rr. 209-232.
- Athenaeus (2010). *The Learned Banqueters (Deipnosophistae)*, Book 12-13.594b, ed. & trans. by S.D. Olson, London: Harvard University Press.
- Baldwin, J. (1985). *The Price of the Ticket: Collected Non-fictioni 1948-1985*. New York: St. Martin's/Marek.
- Basirizadeh F. & Raoufzadeh, N. & Zaheri Sh. (2020). The Image of Woman in Eastern and Western Epic Literature, *BIRC Journal*, Vol. 3, No. 2, rr. 768-776.
- Battesti, T. (1400). *Zen der Şahname*, amd. A. Effîfi, Tehran: Mahrîs.
- Behramî, İ. (1383) *Şahnameyê Kurdi*, cîld 1, Tehran: Hîrmend
- Behramî, İ. (1389) *Şahnameyê Kurdi*, cîld 2, Tehran: Hîrmend.
- Bierce, A. (1911). *The Devil's Dictionary*, Cleveland & New York: The Worls Publishing Company.
- Boyce, M. (1955). Zariadres and Zarêr, di *Bulletin of the School of Oriental and African Studies*, University of London, Vol. 17, No. 3, rr. 463-477.
- Campbell, J. (1962). *The Masks Of God Volume II, Oriental Mythology*, London: Secker & Warburg.
- Coyajee, J.C. (1371). *Pajûheşhayî dar Şahname*, wergera bo farisî: C. Dûstxah, Tehran: Neşrê Zendeh Rûd.
- Ctesias (2010). *History of Persia, Tales of the Orient*, by L. Llewellyn-Jones & J. Robson, London & New York: Routledge.
- D'Avril, A. (1888). *Les Femmes dans L'Epopée Iranienne*, Paris: Ernest Leroux.
- Dostoyevsky, F. (1967). *The Brothers Karamazov I*, tra. C. Garnett. London: Heron Books.
- Gurganî, F.E. (1377). *Vîs û Ramîn*, amd. M. Rowşen, Tehran: Seday-I Mu'asie.
- Frazer, J.G. (1910). *Totemism & Exogamy*, Vol IV, London: MacMillan and Co.
- Frye, N. (1990). *Anatomy Of Criticism, Four Essays*, With a Foreword by Harold Bloom, Tenth printing, Princeton and Oxford: Princeton University Press. xs
- Hardie, P. (2019). Ancient and Modern Theories of Epic, di *Structure of Epic Poetry, Volume 1: Foundations*, Ch. Reitz & S.Finkmann (ed.), Berlin/Boston: De Gruyter.
- Hemzeyî, F. (amd.) (1393) *Rezmname, Ustûrehayê Kuhenê Zagros*, bexşê 2, cild 2, Kirmanşah: İntîşaratê Danişgahê Razî.
- Hidayet, S. (1377). Çend Nukte derbarê Vîs û Ramîn, di Vîs û Ramîn, amd. M. Rowşen, Tehran: Seday-I Mu'asie.
- Hillman, J. (1987). *Anima, An Anatomy of a Personified Notion*, Texas: Spring Publications Inc..
- Lescot, R. (1942). *Textes Kurdes, Deuxieme Partie, Mamê Alan*, Beyrouth: Institut Français de Damas.

- Lewis, C.S. (1960). *The Four Loves*, London: Geoffrey Bles.
- Lutfinia, H. (1399). Şanamey Kurdî, bergî duhem, Seqiz: Pexşankarî Bîryar.
- Lutfinia, H. (1400). Şanamey Kurdî, bergî sêhem, Seqiz: Pexşankarî Bîryar.
- Mewlana Celaleddîn (1389). Mesnewî yê Me'newî, amd. T. Subhanî, Tehran: Ruzene.
- Minorsky, V. (1946). "Vîs û Ramîn, a Parthian Romance", *Bulletin of the School of Oriental and African Studies*, University of London, Vol 11, No. 4, rr. 741-763.
- Mokri, M. (1966). *La Légende de Bîzan-U Manîja*, Paris: Librairie Klincksieck.
- Neqşibendî, S.E., Kazzazi, M.J., Dawudabadi Farahanî, M.A. (1393). Nigahî be Şahname- Sorayî ve Rezname-Sorayî der Edebê Kurdî ve sanjesh an ba Shahname Firdewsi, di *Faslname Ilmi Pajuheshi Zaban va Edeb-e Farsi-Daneshkade Edebiyat va Zabanha-ye Khareji Daneshgah Azad İslami vahed Sanandaj*, sal 6, shomare 18, Bahar , rr. 149-166.
- Oremarî, M. (2002). Beyta Rustemê Zal, di Beytên Kurdî, amd. M. Abdulla, Hewlêr: Wezaretî Perwerde, rr. 111-171.
- Platon (2018). *Şölen-Dostluk*, çev. S. Eyüboğlu-A. Erhat, İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayıncıları.
- Raglan, L. (1956). *The Hero, A Study In Tradition, Myth and Drama*, New York: Vintage Books.
- Russell, B. (1948). *The Conquest of Happiness*, 10. Imp., London: George Allen & Unwin Ltd.
- Schelling, F. (1989). *The Philosophy of Art*, ed. and trans. D. W. Stott, Minneapolis: University of Minnesota Press.
- Sefa, Z. (1363). *Hemase Sorayî der Iran*, ez Qedîmîterîn 'Ehdê Tarîxî ta Qernê Çedardehomê Hejrî, Çapê 4, Tehran: Entesaratê Emir Kebîr.
- Shahbazi, Sh. (2002). Rudâba. <https://iranicaonline.org/articles/rudaba>
- Şemsî Tebrîzî (1369). *Meqalat*, amd. M.A. Muvehhid, Tehran: Xarezmî.
- Stendhal (1891). *De L'amour*, Paris: Calmann Lévy.
- Stuhlmann, G. (1987), *Aliterate Passion: Letters of Anais Nin & Henry Miller, 1923-1953*. San Diego New York London: Harcourt Brack Jovanovich Publishers.
- Vaccha, P.B. (1950). *Firdousi and The Shahnama*, Bombay: New Book Co., Ltd.
- Vali, Sh. (2021). *Şahnameya Kurdî, Rustemê Zal û Heft Xana Wî*, İstanbul: Avesta.
- Vali, Sh., Ölmez, C. (2022). Kesayet û Heyberên Mîtolojik di Edebiyata Goranî/Hewramî de, di Mîtos û Edebiyat, Mîtosên Kurdo-îranî di Edebiyata Kurdî de, ed. Sh. Vali- K. Subaşı, İstanbul: Nûbihar.
- Vali, V. (1369). *Zen der Edebiyatê Hemasî û Iran*, di Heyatê Îctimai Zen der Tarîxê û Iran, cîl I, Qebl ez Îslam, Kolektif, Tehran: Emîr Kebîr, rr. 169-226.
- Xaleqî Mutleq, C. (1369). Bîjen û Menîje ve Vîs û Ramîn, Muqeddemeî ber Edebiyatê Partî, di Îranşinasî, şomarê 6, Tabistan, rr. 273-298.
- Xaleqî Mutleq, C. (1381). *Enasorê Dram der Berxî ez Dastanhayê Şahname*, di Tenê Pehlevan ve Revanê Xeredmend de, Meskoob, Sh. (ed.), Tehran: Tarhê No.

قراءة شعرية ابن الرومي في شخصية ابن الفراق وتأثيرها
سايكلوجية

Halid Halid¹

Ayrılık Trajedisи ve İbnü'r-Rûmî'nin Şiirsel Kişiliğine Etkisi: Psikolojik Bir Okuma

Öz

- عياس محمود العقاد، ابن الرومي حياته من شعره، مؤسسة هنداوي، 2014م.
- نازك الملائكة، سلوكولوجية الشعر ومقالات أخرى، الهيئة العامة لقصور الثقافة، 2000م.
- وفاء عمر عثمان الغوتى، قصيدة الرثاء عن ابن الرومي "دراسة موضوعية"، رسالة قدمت لنيل درجة الماجستير، جامعة أم القرى، المملكة العربية السعودية، كلية اللغة العربية، قسم الدراسات العلي، 2001م.

Kaynakça

- Ahmed Umer, Edebu'r-rihlât ve'l-esfâr dirâse mukârane beyne'l-mukârebeti'l-Endelûsiyye ve tecribet's-Sibâî, Ankara: Sonçag Yayınları, 2023.
- Ahmed Umer, "el-Îcrââtü'l-üslûbiyye li şîriyyeti'l-inzivâ inde's-Sümeysir", Bingöl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, 17/1 (Haziran 2021), 34-53.
- El-Beyhakî, el-Mehâsin ve'l-mesâvî, thk. Muhammed Süveyd, Beirut: 1995.
- Rhuvon Guest, İbnu'r-Rûmî hayâtuhû ve Şîruhû, trc. Hüseyin Nassâr, Kahire: el-Merkezu'l-kavmî li't-terceme 2011.
- İbnu'-Rûmî, Divân, thk. Hüseyin Nassâr, Kâhire: Dâru'l-kutub ve'l-vesâiki'l-kavmiyye, III. Basım, 2023.
- Abbâs Mahmûd el-Akkâd, İbnu'r-Rûmî hayâtuhû min şî'rîhî, Müessesetü Hindâvî, 2014
- Nâzik el-Melâike, Saykolociyyetu's-şî'r ve mekâlâtün uhrâ, Kahire: el-Hey'etü'l-âmme li kusûri's-sekâfe, 2000.
- Vefa Umer Usmân el-Fûtî, Kasîdetü'r-resâ an İbni'r-Rûmî, Riyad: Câmi'atü Ümmî'l-Kurâ, Külliyyetu'l-Lugati'l-Arabiyye, Yüksek Lisans Tezi, 2001.

Hîkayeta Keyhana Frenk û Feqe Ehmedê Baban: Mirin Çêtir e ji Fîraqê

İbrahim Tardus¹

Frenk Keyhan ve Feqe Ehmedê Baban Hikayesi: Ölüm Evladır Fıraktan

Öz

Çaldırın Savaşı'ndan sonraki dönemde Kurt topraklarının büyük bir kısmı Osmanlı'nın müttefiki olan Kurt mirleri tarafından yönetilmeye başlandı. Kürtler ile Yavuz Sultan Selim arasında kurulan ittifak Kanuni Sultan Süleyman döneminde de devam etti. Kanuni, Bağdat'ı fethettikten sonra bu bölgedeki Kurt topraklarının çoğunu Kürtlere verdi. Böylelikle Baban Emirliği, Baban aşireti tarafından Bağdat Paşalığına bağlı olarak yönetilmeye başlandı. Baban aşiretinin adı, emirliğin idaresinden sonra tarihte ön plana çıkmaya başladı. Baban ismi ve Baban Emirlığının kuruluşuyla ilgili bir hikaye vardır ki aynı zamanda Feqe Ehmedê Baban'ın ülkesini terk edip vuslata ermek için Frengistan'a gidişini konu edinir. Bu hikaye aynı zamanda Doğu edebiyatlarında meşhur olan Şeyh-i San'an hikayesiyle de benzerlikler barındırır. Feqe Ehmedê Baban'ın hikayesi Abdulkadir b. Rustem el-Babanî, Claudius James Rich ve Yamûlkîzade Azîz tarafından yazılmıştır. Yamûlkîzade Azîz, Jîn dergisindeki yazısında kısaca konuya değinmiş; ancak Abdulkadir Rustem-el Babanî ve Claudius James Rich hikayeyi uzun uzun yazmıştır. Hikayenin bu iki versiyonu bazı yönlerden benzer, bazı yönlerden ise farklıdır. Bu çalışmada bu iki varyant benzerlik ve farklılıklar açısından karşılaştırılacaktır.

Anahtar Kelimeler: Frengistan, Baban Emirliği, karşılaştırma, varyant, hikaye.

¹ Dr. Öğr. Üyesi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kurt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, ibrahimtardus1@gmail.com, ORCID: [0000-0002-8292-0921](https://orcid.org/0000-0002-8292-0921).

The Story of Frenk Keyhan and Feqe Ahmed Baban: Death is Better than Firaq

Abstract

In the period after the Battle of Çaldiran, most of the Kurdish lands were ruled by the Kurdish Princes as allies of the Ottomans. The alliance that was established between the Kurds and Yavuz Sultan Selim continued during the time of Qanuni Sultan Suleyman. After Qanuni conquered Baghdad, he gave most of the Kurdish lands in this region to the Kurds. The Kurdish region here, Baban Principality, was governed by the Baban tribe and belonged to the Pashalik of Baghdad. The name of the Baban tribe also appeared prominently in history after the administration of the kingdom. There is a story about the name of Baban and the establishment of the Baban Principality. In this story, Feqe Ahmed the Baban leaves his country and goes to Frengistan to reach Keyhan. The story of Feqe Ehmedê Baban also has similarities with the story of Sheikh-i San'an, which is famous in Eastern literatures. Feqe Ehmed story was narrated by Abdulkadir b. Rustem el-Babanî, Claudius James Rich and Yamûlkîzade Azîz. Yamûlkîzade Azîz wrote some things about the subject in his article in Jîn magazine. But Abdulkadir Rustam-al Babanî and Claudius James Rich wrote the story in a long way. These two versions of the story are similar in some ways and different in some ways. In this work, these two variants will be compared in terms of their similarities and differences.

Keywords: Frengistan, Baban Principality, comparison, variant, story.

128

Kurte

Serdema piştî Şerê Çaldiranê piraniya axên Kurdan êdî wek muttefikê Osmaniyan ji alî mîrên Kurdan ve hatin rêvebirin. Tifaqa ku di navbera Kurdan û Yavuz Sultan Selîm de hatibû avakirin di wextê Kanuni Sultan Suleyman de jî berdewam bû. Piştî Kanunî Bexdayê feth kir, wî piraniya erdén Kurdan yên li vê heremê da uhdeya Kurdan. Herema Kurdan li vir bi navê Mîrektiya Baban ji alî eşîra Baban ve girêdayî Paşalika Bexdayê hate rêvebirin. Navê eşîra Baban jî bi awayekî beloq piştî rêvebirina mîrektiyê di dîrokê de hate xuyan. Li ser navê Baban û avabûna Mîrektiya Baban hîkayetek heye ku Feqe Ehmedê Baban di vê hîkayetê de ji bo wûslatê ji welatê xwe dertê û berê xwe dide Frengîstanê. Ev hîkayet di heman demê de bi hîkeyata Şêxê Sen'an re jî hin xalêñ hevpar dihewîne. Hîkayeta Feqe Ehmedê Baban ji alî Abdulkadir b. Rustem el-Babanî, Claudius James Rich û Yamûlkîzade Azîz ve hatiye nivîsîn. Yamûlkîzade Azîz di nivîsa xwe ya kovara Jînê de kêm be jî derbarê mijarê de hin tişt nivîsîne. Lê Abdulkadir Rustem-el Babanî û Claudius James Rich hîkayetê bi awayekî dirêjane nivîsîne. Ev her du varyantê hîkayetê ji hin aliyan ve dişibine hev û ji hin aliyan ve ji hev vediqetin. Di vê xebatê ev her du varyant ê ji alî hevşîbî û cudahiyêñ xwe ve bêñ berawirdkirin.

Keywords: Frengîstan, Mîrektiya Baban, berawirdkirin, varyant, hîkayet.

Extended Abstract

In 1514, after the Battle of Chaldiran between the Ottoman and Iranian Empires, Yavuz Sultan Selim had commissioned Idris-i Bidlisi to win over the Kurdish tribes near the Ottoman-Iranian border regions to the Ottoman side. When Yavuz Sultan Selim returned to Amasya from Tabriz, Idris-i Bidlisi set out to meet with Kurdish leaders. After many meetings with Kurdish leaders, Bidlisi convinced most of them to form an alliance with the Ottomans. In fact, the conditions for this agreement were quite favorable. Because when Kurdish leaders had previously tried to meet Shah Ismail, Shah Ismail had imprisoned them. This also showed that a partnership between the Kurds and the Safavids was unlikely. On the other hand, the fact that the Ottomans and the Kurds were Sunni in sect was one of the reasons that brought the Ottoman-Kurdish alliance closer. After the forces of the Ottoman-Kurdish alliance through Bidlisi drove the Safavids out of the Kurdish regions, Kurdish emirs once again became the rulers of their ancestral lands. However, Baban Kurds were not included in this alliance that was formed during the reign of Yavuz Sultan Selim. The participation of the Baban Kurds in the Ottoman-Kurdish alliance was delayed by 20 years. After Suleiman the Magnificent's conquest of Baghdad, mir of Baban Haji Sheikh, who was on his way to pledge allegiance to the Magnificent, was killed on the way. Hearing this, Suleiman the Magnificent gave the rule of the Baban lands to Budaq, the son of Haji Sheikh. From then until 1850, the Baban Emirate was ruled by the Baban tribe. In addition to these historical facts, the Kurds of Baban had a legend about the establishment of their emirate. The legend included the founding of the emirate and was also a love story. According to the story, Feqe Ehmed joined the Ottoman army for jihad. The Ottomans were then at war with the Franks. At that time, before a battle, a soldier from each side could fight one-on-one to decide the winner of the battle. Feqe Ehmed stepped forward on behalf of the Ottomans and faced a Frank. Feqe Ehmed knocked down his opponent in single combat and was about to kill him when he realized she was a woman and spared her life. His opponent then became his spoils of war and the Sultan gave the lands of Baban to Feqe Ehmed. The Emirate of Baban was thus established. Frenk Keyhan and Feqe Ehmed's encounter in the war turned into a love between the two. However, this love did not happen immediately; Feqe Ehmed had to overcome many difficulties to reach Keyhan. According to this story, which can be explained very briefly, the Babans considered themselves the descendants of a European woman warrior. This was quite a different situation compared to other Kurdish dynasties, because Kurdish dynasties have always seen themselves as the descendants of Kurdish-Arab-Persian, that is, influential families or people of eastern origin, and were proud of it. Another interesting point about this story is that it is a love story and what Feqe Ehmed, the hero of the story, did to reach Keyhan. In fact, the relationship between Keyhan and Feqe Ehmed had two phases: firstly, Keyhan fled to Frankistan to live with her family while she was married to Feqe Ehmed out of debt for her life, and secondly, when Feqe Ehmed followed her to Frankistan, she thought that she actually loved Feqe and fled with him from Frankistan. There are

certainly various versions of this story told among the people, but there are two variants that have survived in written form and are written in detail. The first was written by Abdulkadir b. Rustam al-Babanî, a Kurd, and the second by the Englishman Claudius James Rich. When both variants are analyzed, it is seen that there are similarities and differences between them. Although the main body of the variants is the same, the plot and the characteristics of the characters differ from each other. In our study, after summarizing the main outlines of both variants, the similarities and differences will be analyzed using the comparison method.

Destpêk

Dema dîroka xanedanên Kurdan bê xwendin mijara eslê xanedanên Kurd wekî mijareke balkêş dertê pêş. Balkêşıya mijarê ew e ku eslê hin xanedanan wekî ne ji nijadeke Kurd hatine qeydkirin. Lê ev tişt ji bo xanedanan ne tişteke biçûkdîtinê bereksê vê wekî tişteke serbilindî û mexrurîyetê hatiye nîşandan û ev ji alî xanedanan ve jî hatiye qebûlkîrîn. Bo nimûne dîroknûsê fermî a Mîrektiya Hekariyê Temerxanê Yazîcî gava dîroka mîrên Hekariyê nîvîsiye di beşa sedema nivîsandina pirtûkê de diyar kiriye ku ew ê dîroka "Ebbasiyan" binivîse (Yazîcî, 2022: 55). Helbet ji vir quesda wî ji Ebbasiyan mîrên Hekariyê ye. Diyar e ku ev tişt ji alî malbatê xanedanan ve jî wekî serbilindî û esîlbûnê hatiye dîtin û wan ji bo meşrutîyeta xwe ya dînî vê çîroka nijadî bi kar anîye. Herweha Ebbasîbûn di heman demê de dihat wê wateyê ku ew ji nesla Peyxember in û pîroz in. Bo nimûne dema seyyahê sedsala XIX. behsa mîrên Behdînanê dikin dibêjin, wîsa tê qebûlkirin ku nijada mîrên Behdînanê digihe xelîfeyêن Ebbasiyan. Ji ber vê xelk gelek rêza wan digire û wan wekî kesên pîroz dibîne. Ew, dema dertêne derve wekî xelîfeyêن dawîn ên Ebbasiyan rûyê xwe diposin (Ainsworth, 1842: 197; Kinneir, 1818: 456; Rich, 1836: 153-154; Tardus, 2022: 30). Tê dîtin ku xanedanên ku eslê xwe digihînin xelîfeyêن Ebbasiyan di civakê de qedr û qîmete xwe ya mezin hene. Helbet ev di heman demê de rêza xelkê bo dînê İslâmê jî nîşan dide. Ji bilî Behdînan hin xanedanên din jî hene ku wekî Ebbasî tên dîtin. Ji van du heb yên Hekarî û Kîlîsê ne ku di heman demê de nesla wan ji sê birayan hatiye. Ji wan pêştir mîrên Çemîşgezekê û Mirdasiyan jî wekî Ebbasî tên dîtin. Ji xeynî van mîran, xanedaneke din heye ku xwe digihîne xelîfeyan; lê vê carê ne xelîfeyêن Ebbasî lê xelîfeyêن Emewîyan, ew jî mîrên Silêmanî yên derdora Qulp, Batman û Meyâferqînê ne. Dîsa ji bilî van gelek nimûneyên dî hene di Şerefnameya Şerefxan de: Mîrên Cîzîrê ji nesla Xalid bin Welîdê qumandanê nasraw ê fethîn İslâmî, mîrên Zirkî ji seyîdekkî Şamê ku wekî Şêx Hesenê Ezraqî nasraw e, mîrên Sûwedî ji malbata Bermekiyan ku wezîrîn xelîfeyêن Ebbasiyan bûn, mîrên Sason û Bedlîsê ku pismamên hev in, ji qralênen seraya Kîsrayan. Helbet xanedanên ku ji binemala Kurdan tên jî hene wekî mîrên Şîrwanê, melîkîn Hesenkeyfê, mîrên Erdalanê, mîrên Mekrî û mîrên Bradostê (bnr. Bedlîsî, 2014).

Tê dîtin ku gelek xanedanên Kurdan ji alî eslî ve an wisa hatine qeydkirin an jî xwe wisa dibînin ku eslê wan digihe malbat an kesekî Ereb a ji alî dînî ve nasraw û payebilind e, an jî xanedaneke Fars ku bi payebilindiya xwe ya îdarî derketiye pêş. Ev mesele heta sedsala XIX. jî fenomeneneke belav bû. Gelek caran xwe hesibandina ji nesla Ereban ji bo netewetiya Kurdi nedibû pirsgirêk. Bo nimûne Mela Mehmûdê Bazîdî Kurdan Erebnijad û zimanê wan wekî Erebnijad nîşan dabû (Bazîdî, 2010: 47-48). Jê pêştir Şeyh Ubeydullahê Nehrî jî gava xwestibû serbilindî û wêrekiya Kurdan nîşan bide, eslê Kurdan gîhandibû Ereban. (Nehrî, 2022: 230) Diyar e ku ev fîkrîyat li gor wan deman, ciyê şanazî û serbilindiya netewî jî bû û ev tişt ne tenê ji bo Kurdan derbasdar bû. Bo nimûne, Abdurrezzak Begê Dunbulîyê dîroknûsê dewra Xanedana Kaçarêن Tirknijad, eslê Kaçaran gîhandibû Keykavûs û Cemşîd ku ew padîşahêن Îrana berî İslâmê ne (Başçı, 2019: 85).

Kesên ku li ser sedema nijadeke qedîm an dînî a Kurdan sekininîne, Metin Atmaca û İbrahim Bozkurt in. Li gorî Atmaca dema xanedanê Kurdan binemala xwe digihandin malbat û kesên navborî, dixwestin ku îktîdara xwe ya sîyasî meşrû bikin (Atmaca, 2015: 37). Li gor Bozkurt jî sê sedemên bingehîn ên vê meseleyê hebûn. Sedemên psîkolojîk, sosyolojîk û dînî. Ji alî psîkolojîk ve: Ew xanedanênu ku dihatin û eşîrên Kurdan bi rê ve dibirin, ne xanedanêji rêzê bûn û di desthilatdariyê de serdest bûn. Ew dihatin, wekî kesên ji eşîrên Kurdan tevdigeriyan û rêveberiyê dikirin. Eşîrê jî tecrubeya wan a sîyasî, cîvakî û ekonomîk îstîfade dikir. Ji alî sosyolojîk ve: Ew xanedanênu ku di rewşen aloyz de hawara xwe dibirin eşîrên Kurdan ji alî eşîrê ve dihatin qebûlkirin. Ew xanedan ji bo her malbatekî eşîrê di heman mesafayedê bûn. Ji vê alî ve wekî hevsengiya eşîrê dihatin dîtin û rê li ber şerîn navxweyi digirtin. Ji alî dînî ve: Di alema îslamê de hin malbat hebûn ku ji alî wesfîn xwe ve derketibûn pêş û ji alî herkesî ve rêza wan dihat girtin. Ji ber vê jî ji bo Kurdan ne ciyê şermê bu ku di bin hikmê wan de bijîn (Bozkurt, 2022: 512-514).

Sedem çi dibe bila bibe ev rastîyek e ku xanedanê Kurdan dema xwe digihandin malbateke payebilind xwe bi vê tiştê serbilind didîtin. Heman mesele bo Kurdêna reaya jî derbasdar bû û wan jî ji ber vê taybetiya xanedanê xwe rêza wan digirtin û ew bo xwe wekî rêvebir qebûl dikirin. Sedemên vê rewşê helbet hewcâyê hin lêkolînên din e. Lê ji bo ku sînorê xebata me hineke din berfirehtir nebe, em vê nîqaşê li vir bihêlin û derbasî Mîrektiya Baban bibin ku ji alî nesla xwe ve, ew xwe digihînîn jineke Ewropî û li ser vê jî xwedî hîkayetekî ne.

1. Mîrektiya Baban

Li gori Abdulqadir b. Rustem el-Babanî neql dike avakar û yekem şahê Sasaniyan Erdeşîrê Babakan (224-241) di salênu pêşîn ên hikimdarîya xwe de bi Kurdan re şer kiriye. Herçiqas artêşa Şah du sê caran paş ve kişiya be jî di dawîyê de şevekê êrîşê Kurdan kiriye û ew têk birine. Di serî de gelek kes hatine kuştin; lê di dawîyê de Erdeşîr fikra xwe guhertiye û Kurdan re aşitî ava kiriye. Piştî aşitîyê Kurdêna firar jî dîsa vegeriyane herema xwe. Bi emrê Erdeşîr li heremê bajarek ava kiriye. Ji ber ku di avakirina bajêr de gelek zorî derketiye Ardeşîr navê bajêr daniye Şehrêzor. Paşî yek ji Kurdan wek hikimdarê Şahrezorê tayîn kiriye û şeş mehan li Şahrezorê maye û vegeriyaye. Piştî wê her dem meqam û mertebeya Kurdêna Şahrezorê xwedî ciheke xwe ya taybet hebûye (el-Babanî, 2019: 127-130; Karnâme, 1966: 228-230). Ji vir tê fehmkirin ku bavûkalên Babanan û Kurdan herî kêm ji sedsala III. ve li ser axa xwe xwedî hikumet bûn ji ber ku Erdeşîrê Babakan di 226an de wekî şah bûye xwedî tac (Naskalî, 2024). Baban piştî agahiyêner derbarê avabûna Şehrêzorê dibêje navê hikimdarên Kurdan heta Safeviyan di pirtûkê dîrokê de nehatibûn qeydkirin lewra nediyar bûn. Yekem hikûmeta ku dihat zanîn di dewra Feqe Ehmed de ava bibû (el-Babanî, 2019: 130). Lê Herçiqas Babanî hikimdarên Babanan heta Safewîyan ji ber neqeydkirina wan wekî meseleyeke mechûl nîşan dabe jî hin agahiyêner din hene ku berî Safewîyan jî hebûna hikimdarên Baban nîşan didin. Avabûna Mîrektiya Baban wekî mîrektiyêner din ne zelal e, lê dîsa jî hin agahî

hene ku hebûna mîrektiyê ya berî avabûna Safewîyan piştrast dikan. Li gorî Said Abdulsamed Said Salih Tuderî ku wî berhema xwe 80 sal piştî Şerefnameyê nivîsiye, du caran behsa mîrektiya Babanan dike û di belgeyeke 1276an de destnişan dike ku navê Xalid Ahmedê Baban derbas dibe (Ghalib, 2011: 55).

Piştî Kanunî Sultan Suleyman (1520-1566) berê xwe dide Bexdayê û Bexdayê feth dike, navê Babanan û mîrektiya wan di belgeyan de zêdetir tê xuyan. Çawa Şerefjanê Bedlîsî dinivîse Mîrektiya Baban bi dîlxwazî tevlî Osmanî dibe. Wan çaxan mîrê Babanan Hecî Şêx e. Navbera Şah Tahmasbê Şahê Safewiyan (1524-1576) û Hecî Şêx ne baş e. Şah Tahmasb sê caran leşker şandine ser Baban lê Babanan ew têk birine. Dema Kanunî Sultan Suleyman derketiye sefera Bexdayê û Bexdayê standiye yanî di 1535an de, Hecî Şêx ji bo bikeve xizmeta Kanunî dertê rê lê di rê de tê kuştin. Kanunî vê dîbihîze û mîrektiya wîlayeta Babanan dide kurê wî Budaq. (Bedlîsî, 2014: 330).

Paytexta Babanan heta 1781î Qereçolan bû, lê piştî avabûna bajarê Silêmaniye ew der bû paytexta mîrektiyê (Behn, 2024). Erdêن Babanan li herema Şehrezorê bû û ew ji alî idarî ve girêdayî Eyaleta Bexdayê bûn. Diyar e ku ji alî Osmaniyan ve gelek qedrê wan dihate girtin ku Osmanî unvana begî û paşatîyê dabûn wan. Heta 1850an Babanan mîrektiya xwe bi rê ve bir, di 1850an de Ahmed Paşa ji text hate dûrxistin û dawî li Mîrektiya Baban hat (Atmaca, 2022: 71; Ghalib, 2011: 191). Piştî hilweisîna mîrektiyê hin mensûbên Baban hatin sîrgûnkirin û ji axén xwe hatin dûrxistin, lê wan elîtbûna xwe ji dest bernedan, pêşî bûn elîtên Osmanî paşî ji elîtên Cumhuriyetê (Ates, 2021: 93).

2. Hîkayeta Avabûna Mîrektiya Baban ango Hîkayeta Evîna Frenk Keyhan û Feqe Ehmed

Ev hîkayeta ku em di xebata xwe de li ser disekinin, çawa Metin Atmaca ji diyar dike ji aliyeķî xwe ve têra xwe balkêş e. Digel ku hema bibêje bê îstîsna hemû malbatêñ xanedanê Kurdan xwe bi njadeke pîroz a dînî an njadeke biesl a Rojhilatî ve girê didin; lê Baban njada xwe keseke jin û Ewropî ve girê didin (Atmaca, 2015: 37-38). Herçiqas ev hîkayet xwedî taybetiyêñ efsanewî be ji em ji seyahatnameya Rich fehm dikin ku Babanî baweriya xwe bi vê hîkayetê tînin û di heman demê de pê serbilind in ji (Rich, 1836: 299). Herweha ev hîkayet kakila rasteqîniyê dihewîne ku ji alî dîroknsan ve Feqe Ehmed û ahfadê wî wekî Babanzadeyênu duyem têne nasîn (Başçı, 2024: 9).

Ev hîkayet ji du alîyan ve dertê pêş. A yekem ew e ku behsa avabûna Mîrektiya Baban dike û a duyem ji ew e ku ev behsa evîna Frenk Keyhan û Feqe Ehmedê Baban dike. Di serencama hîkayetê de Frenk Keyhan dev ji Feqe Ehmed berdide û berê xwe dide welatê xwe ango Frengîstanê. Feqe Ehmed mirina xwe dide pêşîya xwe; lê ji evîna xwe venagere û ew ji pey Keyhan berê xwe dide Frengîstanê. Di rê de rastî gelek zehmetiyan tê; lê dawiyê de digihe yara xwe û ew her du bi hev re vedigerin. Diyar e ku Feqe Ehmed xwedî evîneke mezin e û tehemmûla wî ji bo fîraqê tune û ji bo wûslata yarê her tiştî dike.

Çawa Kurnaz jî destnîşan dike, aşiq ji bo yara xwe amade ye her tiştî bike û her tiştê xwe di rêya yara xwe de feda bike. Di vê rewşê de êdî melanet hakimê aşiq e û ew nafikire ka kê ê ci bibêje û hemû endîşeyên xwe li pey xwe dihêle (Kurnaz, 2010: 51). Feqe Ehmed jî aşiqekî wisa ye ku dema seh dike Keyhan çûye, qet li tiştekî nafikire, melanet lê hakim dibe. Ji vî alî ve dema bê fikirin serboriya Feqe Ehmed serboriya Şexê Sen'an bi bîr dixe. Çawa tê zanîn Şexê Sen'an pîreke xwedî kermal e, çar sed heb mirîdên wî hene û pêncî salan li Harem-î Şerîf şêxî kiriye. Şêx çend şevan li ser hev di xewna xwe de dibîne ku li welatê Rûmîyan pûtperestiyê dike. Piştî vê xewnê bi mirîdên xwe re berê xwe dide Romê. Li wir keçikeke Xristîyan dibine û aşiqê wê dibe. Di hin vegêranan de welat Ermenîstan û keçik jî keçike Ermenî ye, ku Şexê Sen'an nûra Xwedayî di rûyê wê de ditiye. (Filiz, 2024: 78) Keçik jê dixwaze ku li ber pûtê secde bike, mishefê bişewtîne, şerabê vexwe û dev ji misilmantiyê berde. Ev ji bo Şêx tiştên gelek zehmet in. Lê Şêx vexwarina şerabê qebûl dike. Gava şerabê vedixwe, işqa wî zêdetir dibe û ji bo keçika Xristîyan dev ji dînê xwe berdide û dibe Xristîyan. Paşî keçik jê dixwaze ku bibe şivanê berazan û ew salekî şivantîya berazan dike. Di maweya şivantîye de êdî mirîdên wî fehm dikan ku nikarin Şexê xwe ji vê rûyê vegerînin, bi izna Şêx vedigerin. Gava ew vedigerin, miridekî Şêx dibînin ku di wextê sefera Şêx de li Mekke'ye mabû. Ew mirîd ji wan pirs dike ka ci hal û ehwalê Şêx e. Mirîdên dî hal û ehwalê jê re dibêjin. Mirid bi wan re dixeyide û dibêje, we çawa şêxê xwe di wê halê de hiştiye. Ew tev bi hev re berê xwe didin Romê û li wir cil rojan dûayê ji Xwedê dikan ji bo Şêx. Paşî Peyxember tê xewna mirîd û mîzgîniya bixwevehatina Şêx dide wî. Mirîd diçin ba Şêx dibînin ku Şêx dîsa bûye Misilman. Paşî ew tev bi hev re vedigerin. Piştî vegerê keçik xewna dibîne û fehm dike ku divê li pey Şêx here. Berê xwe dide çol û çiyayan û li Şêx digere. Ev tişt wekî İlham bo Şêx tê şandin ku keçik dev ji Xristîaniyê berdaye û li Şêx digere. Şêx radije mirîdên xwe û lê digere. Wê li çolekî di halekî perîşan de dibînin. Keçik ji Şêx dixwaze ku İslâmê bo wî vebêje, Şêx Bo wê behsa İslâmê dike. Keçik bawerî bi Xwedê tîne û dibe Misilman. Lê hewqas li pey Şêx li çol û çiyayan geriyaye bêzar ketiye û piştî dîtina Şêx miriye. (Başçı & Başçı, 2023: 36-38; Attar, 2023: 156-186).

Xalên hevpar ên vê hîkayetê û hîkayeta Feqe Ehmed ev in:

1. Mijara her du hîkayetan jî işqa heqîqî ye. Herçiqas hîkayeta Şexê Sen'an ji alî sembolîzma tesevvûfi ve ji alîyên cûrbecûr hatibe şirove kirin jî, ew keçika ku Şêx aşiqê wê bûye, xwoşevîsteke wissa ye ku em di işqên dînyewî de rastî tê. Herweha işqên heqîqî ku di edebiyatên rojhilate de têr dîtin tradîsyoneke wissa ye ku li coxrafaya Babanan ciyeke xwe ya qewî heye. Ev tradîsyoneke wissa ye ku koka wê digihije vegêranîn Medî. Ev vegêranîn eşqî ku bi piranî bi xewnekî dest pê dikan, di nav Medan de bi hîkayeta Odatîs û Zeryadresê dest pê kiriye û paşî di nav civakên cînar de belav bûye. Bo nimûne, mînakeke vê çîrokê di Şahnameya Firdewsî (m. 1020) de bi hîkayeta Geştasپ û Ketayûnê xwe nîşan dide. Paşî em di Husro û Şîrîn a Gencewî de rastî heman temayê têr ku Xwoşewîst/Şîrîn di vê hîkayetê de jî Xristîyan e. (Urmevî, 2011: 12-16) Ji ber vê dikare bê gotin ku ehfadêن

Feqe Ehmed vê bûyera rasteqîn veguherandine hîkayeteke aşiq û maşûq ku ev tradîsyoneke qedîm a wê coxrafayê ye.

2. Her du aşiq jî kesên olî ne. Feqe Ehmed Feqe ye û Şêxê Sen'an jî şexeke mezin û kamil e.

3. Di her du hîkayetan de jî maşûk Xristîyan in.

4. Di her du hîkayetan de jî aşiq mecbûr mane ku hin zehmetiyan bikişînin. Şêxê Sen'an bo işqa xwe dîn guherandiye, şerap vexwariye û şivantiya berazan kiriye ku ev tev ji bo şêxekî rewşen ji mirinê xirabtir in. Feqe Ehmed jî dema Keyhan vege riwaye Frengîstanê bi tena serê xwe berê xwe daye Frengîstanê rê de ji mirinê filitiye; lê venegeriyaye û li welatekî xerîb ji dawetê Keyhan revandiye ku ev helwesteke gelek zehmet e.

Hîkayeta ku em ê berawirdkirina du varyantên wê bikin helbet xwedî hin varyantên din e jî. Bo nimûne çawa ku Yamûlkîzade Azîz di hejmara nehem a kovara Jînê de nivisiye Feqe Ehmed di şerekî de bi siwariyên xwe yên Darişmanayî re alîkariya hikûmeta Îranê kiriye û di şer de qehramaniya xwe nîşan daye, lewra hikimdarê Îranê ji bo wî taltîf bike jê re gotiye "Baba, Baba". Piştre jî leqeba malbatê wisa maye. Yamûlkîzade îddîa dike ku ev agahî di pirtûkeke li kitêbxaneyâ mezin a Camîya Süleymaniyyeyê nivisî ye. Disa çawa ku ew neqlî dike di nav Kurdan bi awayê devkî versiyoneke din ji belav e: Feqe Ehmed tevlî şerê Rûs û Îranê bûye û prensesekî Rûs wekî esîr girtiye. Gava ji bo zewacê çûye ba babê prenses ku jê îcaze bixwaze babê prensesê jê re gotiye "baba" (Yamûlkîzade, 1919: 4). Her çiqas neqla Yamûlkîzade varyanteke kamil nîşan nede jî hin kakilên sereke yên hîkayetê dihewîne. Tişa balkêş a neqla Yamûlkîzade ew e ku Feqe Ehmed ne di şerê Osmanî û Frengan de, di şerê Îran û Rûsan de şer dike û alîkariya Îranê dike. Di vir de keçika êsîr ku Feqe Ehmed dixwaze pê re bizewice jî Rûs e. Diyar dibe ku varyant kakilê hîkayetê diparêzin; lê teferruat diguherin. Tabî Yamûlkîzade van agahiyan wekî bersiveke Doktor Friç dîniyîse (Atmaca, 2015: 38). Ku Doktor Friç navê Babanan wek Bebe bi kar anîbû û ji ber vê hindê wan wekî Tirk nîşan dabû (Friç, 2014: 141). Pişti van agahiyan niha em ê kurteya her du varyantan bidin û paşî wan berawird bikin.

2.1. Varyanta Babanî

Feqe Ehmed li gundekî bi navê Darişmanayê dijîya. Mirovekî feqe, abîd, zahîd û feqîr bû. Lê camêr, egîd û şervanekî baş bû. Wê demê Osmanî bi Frengan re şer dikir. Feqe Ehmed jî ji bo cîhadê tevlî vê şerê bûbû û di şer de hemû maharetên xwe nîşan dabû. Pişti şer wekî ganîmet keçikeke pir delal bûbû para Feqe Ehmed. Keçik bi daxwaza xwe bûbû misilman û bi Feqe Ehmed re hatîbû Darişmanayê.

Feqe û Keçik li Darişmanayê dizewicin. Lê bi xwestina keçikê salek nêzîkê hev nabin. Rojekê xwesûya wê xeberên nexweş dibêjê keçikê. Keçik jî li ber xwe dikeve. Çekên xwe girê dide li hespa xwe siwar dibe û dibêjê xwesûya xwe: Bibêje

kurê xwe bila li pey min newe, ez vedigerim welatê xwe eger li pey min were ew ê bê kuştin. Xwesûya wê herçiqas lava jê bike jî ji bo neçûna wê, ew diçe. Gava êvarê Feqe tê malê, diya wî hal û meseleyê jê re dibêje. Feqe ji hiş diçe. Dema şîyar dibe hemâ demildest li hespê xwe siwar dibe û li pey keçikê diçe. Piştî deh rojan digihê û dibêjê: Ey bîwefa, tu çîma zîlmeke wîsa li min dikî, vegere, ez nikarim bê te bijîm, heta ez sax bim ez nikarim te ji bîr bikim. Keçik dibêjê: Ji min dûr bisekine, nexwe ez ê şûra xwe bi xwîna te av bidim. Lê Feqe venagere. Keçik êrîşê Feqe dike û Feqe ji hespê dikeve erdê û ji hiş diçe. Keçik hinek li ber serê wî digirî. Serê wî dêtîne ciyeke nerm kîsek zêr dêxe bin serê wî û bi rê dikeve. Feqe dotira rojê şîyar dibe vedigere gundê xwe gava baş dibe bi ser xwe ve tê dîsa berê xwe dide Frengîstanê, welatê keçikê. Piştî rêuwîtiyeke dirêj digihe welatê keçikê. Li wir li ba jinepîrekê dimîne. Rojek ji jinikê dipirse ka kesekî ku sala din bûbû êsîrê misilmanan kes vegeiyaye an na? Jinepîr dibêje: Berî sê çar mehan keçikek vegeiya vêga jî dixwazin wê bi pîsmamê wê re bîzewicînin, lê keçik bi vê ne razî ye û her daîm melûl û xemgîn e, lê sedema xemgîniya wê jî ne diyar e. Gava Feqe vê dibihîze. Ji jinepîr re ya dilê xwe dibêje. Dibêje, ez jê hez dikim û ez li pey wî heta vê derê hatime. Ü hemû meseleyê ji serî ve jê re vedibêje. Ü her dû bi hev re digirî. Jinik dibêje nîşaneyek bide min da ku ez nişanê wê bidim eger ez hezkirina te pê re bibînim ez ê pê re biaxivim eger na naaxivim. Li ba Feqe tenê gustilek heye ku aîdê keçikê ye. Gustîlê dide jîna pîr û jê dixwaze ku bide keçikê. Jîna pîr dotira rojê diçe ba keçikê. Dibêje tu dîsa xemgîn î, xér e sebeba xemgîniya te ew kurikê misilman e, qey? Eger ez jê xeberek bidim te tu yê çi bidî min? Keçik dibêje: Qesem bi navê Mesîh, eger tu tiştek zanibî û ji min re bibêjî tu çî bixwazî ez ê bidime te. Jîna pîr, hal û meselê ji keçik re vedibêje. Keçik gava seh dike gelek digirî. Keçik kîsek zêr dide jinikê û dibêje: Ez poşman im, bila min efû bike lewra ku min bo wî bêîtaatî kir û li hember Xwedê jî nankorî. Vê kîsê here bide wî, bêjê bila ji bo min hespeke rewan bistîne. Jinik tê malê û mizginî dide Feqe. Gelek kêfa Feqe tê, dotira rojê hespeke rewan dikire, amadekariya xwe dike û li benda xebera xêrê disekine.

Pîsmamê keçikê tê mala wan û dîsa wê wîsa xemgîn dibîne xwe aciz dike, dibêje: Madem te hewqas ji wî misilmanî hez dikir, tu nevegiriyanabûnayî. Xwe bide hev, nexwe ê xwîna te şûra min av bide. Keçik gelek diqehire; lê dengê xwe dernaxe. Du sê roj şûnde hinek zêran ji bavê xwe distîne. Ji jinepîr re dibêje ji xorto re bêje, bila sibê êvarê derê derveyê bajêr li filan ciyî li benda min bisekine. Feqe evarê dertê û li benda wî disekine, keçik bi halekî rextgirêdayî tê ba wan. Feqe ji keyfan digirî. Her du, sê sed zêr didine jinepîr û direvin. Dotira rojê gava li qûntara ciyayekî bêhna xwe vedidin, dibinin ku bi pey wan ketine û tênen wan bikujin. Keçik hêvî û zariyan ji Feqe dike dibêje tu newe ez ê herim meseleyê hal bikim. Keçik dertê pêşîya pîsmamê xwe û sed leşkêrên wî. Êrîşa pêşîn li pîsmamê xwe dike bi şûrê wî dike du şeq û gelek leşkeran dikûje yên din direvin, keçik vedigere ba Feqe. Ew dîsa bi rê dikevin û vedigerine Darişmanayê. Gava diya Feqe wan dibîne pir kêfa wî tê. Li gund ji bo hatina wan ziyafet tê dayîn. Piştî vegevê nêzîkê salekî jîna Feqe zarokek tîne dinyayê, navê wî dêtînine Sileyman. Paşî kurekî wan ê din çêdîbe navê wî jî dêtînin Abdullah.

Sileyman gava mezin dibe her rêberiyê li hevalên xwe dike. Gava dibe hejdeh salî babê wî dimire, du salên din jî diya wî dimire. Sileyman dikeve şûna babê xwe û piştre dibe mîrê gund û heremê. Pê re pê re sînorêne xwe fireh dike û dibe kesekî nasraw.

Wan çaxan dîsa Osmanî û Frenk di şer de ne. Sileyman jî wekî babê xwe diçe cîhadê. Çil siwarî jî pê re ne. Di şer de bi xêra Sileyman Beg Osmanî bi ser dikeve. Gava serbazê Osmanî vê dibihîze gazî Sileyman dike, dibêje ka tu kî yî, ji ku yî? Sileyman Beg dibêje: “Navê min Silêyman e, ez xelkê Kurdistanê me.” Serbaz piştî vê bi Tirkî dibêje “Babam Süleyman, Babam Süleyman!” paşî êdî ew wek Sileyman Baba tê naşn û ji zurriyeta wî re jî dibêjin “Baban” Serbaz behsa qehremanî û dîlêriya wî ji Padışah re dike. Padışah jî bi fermanekî herema wîango herema Baban wekî iqta dide wî. Sileyman Beg jî vedigere axên xwe. Sileyman Beg ji 1572an heta 1589an dibe mîrê Baban sinorêne xwe heta Bilbas û herema Mukriyan fireh dike. Berî mirina xwe kurê xwe Ferhad Beg wek xelefê xwe dîyar dike. Dema ew digihîje rehma Xwedê Ferhad Beg dikeve şûna wî (el-Babanî, 2019: 130-136).

2.2. Varyanta Cladius James Rich

Claudius James Rich yek ji wan kesan e ku di sedsala XIX. de hin cihêne Kurdistanê geriyaye, çavdêrî û têbiniyêne xwe di seyahatnameya xwe de nivîsandiye. Seyahatnameya Rich piştî Mirina Rich ji alî jina wî ve hatiye amadekirin û weşandin. Teybetiyeka Rich a wî ji seyyahêne din vediqetîne ew e ku ew ne tenê ji Kurdistanê derbas bûye ew di heman demê de wextekî dirêj li Kurdistanê maye. Ji ber vê mana wî ya dirêj wî karîbûye gelek kitekitan bi dest bixe û çavdêriyên kûr bike. Ew bi taybetî li Silêmanî wekî mîvanê Mahmûd Paşayê Baban maye û demekî jî çûye Sinê. Ji ber ku ew nûnerê East Indian Company ya şîrketa mezin a Britanyayê a Bexdayê bû. Wekî dîplomatikî digeriya û wisa jî dihat pêşwazîkirin. Ji ber vê rewşê jî wî hem paytext û seraya Mîrektiya Baban him jî li peytaxt û seraya Mîrektiya Erdelan dîtibû. Axirî wî di seyahatnameya xwe de gelek keresteyêne kîrhatî ji bo xebatên Kurdolojiyê hiştine. Yek ji van keresteyan jî hîkayeta avabûna mirektiya Baban e ku wî jî ji gundiyeke Darîşmanayê bihistiye û bêyî ku lê zede bike an jê kêm ke neqlî kiriye. Li gorî neqla Rich ev hîkayet dikare wisa bê kurtekirin: Li Darîşmanayê du bira dijîyan, navê yekî Feqe Ehmed, navê yê din jî Xidir bû. Van her du birayan ji destê Bilbasiyan gelek zilm dîtibû. Feqe Ehmed ji vê rewşê aciz bû ji gundê xwe derket çû Stenbolê û go: Heta ez tola xwe hilnedim ez venagerim. Dema ew çû Stenbolê Osmanî bi Frengan re di şer de bû, Feqe Ehmed jî tevlî vê şerê bû. Wan çaxan şer bi piranî bi awayekî yekoyeko dihate kirin. Li alîyê Frengan kesek hebû ku pênc rojan palewanêne Osmanî têk biribû. Feqe Ehmed daxwaz kir ku pê re yekoyeko şer bike. Piştî Padışah lê guhdar kir hin bû ka ji ku ye, ci kes e, daxwaza wî qebûl kir. Feqe Ehmed derket meydanê û şovalyayê Freng têk bir. Feqe gava ji hespa xwe pêya bû ku serê şovalyayê jê ke, dît ku ew şovalye keçik e. Keçikê hevî û zariyan pê kir ku wê bibexşe û pê re bizewice. Feqe Ehmed qebûl kir. Padışah ji bo vê qehremaniye wî xwest wî xelat bike. Feqe Ehmed ji Padışah xwest ku wî wek Mîr tayîn bike û erdêne Darîşmanayê bo wî bibexşe. Paşî ew û jina xwe

vegeriyan Darişmanayê. Du zarên wan çêbûn. Navê wan Sileyman û Bûdaq Keyhan danîn.

Feqe Ehmed bi Bilbasiyan re gelek caran şer kir û gelek ji wan kuşt. Gava rojek Feqe ne li mal bû Bilbasiyan êrşê mala wî kir. Wê çaxê Keyhan li mal bû. Keyhan li hemberî 400-500 merî şer kir û gelek ji wan kuşt. Paşî xelkên Gund civand û ji wan re go: Feqe Ehmed canê min bexşandibû. Min jî iro deynê canê xwe da, yegane daxwaza min jî ev bû. Tiştê ku we dîtine, bibêjine Feqe Ehmed û bibêjinê ez ê niha biçime ciyeke wisa ku ew careke din min nebîne. Ji bo ku ew li pey min newe ez wî îqaz dikim. Eger ew li pey min were ez ê zerarê bidimê. Paşî li hespa xwe siwar bû û çû. Gava Feqe Ehmed hat, hal û meselê jê re gotin. Feqe Ehmed li pey wê çû. Li nêzîkê Pişderê gihişte Keyhan. Hêvî û zariyan kir ku pê re vegere. Keyhan qebûl nekir, go: Ev ne mimkun e. Tu misilmanî ez jî Frenk. Ez ê vegeirim welatê bavûkalên xwe. Xwe nêzîkê min neke, nexwe ez ê zerarê bidim te. Lê Feqe hê jî hêvî û zarîyan dikir. Keyhan bi şûra xwe ew birîndar kir û çû. Lê gava çû fikirî ku Feqe Ehmed him bavê zarên wê ne him jî canê wê bexşandiye. Ji ber vê vegeriya hate ba Feqe Ehmed. Feqe Ehmed nemiribû, hê jî nefes distand. Keyhan birîna Feqe derman kir, ciyê wî xweş kir. Heta hinek bigihiştana Feqe ew derman ê wî zindî bigirta. Keyhan gava ev fehm kir dîsa bi riya xwe ve çû. Feqe Ehmed gava hate ser hemdê xwe, li pey Keyhan çû û gihişte Frengîstanê. Gihişte bajarekî ku dengê dawetê jê tê û amadekariya zewacê lê tê kirin.

Feqe Ehmed fikirî ku xwe li ber bayê felekê serbestbihêle. Hespê wî li ku bisekiniya ê li wir bimaya. Hespê wî li ber mala jinepîrekê sekinî. Feqe Ehmed çû mala jinepîrê. Jê pirsa vê şahiyê kir. Jinepîrê gotê: Berî salan keça qral tevlîşer bûbû ku misilmanan re şer bike. Piştî vê şerê kesî qet xeberek jê nestandibû. Ev dawet jî daweta wê û pismamê wê bû. Feqe Ehmed jê lava kir ku ew riya tevlîbûna dawetê bo wî peyda bike. Jinepîrê go: Ancax tu bikevî dilqê jinan em dikarin te bibine dawetê. Feqe li dawetê çû nêzîkê Keyhan gotê: Hûn di nav misilmanan de girtî bûn. Keyhan bî xemgînî û bi Kurdî gotê: Ax, Feqe Ehmed tu li vir ï. Paşî Feqe Ehmed derkete meydanê, zavê kuşt û bûkê revand. Ev bi hev re çûne Stenbolê. Padîşah li wir gelek diyariyan da wan. Feqe û Keyhan bi hev re vegeriyane Pişderê. Feqe berî mirina xwe erdên xwe firehtir kir û xîst bin hikimraniya xwe. Piştî wî kure wî Baba Süleyman bû Mîrê nû (Rich, 1836: 292-297).

Rich dibêje min heman hîkayet ji Mehmûd Paşa jî guhdarî kiriye. Disa jinan bi heman şeklî hîkayetê ji Xanîma Rich re vegotine. Heman demê de kesekî nêzîkê sedsalî bi navê Ehmed heye ku behsa vê hîkayetê ji Rich re kiriye; lêbele ji ber emrê xwe agahiyan tevlîhev kiriye (Rich, 1836: 299).

Tablo 1. Cudahiyê di navbera varyanta Babanî û varyanta Rich de

Bûyer	Varyanta Babanî	Varyanta Rich
Terkkirina Darişmanayê	Feqe Ehmed ji bo tevlîbûna cîhadê Darişmanayê terk dike.	Feqe Ehmed ji ber zilma Bilbasiyan Darişmanayê terk dike.
Tevlîbûna şerê Osmanî-Frengan	Feqe Ehmed di şer de qehremanî û wêrekiyên mezin nîşan dide. Keyhan dawiya şer de wekî xenîmet dibe para wî.	Feqe Ehmed di şerê yekoyeko de şovalyeyekî têk dibe. Berî ku şovalyayê bikuje Şovalye keçik dertê. Keyhan jê bexşînê dixwaze.
Reva Keyhan ji Darişmanayê ber bi Frengîstanê ve	Li gorî Babanî xwesûya Keyhan tiştên nexweş jê re dîbêje. Keyhan aciz dibe li ber xwe dikeve û vedigere Frengîstanê.	Bilbasî êrîşê Darişmanayê dikin. Keyhan bi tena serê xwe Darişmanayê diparêze û xwe wek deynê xwe dayî dihesibîne. Lewra vedigere Frengîstanê.
Revandina Keyhan ji Frengîstanê	Keyhan bi alîkariya jinepîrekê xeber dişîne bo Feqe Ehmed. Ew qewlê xwe datînin, cih û dem diyar dîkin û direvin.	Feqe Ehmed li dawetê zavê ango pismamê Keyhan dikuje û Keyhan direvîne.
Piştî Revandinê	Pismamê Keyhan bi leşkerên xwe ve tê pêşîya wan. Keyhan, pismamê xwe û hin leşkeran dikuje leşkerên din jî ditîrsin û vedigerin. Paşî derbaşî Darişmanayê dibin.	Piştî revandinê têne Stenbolê. Li wir Padışah xelat didin wan. Ew ji Stenbolê dicine Darişmanayê.
Çêbûna du zarokêwan	Li gorî Babanî piştî ku Feqe Ehmed Keyhan ji Frengîstanê direvîne ew hê nû wekî jin û mérân tevdigerin û du zarêwan çê dibin. Navê wan dêtînin Sileyman û Abdullah.	Li gorî Rich berî ku Keyhan bireve Frengîstanê du zarokêwan çê dibin. Navê zarokêwan xwe dêtînin Sileyman û Bûdak Keyhan.
Dayîna erdêñ Darişmanayê û tayînkirina mîr/Avakarê Mîrektiyê	Sileyman Babayê kurê Feqe Ehmed di riya babê xwe de diçe. Ew jî wekî babê xwe tevlî cîhadê dibe. Ji ber ku di şer de qehremaniyê mezin nîşan dide erdêñ Darişmanayê ji alî padışah ve tê dayîn bo Baba Sileyman. Ango avakarê Mîrektiyê Sileyman Baba ye.	Li gorî Rich jî erdêñ Darişmanayê ji alî padışah ve ji ber qehremaniyê Feqe Ehmed bo Feqe Ehmed tê dayîn. Ango avakarê Mîrektiyê Feqe Ehmed e.

Encam

Tê dîtin ku hîkayeta Frenk Keyhan û Feqe Ehmedê Baban herçiqas di texeyyûla gel de wekî efsaneyeyeke avabûna Mîrektiya Baban temsîl bike jî ew di heman demê de hîkayeteke işqî û ji tradîsyona vegêrana hîkayetêne işqî ya edebiyatê rojhîlatê ye. Bi taybetî di navbera wê û hîkayeta Şexê Sen'an de ji alî honak û temayê ve xalêñ hevpar hene. Me di xebata xwe de du varyantêne vê

hîkayetê berawirdkirin û ev encam bi dest xistin. Xalên sereke û bûyerên her du varyantan hevpar bin jî ji alî qewîmîna rêza bûyeran û teşwîqa tevgerên kesayetan ve her du varyant ji hev vediqetin. Herweha varyanta Babanî hineke din bûyerên rasteqîn ve hatiye honandin û varyanta Rich hineke din xwedî honakeke şovalyeyî ye. Bo nimûne, hê di serî de varyanta Rich de dîyar e ku varyenteke efsanewî pêşdetir e. Feqe Ehmed ji ber zilma Bilbasiyan welatê xwe terk dike û sonda tolê dixwe. Lê di varyanta Babanî de terkkirina Darişmanayê bi armanca tevlîbûna cîhadê ye ku dikare bê gotin ev sedem sedemeke êdî nêzîkê mimkûniyêye. Her du varyant ji hêla taybetiyên Keyhan ve jî ji hev cuda dibin. Li gorî varyanta Babanî, Keyhan piştî vegera ji Frengîstanê êdî kesayetek bijarte tê nîşandan. Berî Feqe Ehmed Keyhan ji Frengîstanê birevîne, Keyhan bêyî dilê xwe li ba Feqe Ehmed e. Ew wekî xenîmet bûye para Feqe; lê nexwestiye pê re têkiliyeke kamil a jinûmêran dêyne û ji ber sebebeke biçük jî reviyaye. Lê piştî vegera Frengîstanê, wê pismamê xwe ji bo Feqe kuştiye û bûye xwediyê du zarokan. Bereksê vê rewşê di varyanta Rich de Keyhan berî reva ji Frengîstanê êdî kesayetek efsanewî ye. Wê tena serê xwe li hemberî 400-500 mîrên Bilbasîşer kiriye û wan sekinandiye. Lê piştîku Feqe tê Frengîstanê êdî Keyhan dibe kesayetek edetî û efsanewîbûna Feqe dest pê dike.

Çavkanî

- Ainsworth, W. F. (1842). *Travels and Researches in Asia Minor, Mesopotamia, Chaldea and Armenia* (Cilt 2). London: John Parker.
- Ates, S. (2021). The End of Kurdish Autonomy The Destruction of the Kurdish Emirates in the Ottoman Empire. H. Bozarslan & C. Gunes & V. Yadırkı (Ed.) *The Cambridge History of the Kurds*. İçinde (73-103). Cambridge: Cambridge University Press
- Atmaca, M. (2015). Frenk Keygan'ın Çocukları Babanlar. *Kürt Tarihi*, (20), 37-41.
- Atmaca, Metin. (2022). Bâbân. *The Encyclopaedia Of Islam Three*, s.70-72, Leiden: Brill.
- Attar, F. (2023). *Mantiku't Tayr*. (Yay. Haz. V. Başçı & N. Başçı). İstanbul: Turkuvaz Kitap.
- Başçı, V. (2019). Dunbuli Beyliği Tarihi ve Tarihi Kronikleri [XII-XVIII. YY.]. Kadim Akademi, 3(2), 63-114.
- Başçı, V. (2024). Sûfî-Siyaset İlişkisi Bağlamında Mevlâna Halid Şîirlerinde Baban (E)Mîrleri. *Bingöl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, (23), 1-28.
- Başçı, V. & Başçı N. (2023). Giriş. İçinde Feridüddin Attar. *Mantiku't Tayr*, (Yay. Haz. V. Başçı & N. Başçı). 21-48. İstanbul: Turkuvaz Kitap.
- Bazîdî, M. M. (2010). *Adat û Rusûmetnameyê Ekradiye*. (Wer. Z. Avcı) İstanbul: Lîs.
- Bedlîsî, Ş. (2014). *Şerefname Diroka Kurdistanê*. (Wer. Z. Avcı) İstanbul: Azad.
- Behn, W. Bâbân. *Encyclopædia Iranica*. Erişim 12 Haziran 2024. <https://iranicaonline.org/articles/baban-2>
- Bozkurt, İ. (2022). *Aşiretler Tarihi*. İstanbul: Nûbihar.
- el-Babanî, A. (2019). *Siyerû'l Ekrad Baban ve Erdelan Kürtleri Tarihi [1523-1870]*. (V. Başçı, & E. Ceylan, Dü) İstanbul: Peywend.
- Friç, D. (2014). *Kürdler Tarihi ve İctimai Tedkikat*. İstanbul: Tarih Vakfı Yurt Yayınları.

- Ghalib, S. A. (2011). *The Emergence of Kurdishism with Special Reference to the Three Kurdish Emirates within the Ottoman Empire, 1800-1850*. Ph.D Dissertation. Exeter: University of Exeter, Arabic and Islamic Studies.
- Filiz, M. Ş. (2024). Rengvedana Evînê di Romana Kurdî de. *International of Kurdish Studies*, 10(1), 75-97
- Karname-i Erdeşir-i Papekan. (1386/1966) (Yay. Haz. Behram-ı Ferehveşî). Tahran: İntişarat-ı Danışgah-ı Tehran.
- Kinneir, J. M. (1818). *Journey through Asia Minor, Armenia, and Koordistan in the Years 1813-1814 with Remarks on the Marches of Alexander and Retreat of the Ten Thousand*. London: John Murray.
- Kurnaz, C. (2010). Vuslat Yolculuğu. *Turkish Studies*, 5(3), 447-461.
- Naskali, E. Sâsânîler. *Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi*. Erişim 4 Haziran 2024. <https://islamansiklopedisi.org.tr/sasaniler>
- Nehrî, Ş. U. (2022). *Tuhfetü'l Ebâb*. (Yay. Haz. V. Başçı) İstanbul: Avesta.
- Rich, C. J. (1836). *Narrative of a Residence in Koordistan, and on the Site of Ancient Nineveh, with Journal of a Voyage Down to Tigris to Bagdad and Account of a Visit to Shirauz and Persepolis* (Cilt 1). London: James Duncan, Paternoster Row.
- Tarduş, İ. (2022). *İngiliz Seyyahların Gözüyle Ondokuzuncu Yüzyılda Kürtler*. İstanbul: Avesta.
- Urmevî, A. M. (2001). *Mesnevî-i Gul u Nevrûz*. Stocholm: Upsalla University.
- Yamûlkîzade, A. (1919, Ocak 13). Kûrd Tarihinden Baban Hanedanı. *Jîn* (9), s. 3-7.
- Yazıcı, T. (2022). *Mîrnameya Hekariyan*. (M. X. Sadînî, Çev.) Wan: Peywend.

Pevgîhiştin û Vejetîn di Romana Ciwanmerd Kulekî
Defterêن Perrîdankan de Xwendineke di Çarçoveya
Melankolî û Şînê de

Ümran Altinkılıç¹

Ciwanmerd Kulek'in Defterêن Perrîdankan Başlıklı Romanında
Vuslat ve Firak

Melankoli ve Yas Bağlamında Bir Okuma

Öz

Ciwanmerd Kulek'in *Defterêن Perrîdankan* [Kelebek Defterleri] başlıklı romanı, iki vuslat ile iki firaktan oluşan ve sonunda da başkışının intihar ettiği bir aşk hikayesidir. Başkışının psikolojik durumu romanın merkezinde bulunduğuundan roman psikanalitik bir okumaya elverişlidir. Bu çalışmada, romanda gerçekleşen vuslat ve firak olaylarını melankoli ve yas kavramları bağlamında okuyuyoruz. Bu kavramları temelde Freudyen anlamda kullanıp bu alandaki genel psikanalitik literatürden yararlanmaktadır. Romanın Filakes isimli erkek başkışı, Luz isimli kadına aşık olduğu halde başka bir kadınla gizli bir ilişki yaşar ve bu kadının ölümünden sonra Luz'ü yanında bırakıp başka bir şehrde yerleşir ve onsuz dokuz yıl geçerir. Fakat Filakes bu süreçte Luz'ün yasını tutmaz ve onu psiseseinde melankolik bir şekilde korur dolayısıyla ondan mutlak bir şekilde ayrılmış olmaz. Dokuz yıl aradan sonra Filakes'in yaşadığı şehirde tesadüfen karşılaşan eski aşıklar tekrar ilişkiye başlarlar. Ancak bir süre sonra kendisi de Luz'e aşık olan eski bir ortak arkadaşları Filakes'in geçmişteki ihanetini Luz'e bildirir. Bunun üzerine Filakes'in Luz'deki imgesi değişir ve onun için eskiden olduğu kişi olmaktan çıkar. Bu durumun ağırlığına dayanamayan Filakes, Luz'ün anısında iyi bir şekilde yaşamak umuduyla intihar eder ve bu defa Luz'den mutlak bir şekilde ayrılmış olur. İntiharından önce yazdığı roman, Freudyen anlamda bir yas uğraşıdır; ama burada kendi yasını, Luz için ölen Filakes'in yas uğraşını gerçekleştirir.

Anahtar Kelimeler: Ciwanmerd Kulek, Defterêن Perrîdankan, Vuslat, Firak, Melankoli, Yas.

Reunion and Separation in Ciwanmerd Kulek's Novel *Defterên Perrîdankan*

A Reading in the Context of Melancholia and Mourning

Abstract

Ciwanmerd Kulek's novel *Defterên Perrîdankan* [Butterfly Notebooks] is a love story consisting of two reunions and two separations, and in the end, the protagonist commits suicide. Since the protagonist's psychological state is at the center of the novel, the novel lends itself to a psychoanalytic reading. In this study, we read the reunion and separation events that occur in the novel in the context of melancholia and mourning. We use these concepts in their Freudian sense and benefit from the general psychoanalytic literature in this field. The novel's male protagonist, Filankes, is in love with Luz but has a secret affair with another woman, after the death of this woman, he leaves Luz behind and moves to another city and spends nine years without her. However, Filankes does not mourn Luz during this time and keeps her in his psyche in a melancholic way, so he is not absolutely separated from her. After nine years, the former lovers meet by chance in the city where Filankes lives and begin a relationship again. However, after a while, an old mutual friend who is also in love with Luz, informs her about Filankes' past betrayal. Thereupon, Filankes' image in Luz changes and he ceases to be the person he used to be for her. Unable to bear the weight of this situation, Filankes commits suicide in the hope of living well in Luz's memory, and this time he has left her for good. The novel he writes before his suicide is a grief work in Freudian sense, but here he performs his own grief work, the mourning of Filankes who died for Luz.

Keywords: Ciwanmerd Kulek, *Defterên Perrîdankan*, Reunion, Separation, Melancholia, Mourning.

Kurte

Romana Ciwanmerd Kulek ya bi navê *Defterên Perrîdankan* çîrokeke evînê ye ku du caran pevgîhîstîn û veqetîn tê de çêdibin û di dawiyê de serkarakterê wê xwe dikuje. Ji ber ku rewşa derûnî ya serkarakterê romanê di navendê de ye, xwendineke psîkanalîtîk ji bo famkirina van diyardeyan guncaw e. Em di vê xebatê de bûyerên pevgîhîstîn û veqetînê yên di romanê de di çarçoveya çemkêن melankolî û şînê de dinirxînin. Em van çemkan bi giranî bi maneya Freudyen bi kar tînin û bi giştî ji literatura psîkanalîtîk a di vî warî de sûd werdigirin. Serkarakterê romanê yê bi navê Filankes tevî ku evîndarî Luzê ye, têkiliya wî bi keçeve din re çêdibe û piştî mirina wê, Luzê li dû xwe dihêle û neh salan bêyî wê dijî. Lê ew şîna Luzê nagire û bi awayekî melankolîkane wê di psîşeya xwe de diparêze, wate bi maneya mûtley jê venaqete. Piştî neh salan her du evîndar bi tesadûfi hevdu dibînin û dîsa têkiliya wan dest pê dike. Lê piştî demekê hevalekî wan ê hevpar Luzê bi xayıntiya zemanekî ya Filankesi dihisîne. Ji ber vê yekê îmaja Filankesi ya li cem Luzê xera dibe. Filankes bi giraniya vê yekê nikare, lewma bi hêviya ku di bîra wê de bi xweşî bimîne xwe dikuje. Berî ku

ew xwe bikuje romana xwe temam dike ku ev karekî şîngirtinê ye; lê li vir şîn, şîna wî bi xwe ye.

Peyvîn Sereke: Ciwanmerd Kulek, Defterêن Perrîdankan, Pevgihîştin, Vejetîn, Melankolî, Şîn.

Extended Abstract

In his essay “Mourning and Melancholia”, Freud discusses mourning and melancholia together. According to him, both mourning and melancholia are reactions to a loss. This loss may be the death or separation of a loved one or the loss of abstract concepts such as country, freedom and ideal. In both mourning and melancholia, there are phenomena such as deep sadness, loss of interest in the outside world, loss of the ability to love and inhibition of all activities. However, the main difference between melancholia and mourning in terms of affect is that in melancholia there is a loss of self-esteem; as a result, the subject sees himself as worthless and useless, blames himself, and even expects to be punished for this. Although Freud associates both grief and melancholia with loss, he recognizes that the nature of loss in melancholia is more complex. In grief, the loss is usually present at the level of consciousness because it is the result of an actual death. In melancholia, in some cases, the exact nature of the loss is not known. In some cases, the subject even knows who they have lost, but not what they have lost in them. This situation suggests that loss in melancholia may be related to something unconscious. In addition, the ambivalence factor is greater in melancholia and in some cases this is due to something structural. As a result of all this, the triggers for melancholia are broader than in grief. The processes and ways of coping with loss are also different in grief and melancholia. According to Freud, in mourning, every memory and expectation that connects the libido to the object is magnified and overloaded; and the detachment of the libido from that aspect is realized. When the work of mourning, the process of mourning, is completed, the ego becomes free and uninhibited again. In melancholia the opposite is the case. In melancholia there is an identification with the lost object and the object is projected onto the ego. It is as if the object continues to exist in the subject's psyche even though it is lost in reality. Freud states that the melancholic subject's self-blame is actually against the lost object, but is transferred from it to the ego as a result of identification. As can be seen, whereas in mourning there is a detachment from the loss, in melancholia the grief work is rejected and an attachment to the loss takes place. Freud's interpretation of these phenomena makes them useful concepts for understanding and interpreting the relationships of love, reunion and separation in literature. This study provides a psychoanalytic reading of Ciwanmerd Kulek's novel Defterêن Perrîdankan within the framework of the concepts of mourning and melancholia. Filanxes, the male protagonist of the novel, cheats on his female protagonist Luz, his lover, with another woman, and after this woman dies, he feels guilty and moves to another city, leaving behind his university, his city and his lover. Nine years later, the former lovers meet in the city where Filanxes lives and start a relationship again. Although

Filankes was separated from Luz for nine years, he did not mourn her. He protected her in his psyche with the mechanism of melancholy. Therefore, when they are reunited, Filankes realizes that although he was separated for nine years, he did not remember Luz at the level of consciousness, but "kept her in a secret corner of his soul." As a writer, Filankes realized that he reflected Luz's characteristics in various female characters and used some aspects of his relationship with her in his stories. This shows his melancholic identification with Luz. Although they were separated for nine years as a result of this identification, for Filankes this separation was not an absolute separation. When Luz learns that Filankes had cheated on her in the past, her image of him changes and she accuses him of being a liar and a scoundrel. Filankes cannot bear this change, even though he had previously been separated from Luz for nine years. It is understood here that Luz has taken on the role of the great Other for him. Therefore, the death of the image of Filankes in Luz leads Filankes to a real death and he commits suicide. Before committing suicide, he completes his novel about his relationships with Luz and other women. We have already noted that Filankes does not mourn for Luz, and since a novel about loss is an act of mourning, we can say that Filankes finally begins the grief work with this novel. But this is not the grief work of Luz, for if he could mourn Luz, he would not have committed suicide. At the center of grief work is the lost object, and this object is represented in all its aspects. In Filankes' novel, although Luz is represented, so are other relationships, other aspects of her life, other parts of her life. Therefore, the subject of this novel, the object of this grief work, is Filankes himself. According to our interpretation, with this novel Filankes makes the grief work of Filankes who dies for Luz and then commits suicide.

Destpêk

Di serdemêن cuda de melankolî bi awayên cuda hatiye şirovekirin. Antîkan ew bi zêdebûna zehferana reş di laşê mirov de, ramana xirîstiyaniyê a Serdema Navîn ew bi gunehkarî û lanetîbûnê, hin nixandinê di çarçoveya hunerê de ew wek nexweşîyeke hunermendan yan rewşederûneke pêwîst ji bo afirandinê û hwd rave kiriye. Freud di nivîsara xwe “Yas ve Melankoli”yê [Şîn û Melankolî] de wê û şînê dide ber hev û wê di vê çarçoveyê de dinirxîne. Bi dîtina wî melankolî ji wek şînê di encama windahiyekê de derdikeye holê yan wek wê karvedaneke li hember windahiyekê ye. Ev windahî ne tenê encama mirina mirovekî ye, lê ji vejetînekê (Freud bi xwe mînaka dergîstiyê terikandî dide) û ji windakirina welatekî digihîjin heta têkçûna îdalekê. Ev windahî li cem hin mirovan dibe sebeba şînê, lê li cem hinekêن din dibe sebeba melankoliyê. Di her du rewşan de ji biker dikeye halekî êşbar, têkiliya wî bi cîhana derekî re kêm dibe û kapasîteya wî ya hezkirinê asteng dibe.

Freud hem şînê hem melankoliyê têkildarî windahiyê dike, lê qebûl dike ku di melankoliyê de mahiyeta windahiyê komplekstir e. Ji ber ku di melankoliyê de carinan windahî nayê zanîn. Hetta carinan biker bizane bê kî winda kiriye ji, dibe ku nizanibe bê li cem wê ci winda kiriye ku bûye sebeba melankoliya wî. Ev nîşan dide ku dibe ku windahî di melankoliyê de derhişî be. Herwiha di melankoliyê de têkiliya bi objeyê re ji şînê aloztir e, ji ber ku di wê de ambîvalensiyeke binyadî ji di dewrê de ye. Lewma tiştên ku dikarin melankoliyê han bidin gelek in, lê yên şînê bi piranî têkildarî mirineke rasteqîne ne (Freud, 2013 [1917], r. 246-247).

Di şîn û melankoliyê de pêvajoyên serederîkirina bi windahiyê re ji cuda ne. Bi dîtina Freudî di karê şîngirtinê de bîranîn û hêviyên ku lîbîdoyê bi objeyê ve girê didin, yek bi yek têن mezinkirin û dubarekirin û her ku objeya winda bi vî awayî tê nimandin wek encameke prensîba rasteqîniyê, ego bi wê rastiyê re rûbirû dibe ku êdî obje tuneye. Di dawiya vê pêvajoyê de ego dîsa azad û neastengkirî dimîne. Lî di melankoliyê de ego bi objeya winda re hevyekbûnekê çêdikeye, yanî objeya winda bi awayekî di egoyê de tê hilanîn (Freud, 2013 [1917], r. 245, 249). Ku mirov bi zimanekî sadetir bibêje, kesê ku şîna windahiyê digire, di dawiya karê şînê de dikare xwe jê vejetîne; lê kesê ku li hember windahiyê melankoliyê bi pêş dixe, li cîhana derekî ji objeya winda cuda be ji, di psîseya xwe de jê venaqete. Di vê hevkêşeyê de ji hêla derûna biker ve şîn bi vejetînê re, melankolî bi venejetînê re, bi pevgihiştîmanê re pêwendîdar e.

Ev şirovekirina Freudî ya diyardeyên şîn û melankoliyê ji bo ravekirina têkiliyên pevgihiştîn û vejetînê wan dike çemkîn sûdewer. Bi taybetî ji bo şirovekirina romana Ciwanmerd Kulekî Defterên Perrîdankanê ev çemkîn gelekî sûdewer û raveker xuya dikin. Ji ber ku di navenda romanê de têkiliya jin û mîrekî heye ku ji hev vediqetin, dûre digihîjin hev û dûre dîsa ji hev vediqetin. Vejetîna yekem ji ber dûrketinê çêdibe û vejetîna duyem ji ber mirinê çêdibe. Rewşa derûnî û subjektîfiya serkarakterê mîr di romanê de cihê sereke digire, lewma ev rewşen hanê di hebûna wî de maneyekê bi dest dixin. Ji bo çavêن

derekî ev veqetîn-pevgihîstîn-veqetîn ploteke gelekî sade ye, lê ji hêla derûna karakterê sereke ve aloz e. Ji ber ku di veqetîna yekem de karakterê mîr bajarê karaktera jin û jiyana xwe ya berê diterikîne û diçe bajarekî din, lê di kûraniya derûna xwe de hevyekbûneke melankolîkane bi karaktera jin re saz dike û jê venaqete. Ev hevyekbûna wî bi wê re ew qasîbihêz e ku bi tenê dikare bi xwekuştînê jê veqete. Em dê di vê nivîsarê de bi xwendineke psîkanalîtîk pevgihîstîn û veqetînên karakteran di çarçoveya çemkênen melankolî û şînê de şirove bikin.

1. Kurtasiya Romanê

Cîwanmerd Kulek herî zêde di vê romanâ xwe de teknîkên wek pêla hiş, paşvebirin, pêşveanîn û gotara serbest a neyekser bi kar anîne. Ji ber vê yekê çîroka romanê çi qas sade be jî, ev têkilheviya teknîkî famkirina wê dijwar dike. Lewma berî ku mîrov analîzekê li ser romanê bike, pêwîst e mîrov kurtasiyeke wê bide û bûyerên têkilhev têxe rîzeke demî.

Roman ji sê beşan pêkhatî ye ku ew bi dorê “Li Amedê”, “Fal” û “Veger, Qeder” in. Di beşa yekem de rojnamegerekî ku li Amedê zanîngeh xwendîye, piştî heft salan ji ber hin rûdanen siyasî dîsa hatîye wê derê da ku ji bo ewropiyan meqaleyekê li ser rûdanen binivîse. Di vê beşê de rojnameger bi hestê nostaljîk li hin mekanên bajêr digere. Di beşê de bi piranî behsa mijarên siyasî, zimanî û edebî yê kurdan ên rojane hene. Ligel van, amajeyêni bi evîneke eşkerenekirî ya rojnameger jî heye ku ji bo wî ew û bajar hevyek bûne. Rojnameger meraq dike bê ka di van heft salan de jînikê çi kiriye û xeyal dike ku bi awayekî li hev rast bê. Wî di dema xwe de ya dilê xwe ji jînikê re negotiye, ji ber ku wisa zaniye ku súcek e jê hez bike, lewma dema ku kesekî din di jiyana wê de nemaye jî evîna xwe ya dilsoj veşartiye, bi tenê kariye bibe hevalekî wê. Ji bo ku bikare vê hesta súcdarbûnê ji ser xwe biavêje û dilê xwe jê re veke li bendê maye ku ew jî gavekê biavêje, lê wê tu carî ew gav neavêtiye. Ji ber vê yekê heta ku zanîngeh qediyaye jî destê wî bi destê keçekê nebûye. Lî di vê beşê de diyar nabe bê ka ev çîma sûc be. Berî ku rojnameger bê Amedê bi demekê jînekê dosyeya romanekê û defterên nivîskarekî kurd ê xwekuştî dane weşangerekî bi navê Cemşîd Xeyalî ku berê jî romanekê nivîskarê xwekuştî çap kiriye. Xeyaliyê ku nasê rojnameger e, jê dixwaze ku wê ji bo çapê amade bike, lewma dosyeya romanê û li gel wê defterên nivîskarî jî dide wî ku sûdê ji wan wergire.

Beşa duyem ya bi navê “Fal”ê navenda romanê ye. Beş bi fala qereçiyekê dest pê dike -ku hevoka wê ya ewil “Winda bûn” e. Serlehengê romanê di vê beşê de ye ku nivîskarekî bi navê Filankes e û herwiha tê famkirin ev beş romana nivîskarê xwekuştî ye, wî nivîskarî ev nav li xwe kiriye û hin serpêhatiyê xwe kiriye roman. Di navenda beşê de jî evîna Filankes a bi Luzê re heye. Filankes û Luz du xwendekarê zanîngehê ne; Filankes beşa mamostetiya fransî dixwîne, Luz jî ya îngîlîzî. Di ber têkilîya bi Luzê re, Filankes demeke kurt têkilîyê bi biraziya xwendiyê marketa bin mala xwe ya xwendekariyê re jî datîne. Navê keçika dikandar Hîv e ku dema tê satila mast a vala ji mala wan bibe, Filankes wê nas

dike. Hîna di du saliya wê de di qezayeke trafikê de malbata Hîvê tev mirine, ew tenê ji wan maye û li ber destê ap û amojinê ye. Dûre Hîv jî di qezayeke trafikê de dimire. Piştî vê bûyerê Filankes xwe sûcdar dike ku bi hestên Hîvê lîstiye, lewma di dawiya sala duduyan a zanîngehê de hem Luzê hem jî zanîngehê li pey xwe dîhêle û piştî salekê li Cizîrê li nexweşxaneyê dibe karmendek. Luz nizane Filankes bi ku de çûye, çima çûye û heta zanîngehê diqedîne jî li benda Filankesî dimîne ku rojekê vegere, lê ew venagere. Piştî zanîngehê Luz pêşiyê çend salan li Balikesîrê dûre salekê li Colemêrgê dixebeitê û li wir bi yekî re dizewice, lê berî ku saleke wan biqede ew û mîrê xwe hevdu berdidin. Piştî neh sal û sê mehan dema ku Luz tayina xwe ya mamostetiyê tîne Cizîrê, ew û Filankes hevdu li mala mamosteyan dibînin û dîsa evîna wan dest pê dike. Her du evîndar wek du evîndarê ku cara pêşî evîndarî hev bûbin, bi eşq û heyecan her roj hevdu dibînin. Dema ku Luz tê Cizîrê têkiliya Filankesî bi pizîşkeke bi navê Hesret re heye, Filankes biryar dide dev ji Hesretê berde û bi Luzê re bizewice. Piştî ku Hesret tayina xwe dibe bajarekî din, ji bobihara duym a evîna wan tu astengî li ber çavan namîne. Filankes difikire ku êdî tu kêliya jiyanâ xwe bêyî Luzê derbas neke, mehekê di nav enerjî û kêfxweşiyekê de dijî ku hem nivîsîna wî pê xurt dibe hem îşteha wî ya xwarin-vexvarinê pê zêde dibe. Lê paşê yekî bi navê Rêzan derdikeye û dawiyê li bexteweriya Filankesî tîne. Rêzan li dibistana Luzê mamosteyek e, dilê wî ketiye Luzê lê ji ber ku wê ew red kiriye, wî dev ji kar berdaye û çûye; heger venegere ew dê ji kar bê avêtin. Ji ber ku Luz xwe berpirsyar dibîne, diçe Amedê mala wî da ku wî qanîh bike û li karê wî vegeŕîne. Filankes bi nasekî xwe yê bi navê Zêydîn re dide dû otobusa ku Luz pê diçe. Dema ku Luz li mala birayê Rêzanî ye, Filankes bi israr bi rîya peyaman jê fêrî navnîşana malê dibe û diçe wir. Zêydîn Filankesî li wê derê datîne û diçe ku karê xwe bike, berî jê veqete jî jê re dibêje “destvala nabe” (r. 189) û devançeyekê dide wî. Dema ku diçe pakétek cixare bikire, Filankes dikandarê jêra avahiyê nas dike, tê bîra wî ku apê Hîvê ye û êdî fam dike ku ew mal di apartmana wan a dema xwendekariyê de ye. Paşê Luz telefonî wî dike, diyar dibe ku Luz li mala wan a dema xwendekariyê ye û hevalekî Filankes yê malê ew pêhisandiye ku di dema xwendekariyê de wî bi Hîvê re xayintî li Luzê kiriye. Luz di telefonê de ji ber vê yekê wî şermezar dike, pê re şer dike û dijûnan lê dike. Filankes dike nake Luz danakeve û wê şevê li cem Rêzanî dimîne. Roja din Filankes bi awayekî perîşan vedigere Cizîrê û piştî rojekê jî diçe ku devançeya Zêydîn bide wî. Zêydîn dibêje wî ku divê ew devançeya neteqandî lê venegerîne û wî han dide ku wan pê bikuje. Filankes devançeyê dîsa dixe bêrîka xwe, bi şev romana xwe temam dike û dûre xwe pê dikuje. Evîna wî ya dubarekirî bi Luzê re bi tenê mehekê dewam dike.

Di beşa sîyem a bi navê “Veger, Qeder”ê de ji bo rojnameger girêk vedibe. Rojnameger ji defteran fam dike ku Filankes hevalê wî yê malê yê zanîngehê Ferzende ye ku navê xwe di romana xwe de kiriye Filankes. Luz yara wî Gulten e ku Ferzende di roman û defteran de navê wê kiriye Luz û Rênas jî hevalê wan ê malê yê din Evdo ye ku Gultenê enqestane navê wî kiriye Rêzan. Herçi rojnameger e, diyar dibe ku ew jî hevalê malê yê sîyem Cemal e. Di vê beşê

de tê famkirin ku evîna platonîk a Cemal ku di beşa ewil de bi bîranînê wê li Amedê digeriya, Gulten e. Ji ber ku Gulten yara hevalê wî Ferzende ye, wî hezkirina ji wê sûcek zaniye. Cemal piştî xwendina romanê û rojnívîskan diçe Cizîrê cem Gultenê da ku wê qanîh bike rojnívîskan jî li gel romanê biweşîne. Ew herwiha hêvî dike ku têkiliyekê pê re ava bike ji ber ku difikire hestên wî yên ji bo wê hîna geş in, lê belê Gulten wî red dike.

2. Pevgîhîştin û Melankolî

Freud di nivîsara xwe ya derbarê şîn û melankoliyê de, herdu çemkan di çarçoveya tecrûbeya windakirinê de pêwendîdarî hevdu dike û wan dide ber hev. Li gor Freudî ci bi mirinê be ci bi veqetînê be, şîn li hember windakirina “kesekî hezkirî” yan tiştekî razber ê wek “welat, azadî, îdealekê” û hwd karvedanek e. Lê li cem hin mirovan ev windahî li şûna şînê melankoliyê çêdike. Di şîn û melankoliyê her duyan de jî diyardeyêne wek xemgîniyekê giran a êşbar, qutbûna eleqeyê ji cîhana derekî, astengbûna çalakiyan û kêmbûna behremendiya hezkirinê hene. Lê li gor Freudî ferqa melankoliyê ya barîz ji şînê ew e ku melankolîk xwe bêqîmet, bêkîr û negiring dibîne, xwe sûcîdar dike û hetta li bendê ye ku bê cezakirin (Freud, 2013 [1917], r. 243-245).

Bi dîtina Freudî di şînê de her bîranîn û hêviya ku lîbîdoyê bi objeyê ve girê dide tê mezinkirin, tê dubarekirin, tê biruhanîn û herî dawî wek egereke prensîba rasteqîniyê ego dikare xwe ji windahiyê vejetîne. Ev pêvajoya ku Freud jê re dibêje “karê şîngirtinê” demekê dirêj dike; kesê mayî bi kesê winda re dijî, her kîlî li wî difikire, bi wî re radibe û rûdinê û hêdî hêdî bi vî awayî rîyê didiyê ku bice. Lê di melankoliyê de ev pêvajo pêk nayê, di melankoliyê de bi objeya winda re hevyekbûnek çêdibe, herweku windahî di egoyê de tê bicihkirin (Freud, 2013 [1917], r. 249). Heçku di melankoliyê de vejetîna ampîrîk çêbibe jî vejetîna psîşîk çenabe û windahî bi egoyê ve zeliqî dimîne, pêvebûyî dimîne ku ev dişibe vejetîneke pevgîhîşti. Di çarçoveya şînê de jî melankolî dibe wek redkirina şîngirtinê. Helbet Freud hin taybetmendiyêne din ên van rewşan dijmêre, lê li vê derê berî ku mirov wan jî ji hev veke guncaw e ku mirov vejetîna Filankesî ya ji Luzê di çarçoveya van diyardeyan de binirxîne. Weku em dizanin piştî ku têkiliya wî bi Hîvî re çêdibe û Hîv dimire, Filankes bi xwe Luzê li pey xwe dihêle û diçe Cizîrê. Ew bi xwe çûbe jî ev yeka hanê rê li ber encamên psîşîk ên vejetîn û windahiyê nagire, hetta belkî wan girantir dike, ji ber ku wî bi awayekî hem xayıntî bi yara xwe re kiriye û hem xwe ji ber mirina keseke din sûcîdar kiriye.

Tevî ku Filankes neh salan dûrî Luzê dimîne yanî maweyeke dirêj a windahiyê derbas dike, dîsa jî ev pêvajoyêne karê şîngirtinê yên Freudî behskirî li cem wî dest pê nakin. Mîrov dikare bibêje ew wê li dû xwebihêle jî dev jê bernade; ji ber ku jî bo vê yekê karê şîngirtinê pêwîst e û di wî karî de jî tişta herî esasî vejandin, dubarekirin û mezinkirina bîranîn û hêviyêne têkildarî windahiyê ne. Lê ev jestên hanê piştî dûrketinê li cem Filankesî peyda nabin. Filankes dûre bi vê yekê dihise. Dema ku Filankes cara duyem “vê carê bi evîn û şeydatiyeke mezintir dil” daye Luzê, bi şâşwazî li wê yekê difikire bê “çawa dibû ku bi temamî ji hişê wî

derketibe, bêyî bêrîkirin, bîranîn, pêhesîna wê her dem û wextêni jiyana xwe bîhurandibe.” Ew dûre kişif dike ku tiştekî di “kunceke nepen a ruhê wî” de xeyala wê her parastiye, bêyî ku haya wî jê hebe ew li nav fîksiyonên wî bi cih kiriye, awa û dirûvên wê li hemî lehengên wî yên jin belav kirine, carinan hin parçeyên pirsgirêk û dubendiyêñ wan di çîrokên wî de veşartine (r. 126-7). Weku xuya dike li cem Filankesî hevyekbûnek bi Luzê re çêbûye û ew jê dûr ketibe jî tu carî dev ji wê bernedaye, ew bi awayekî melankolîkane di “kunceke nepen a ruh”ê xwe de her parastiye. Butler ji bo parastina melankolîkane ya objeya winda dibêje: “Ev obje bi awayekî efsûnane wek parçeyekî jiyana psîşîk tê parastin” (Butler, 2015, r. 186). Tişa ku li cem Filankes ji bo Luzê bûye jî ev e. Lewma Filankes difikire ku ev “aliyê zindî û bi nihêni di nava wî de her û her bêtlañî” xebitiye (r. 127). Li vê derê mirov dikare bibêje ku ji ber ku windahî hatiye înkarkirin û di egoyê de hatiye bicîhîkirin, jestêñ şîngirtinê ji bo wê peyda nebûne. Ji ber ku şîn nehatiye girtin vejetîn jî çênebûye, zîra vejetîn di encama şîngirtinê de çêdibe. Lê Filankes şîn negirtiye û lewma ji Luzê veneqetiyaye. Ji ber vê yekê jî dikare wê li pey xwe bîhêle û bajarê wê biterikîne; hevyekbûna wî ya psîşîk bi wê re destûrê dide ku obje li cîhana derekî winda bibe, lê ji ber ku ew di egoyê de hatiye parastin windahî ne mûtleg e. Delîleke din a vê yekê ew e ku têkiliyêñ Filankesî bi du jinêñ din re çêbûbin jî ew tu carî xwe evîndarî wan nabîne û ew nikarin bi tu awayî şûna Luzê dagîrin, lewma dema ku ew ji nû ve digihîje Luzê dihizire ku evîna wî ya pêşî û dawî Luz e. Freud engaşt dike ku di şînê de lîbîdo dikare pêwendiyêñ xwe ji objeya hezkirî biqetîne û yeka din têxe şûna wê, lê li vê derê em dibînin ku yeka din neketiye şûna Luzê, mana bi wê ve bi awayekî melankolîkane hatiye domandin. Têkiliya Filankesî bi Luzê re bi awayekî eşkere melankolîkane hatiye sazkin, lê ji bo ku mirov vê têkiliyê baştir fam bike, divê bi giştî jî li ser kesayetiya Filankes bisékine.

Hin taybetmendiyêñ ku Freud ji bo melankolîkan dijmêrin, li cem Filankesî hene. Freud di nivîsara xwe de tesbît dike ku melankolîk xwe kêm dibînin, xwe bêqîmet û rajêr dibînin ku ev diyarde li cem Filankesî eşkere ne. Filankes gelek caran ji bo jiyana xwe gotinêñ wek “adî, wesed, jirêzê” (r. 126), ji bo xwe gotinêñ wek “adî û basît” (r. 180) bi kar tîne. Ji ber vê yekê navê xwe di romana xwe de dike “Filankes” yanî kesekî jirêzê, kesekî wek herkesî, kesekî negiring. Ew bi “pîlangeriyeke ‘adî a mîrane” derî li Hîvê vedike lê li bendê dimîne ku ew hemû gavan biavêje da ku berpirsyarî hemû di stûyê keçikê de be (r. 204). Dema ku ew di evîndarbûna duyem de li Luzê dinêre difikire ku ji berê xweşiktir û kemilîtit bûye, lê li hember vê yekê xwe wek “alûceke kerrik” dibîne (r. 135). Dîsa di heman çarçoveyê de nivîsêñ xwe naecibîne, xwe nivîskarekî kêm dihesibîne. Têkildarî van hestan Freud tesbît dike ku xwesûcdarkirin li cem melankolîkan zêde ye. Piraniya paragrafrafêñ ku Filankes tê de behsa xwe dike, bi vê hestê hatine mohrkirin. Hetta ew fikra wî ya sabît ku li gor wê “di dawiya her kêfxweşiyê de bextreşiyek heye”, bi temamî berhema derûneke xwesûcdarker e. Ev sûcdarkirin ci hişî be ci derhişî be, bi tenê yekî ku timî xwe sûcdar dike, timî li bendê ye ku tiştekî xerab biqewime. Herçi tesbîta Freudî ye ku dibêje

melankolîkê xwesûcdarker li bendê ye ku bê cezakirin, ji bo vê yekê amajeya herî mezin di romanê de ew e ku ew bi xwe vî cezayî li xwe dibire û xwe dikuje. Filankes ne tenê xwe sûcdar dike, ji bo ku xwe sûcdar bike ci ji destê wî tê dike, rewşen wisa diafirîne ku xwe tê de sûcdar bike. Mesela li gel ku difikire bi tenê ji Luzê hez dike, dema ku bi Luzê re ye têkiliyê bi Hîvê re ji çêdike. Herwiha dema ku Luz tê Cizîrê û biryar dide ku pê re bizewice heta ku Hesret li Cizîrê ye têkiliya xwe bi temamî jê qut nake.

Freud tesbît dike ku rewşa hin melankolîkan carinan vediguhere rewşeke manîk (Freud, 2013 [1917], r. 254). Li gor wî di rewşen wisa de îdealâ egoye ya ku timî wê rexne dike, bi wê ve dizeliqe ku di encama vê yekê de xwesûcdarkirin ji holê radibe û lewma biker dikeve nav rewşeke serfirazane û xweşane (Freud, 2006 [1921], r. 161). Melankolî rewşeke ci qasî bêkêf, ci qasî bêliv, ci qasî mirarî be; manî ji rewşeke ew qasî bikêf, bicoş, bitevger û zindî ye. Li gel halê giştî yê melankolîkane gelek caran mirov Filankesî di rewşeke manîkane de ji dibîne. Mesela di te'ziya bavê xwe de “hindî ku ji bîr kiribe mirov çawa bi xem û keser dibe, şen” e (r. 172). Dema ku ew û Luzê dîsa digihîjin hev gelek caran manîk dibe û di roja pêşî ya pevgihîştinê de, Filankesê Kêmnivískar “beşeke sax” a romana xwe dinivîse (r. 130-1). Bi taybetî berî ku xwe bikuje dema ku romana xwe diqedîne, di rewşeke manîk de ye û bi enerjiyeke mezin dinivîse. Maniya wî ya berî mirinê nêzîkî fikra Freudî, li gor Kleinê ji têkildarî betalbûna mekanîzmaya wijdanê ye. Ji ber ku ego dê êdî bimire mekanîzmaya wijdanê betal dibe, melankolî tê ragirtin û rewşeke manîk peyda dibe. Lewma ew berî mirina xwe bi hêz û şîyanweriyeke mezin romana xwe dibe serî herweku wê engaşta Kleinê biçespîne ku li gor wê taybetmendiya herî giring a maniyê hesta wê ya gişhêziyê [qedîrî-mûtleqî] ye (Klein, 2023, r. 351).

Lê dema ku em di terîfên Freûdî de li sebebên xwesûcdarkirina melankolîkî binérin, divê em bêtir li ser meseleyê hûr bibin. Li gor Freud ji ber ku objeya hezkirinê di egoye de hatiye bicîhkirin, xwesûcdarkirin esasen li dij wê ne, yanî ji wê li egoye vedigerin (Freud, 2013 [1917], r. 248). Heger em objeya serekî ya winda ya ji bo Filankesî Luzê bipejirînin, em tu sebeban nabînin ku di rastiyê de sûcdarkirinê wî li dij wê bin. Freud di nivîsara xwe de diyar dike ku bi tenê li ser hin melankolîkan dinivîse û diyar dike ku dibe windahî derhişî be. Kesên wek Melanie Kleinê ji bo ravekirina melankoliyê hin teoriyên din bi pêş xistine û wê têkildarî rewşeke pitiktiyê dikin. Gelek psîkanalîstên din ji qebûl dikin ku çêdibe xwesûcdarkirina melankolîk ne ji ber objeya winda ya yekser be, yanî derhişî be. Lê dîsa ji li gor Agambenî ev xal cihê xetimîna vekoîna melankoliyê ya psîkanalîstik e. Li gor wî melankolî piştî windakirina obejeyekê nayê, berî wê tê û paradoxsa meyla şîngirtinê pêşkêş dike ku pêşbîniya vê windahiyê dike. Yanî hesta windakirina tiştekî, berî objeyeke şenber di melankoliyê de heye, ew tişt tu carî dê neyê bidestxistin, lê wek tiştekî winda tê xeyalkirin ku li gor Agamben ev sîmulasyona şîngirtinê ye (Agamben, 2007, r. 259). Li vir Agamben di çarçoveya fenomenolojiyê de qesta melankoliyê dike ku ji demên antîk ve ev nerît heye. Tevî ku Borgna psîkiyatrist e ji bo famkirina melankoliyê hem ji çemkên

fenomenolojîk û hem ji yên psîşîk sûd werdigire û bawer dike ku her du ji hevdu bi temamî ne cuda ne (Borgna, 2023, r. 43). Lê li vê derê guncawtir e ku mirov taybetmendiyêñ melankolîkane yên Filankes baştır vekole. Piştî ku me melankolîkbûna wî barştır li ber çavan raxist, em dê di dewama nivîsarê de li ser têkiliya Luzê bi vê melankoliyê re bêtir hûr bibin.

Taybetmendiyêñ melankolîkane yên Flankesi bi evê Freudî di nivîsra xwe ya yekser têkildarî mijarê de jimartî namînin. Dema ku em di nav romanê de li şopêñ wê yan li ravekirinêñ derbarê wê de digerin, em dibînin ku di vê xalê de hin tiştêñ têkildarî zaroktiya wî hene. Li gor ku vegêr diyar dike Filankes berevajî zarokêñ din ên malbata xwe ji zaroktiya xwe de yekî kêmpeyy û xemgîn e. Ji şadî û bextxweşiyê bawer nake û van diyariyêñ ku jiyan yekcaran pêşkêş dike jî wek parçeyekî pergala keserbar û janbar a jiyanê dibîne. Filankes yekî wiha ye ku bi dîtina wî hemû xweşî, kevirêñ li ser rêya dawiyêñ xerab raxistî ne (r. 102). Li gor wî ev kesera wî “ji destpêka bûna wî de” ketiye canê wî (r. 107). Ew vê kesera ku tu tiştî nekariye ji wî bibe, “mîna ruxsarê” xwe dibîne. Ne tenê ji hêla derûna navekî ji hêla çevêñ derekî ve jî Filankes di ontolojiyeke cuda tê dîtin. Di nav malbatê de ji zaroktiyê de pêgeheke Filankesî ya cuda heye; malbata wî tev mirovîn şen in, lê ew tam berevajî wan e û endamên malbatê jî wî wek yekî “ne ji wê malê” dibînin (r. 172). Li vê derê em dibînin ku Filankes ji zaroktiyê de di nav hebûneke dabeşbûyî de ye; di nav malbatê de ye, lê tam ne di nav de ye, ji wê malbatê ye, lê tam ne ji wê ye û wek xerîbekî ye.

Ku ev diyarde rehendeke giring a melankoliyê pêk tîne. Hebûna melankolîkî hebûneke dabeşbûyî ye; ew di navbera du cîhanan de dijî ku yek ya civakî ye, ya din ya tenêtîya mûtley e. Ji bo subjeyêñ melankolîk di navbera hebûna civakî û tenêtîyeke mûtley de kortalek heye. Ev kortala ruhî carinan dike ku bi rastî subje xwe bike yekî anonîm, xwe bike filankesekî di nav mirovîn din de. Ferzende vê yekê dike; dev ji zañîngehê, derdora xwe ya civakî, jiyanâ xwe ya berdest berdide, evîna xwe Luzê li dû xwe dihêle û diçe li Cizîrê dibe mamûrekî jirêzê. Bi vê yekê jî namîne navê xwe di nivîsîn xwe de dike Filankes û xwe ber bi windabûnekî ve diajo ku Eugene Minkowski vê yekê wek cureyekî xwekuştinê dihesibîne (bin. Leader, 2018, r. 168). Filankesbûna wî wisa hatiye şayesandin: “Wî xwe kiribû Filankes û bi qandî ku kesî dî nikaribe destê xwe bidê yekî ku tenê wî nas dikir afirandibû di nava xwe de” (r. 215). Rengdevanê vê yekê ji zaroktiya Filankes de xuya dikin. Kesekî ku di nav malbata xwe de ji zaroktiyê de wek biyaniyekî bê dîtin, ne mimkun e dûre bi temamî entegreyî jiyanâ civakî bibe. Ew dê di nav civakê de jî wek biyaniyekî, wek yekî ne ji wan bijî. Ew dê ji mecbûrî rûtînêñ rojane bi cih bîne, lê tu carî bi temamî ne li wir be. Ji ber vê rewşa melankolîkî Kristeva dibêje ew “wek potansiyel sirgûn e” (Kristeva, 2009, r. 81).

Me got melankolîk di navbera du cîhanan de dijîn, lê bi temamî ne li yekê ne jî. Lê Filankes bi xwe jî vê dabeşbûn û duparbûnê yan dubendiyê çedike. Dema ku ew bi Luzê re ye û tevî ku bi tenê ji Luzê hez dike û ji bo wî ne mimkun e “ji bilî Luzê ji yeka dî hez bike” (r. 195), bi Hîvê re jî dide û distîne. “Çawa ku çaxa Luz” tê

“balê Hîv ji aqlê wî” dernakeve, “çaxa Hîv li balê” ye “Luz ji pêş çavê wî” naçe (r. 206). Dema ku Luz li mala wî ye carinan ji ber vê têkiliya dubend şev û xew lê diherime, lê dîsa jî dev ji vê rewşê bernade. Herwiha dema ku Luz tê Cizîrê û dîsa têkiliya wan dest pê dike, kurtedemekê bi Hesretê re jî dewam dike, yekser têkiliya xwe ji wê qut nake. Piştî ku biryar dide jî bo Luzê ji wê veqete dîsa ew û Hesret hevdu dibînin. Dema ku Hesret bang li wî dike –bi kêmeanî carekê– Filankes wê red nake û diçe cem wê. Bi tenê dema ku Hesret tayina xwe ji Cizîrê dixwaze têkiliya wan bi temamî diqede: “Fahm kir ku herduyan êsta bi cî dizanî û bawer dikir ku her tişt ji binî de, bêveger, qediyaye” (r. 121).

Têkildarî vê xalê Leader diyar dike ku di rewşa melankolîkan de nemimkuniyek heye (Leader, 2018, r. 176). Rengvedaneneke vê nemimkuniya têkildarî derûn û hebûna dabeşbûyî di fantaziyeke Filankesî de xwe xuya dike. Xwişkecêwîyeke Hesretê bi navê Xurbetê heye. Filankes di fanteziyên xwe de xeyal dike ku her du xwişkan ji hev dernaxe û li şûna Hesretê bi Xurbetê re dinive. Carinan xeyal dike ku bi yekê re be, lê nizanibe ew kîjan e. Carinan jî xeyal dike ku bi her duyan bi hev re be û nizanibe bê kî kîjan e (r. 105). Li vir ji ber ku wê nizanibe bê bi kîjanê re ye, ev fikir wî cezb dike: Du jînên ji hev lê ne yek, wekhev lê cuda. Wisa xuya dike ku ev têkildarî hebûna dabeşbûyî ya melankolîkî û nemimkuniya di rewşa wî de ye. Weku dixwaze tiştekî nemimkun bike û her du tiştan bike yek, di heman demê de li du cihan be, hem li wir be hem li vir be.

Ev hesta duparbûn yan dabeşbûnê û herwiha nemimkuniya têkildarî vê yekê ji bo melankolîkan di têkiliya wan û zimanî de jî heye. Çawa ku di navbera hebûna civakî ya melankolîkî û tenêtîya wî ya mûtley de kortalek heye, ji bo wî di navbera zimên û cîhanê de jî kortalek heye. Leader diyar dike ku li cem melankolîkan nîşanker û nîşankirî yanî peyv û tişt bi hêsanî temasî hevdu nakin. Lewma melankolîk ji ber kortala di navbera van her duyan de êşê dikişîne (Leader, 2018, r. 177-178). Li ser vê yekê Kristeva dibêje “Melankolîk di zimanê xwe yê dayikê de biyaniyek e” (Kristeva, 2009, r. 69). Leader xwesûcdarkirina melankolîkan jî têkildarî dabeşbûna wan û vê meseleya wan a zimanî dike. Bi dîtina wî melankolîk nikare du cîhanan (ya tenêtîya xwe ya mûtley û ya civakî) bigihîjne hev, nikare peyvan jî bigihîjne tiştan, lewma ew dê xwe sûcdar bike (Leader, 2018, r. 179). Belkî ji bo Filankes pirsgirêka herî mezin ev meseleya nemimkuniya derbirînê û êşa ji ber wê be. Hîna di serê beşa têkildarî wî de dema ku falnîr Feleknas li fala wî dinîre û jê re dibêje, “Ne İşê ne xweş e ku tiştên mirov dizane û dibîne ji tiştên ku mirov dişê bibêje zêdetir bin” (r. 83); Filankes jî axînekê dikişîne û dibêje, “Tu wer ji min re bêj” (r. 84) û amaje bi vî derdê xwe dike. Li hin cihan dema ku Filankes li ser têkiliya xwe û zimên difikire, derbirînin yeksertir jî têb bikaranîn: “Lê rastî heçku çi binivîsanda jî her tim tiştekî dî bû” (r. 129). Carinan jî ev kortala di navbera zimên û cîhanê de eşkererit tê derbirîn: “Li duryana ku zimanê wî û cîhan ewçend ji hev dûr diketin his dikir ku tikîtenê maye” (r. 137). Ji bilî van delîlên di beşa “Fal”ê de yanî di beşa romana Filankesî de, Cemal jî di beşa “Veger, Qederê” de radigihîne ku Filankes di defteran de gazinan dike ku wî “tucarî tiştên ku dikare û dixwaze binivîse nenivîsiye” (r. 238).

Bi tenê di demên manîk de ku melankolî di wan de betal e, Filankes dikare bi dilê xwe binivîse. Yek ji tiştên ku maniyê pê re çêdike û melankoliyê jê dûr dixe evîna vejjiyayî ya Luzê ye. Piştî ku bi Luzê re dubare digihîjin hev, Filankes bi gûrahî dikare binivîse û difikire ku nivîskarî êdî ne xewneke dûr, lê rastiyeye eşkere ye (r. 134). Lewma difikire ku evîn ji bo wî “peywendiyeke rasteqîne” bi jiyanê re çêdike. Difikire ku evînê têkiliya wî ya bi jiyanê rasteqîne kiriye, hêza wî ya gotinê û baweriya wî ya bi nivîskariya wî zêde kiriye. Lewma wan demên ku bi evînê coş dibe, his dike ku “bi rastî jî qala cîhanê dike” (r. 141). Herwîsa berî ku xwe bikuje di rewşeke manîk de ji heq tê der ku romana xwe bibe serî. Wê demê “yekem car di jiyana wî de tiştekî zora keserê dibir” (r. 179) ku ew jî mirin e, daxwaza mirinê ye. Lewma dema biryara xwekuştinê dide, melankoliya wî tê ragirtin û bi hêzeke manîk romana xwe temam dike.

Hem bi tesbîtên Freudî û hem bi yên psîkanalîstên din mirov bi eşkereyî dibîne ku Filankes mekankolîkek e.² Lê belê ji bo taybetmendiya wî ya xwesûcdarkirinê, tevî ku wî bi Luzê re hevyekbûneke melankolîk çekiriye, em sebebeke yekser nabînin ku ev sûcdarkirin di esasê xwe de li dij Luzê bin. Wê çaxê weku Freud bi xwe jî nivîsiye dibe ku ev taybetmendiya wî têkildarî tiştekî derhiş be û Luz jî têkildarî wê be. Herçi engaşa Agambenî ye ku li gor wê psîkanalîz di korerêyekê de diteqine dema ku melankoliyê bi windahiyê ve girê dide, di esasê xwe de di psîkanalîzê de ravekirina vê yekê ne dijwar e. Mesela hin derbirînin Kristevayê di vî warî de dikarin hem kêmaniye Freudî temam bikin û hem bersivê bidin Agambenî. Kedera di melankoliyê de her tim ne ji ber dijmintiya li dîkeya winda ya li ber çavan e. Kristeva behsa modeke din a melankoliyê dike ku di wê de “keder işaretâ egoyeke birîndar, temamnebûyî û vala ye.” Takekesekî wisa ji ber qisûreke bingehîn, ji ber kêmaniyeke ji makzayî de êşê dikişîne. Xemgîniya wî bêtir derbirîna birîneke narsîsistîk ya ew qasî zû ye ku nayê sembolîzekirin û nayê binavkirin (Kristeva, 2009, r. 21). Weku xuya dike li vir

² Hin nîşaneyên din ên melankolîkbûna Filankes têkildarî hin diyardeyên nerîti yên melankoliyê ne. Em dizanîn ku melankolî bi tariyê, bi rengê reş tê sembolîzekirin. Filankes li cihekî ji bo Luzê dibêje “şeva min” (r. 91). Di réya amedî de pê dihiise ku “îl dilê [wî] bûye şev” (r. 172). Di vê çarçoveyê de navên karakteran jî manedar in. Weku em dizanîn navê Filankesî Ferzende ye û wî navê xwe kiriye Filankes û bi heman awayî navên kesên din jî guhertine. Em nizanîn navê Hîvê yê rast çi ye, lê ev hilbijartina wî ne bêsedem e. Ji ber ku hîv bi ronahiya xwe, dijayetiya tariyê temsîl dike; lê ronahiya di nav tariyê de ye hîv, ronî dike lê bi tenê dema ku tarî be. Hem ji ber ronahiya hîvê ev nav hatiye hilbijartın hem jî ji ber têkiliya wan a aloz. Herçi Luz e ew jî maneya wî di spanyolî û portekizî de “ronî” ye. Herweku Filankes li dij tariya di hindurê xwe de van navên têkildarî roniyê dide van jinan, lê di dawiyê de ew nikarin vê tariyê veguherînin ronahiyê û ew ber bi zulûmata bêdawî ve diçe. Dîsa yek ji îzehêni ji bo rewşa Filankesî ya melankolîk di romanê de ew e ku dema ew zarok e cav li lawirekî ecêb dikeve û vedilîze. Piştî vê bûyerê “rengê wî û mahdê wî” diguhere. Herwiha “[d]i piçûkantîyê de diya wî jê re nîvişt dabûn çekirin li ba şêxan, bo birandina wê keser û xemgîniya ku weka nexweşîya zerikê bi kurê wê re hatibû û jê nedîçû” (r. 172). Ev rewşa hanê teriffen antîkan ên melankoliyê tîne bîra mirov ku ew wê bi zêdebûna zehferana reş girê didin ku jixwe maneya terma melankoliyê di grekî de yekser zehferana (*khole*) reş (*melaina*) e (Göle, 2007, r. 163). Di deqekê de ku bi Aristotelesi tê spartin ji bo derûva kesên melankolîk tê gotin ku “gelekên wan reş û hişk in” (Aristoteles, 2007, r. 114).

amaje bi kêmanî û windahiyeye derhişî heye. Lé dibe ku kesek yan tişteke din di jiyana subje de bi awayekî bi wê kêmâniya sereta ya derhişî re bê têkildarkirin û ew jî bibe objeya melankoliyê. Di vê rewşê de ev obje dikare melankoliya heyî gûrtir û kûrtir bike, dikare hin mekanizmayên seretayî yên derhişî tev bilivîne û melankolîk bikişîne cîhana miriyan.

3. Veqetîn û Şîn

Di beşa borî de em li ser têkiliya zimên û melankoliyê sekinîn û me diyar kir ku di melankoliyê de pirsgirêkeke zimanî, pirsgirêkeke derbirînê heye ku li vê derê em dê li ser têkiliya vê yekê bi şînê re bifikirin. Hin psîkanalîstên din hin pêvajoyê din ên şîngirtinê tesbit kiribin jî, pêvajoya wê ya esasî ew e ku kesê mayî kesê wînda bi her awayî tîne bîra xwe; li ser kîliyên wî yên şad û neşad, li ser serketin û têkçûnên wî, li ser hêvî û armancêñ wî, li ser kîliyên ku bi hev re derbas kirine, li ser demêñ xweş û nexweş ên bi hev re buhartine hemûyan difikire û di dawiya vê pêvajoya êşbar de eşâ windahiyê hêdî hêdî sivik dibe û yê mayî dikare xwe jî yê çûyî veqetîne. Di vê pêvajoyê de windahî ji her hêla xwe ve, ji her rehenda xwe ve tê nimandin ku ev nimandin, ev fikirîna li ser windahiyê jixweber çenabe. Keser karvedaneke yekser a encama windakirinê ye û jixweber çêdibe, lê şîngirtin pêvajoya karkirina li ser wê keserê ye ku ev karekî vînî ye. Di temamê vê pêvajoyê de diyarkera sereke ziman e; ji ber ku ev fikirîn, ev kûrbûn û hûrbûna li ser windahiyê bi amraza zimên çêdibe. Ci subje li ser objeya wînda bi tenê di dilê xwe de bifikire û wê bi her awayî li cem xwe binimîne, ci li ser wê bi pivevive û ci li ser binivîse her zimên bi kar tîne, bi wî derdibire. Lé ew pirsgirêka melankolîk heye ku nikare bi hêsanî bi amraza zimên derbirîne ku weku Leader dibêje ev yek îhtimala pêkhatina pêvajoya şîngirtinê dixe talûkeyê (Leader, 2018, r. 179).

Ev jî pirsekê çêdike ka gelo melankolîk bi giştî nizanîn yan nikarin şînê bigirin, wate, ji ber ku Filankes jixwe melankolîk e, piştî dûrketinê şîna Luzê negirtiye û lewma jê veneqetiyye. Heger ev wisa be têkiliya esasî ya Luzê bi melankoliya Filankesî re lawaz dibe ku ev jî engaşta me ya hilanîna wê bi awayekî melankolîkane lawaz dike. Ji bo vekolîna vê yekê divê em li têkiliyên wî yên din bi jinan re binêrin. Ji ber ku du jinêñ din û pevgihîştin û veqetînên têkildarî wan jî di vê hevkêşeyê de hene. Weku em dizanîn dema ku Filankes bi Luzê re ye têkiliya wî bi Hîvî re jî çêdibe, wate windakirina wê ji bo wî di demeke dûr de pêk hatiye. Lé belê fikirîna wî li ser Hîvî “ci bigire piştî deh salan” (r. 201) dest pê dike. Dema ku li pey Luzê diçe Amedê û li wê derê dibîne ku mal mala wan a xwendekariyê ye û Luz bi têkiliya wî ya bi Hîvî re dihise, Hîv dikeve bergeha Filankesî û bi vî awayî em ji serpêhatiya wê û têkiliya wan haydar dibin. Herçi Hesret e, di romanê de demeke dirêj nakeve navbera veqetîna wan, lê hin derbirînin Filankesî yên têkildarî wê di vî warî de fikrekê didin mirov. Filankes demekê ji bo Luzê xwe ji Hesretê dûr dixe û ji hevdu cuda dimînin, lê dûre Hesret telefonî wî dike û carekê hevdu dibînin. Hingê li ser wê difikire dema ku wî ew nedîtiye “bi tevzî û qurfa ku nebûna wê di dilê wî de hiştibû nehisiyabû” (r. 115). Ev “tevzî û qurfa” ku ji ber

windakirinê li cem wî çêdibe keser be, karkirina li ser wê şîngirtin e ku li vir diyar dibe ku li cem wî karê şîngirtinê dest pê nekiriye. Dema ku Hesret jê re dibêje ku wê tayina xwe xwestiye û êdî fam dike ku têkiliya wan dê bi temamî biqede, Filankes taqet nake li ser bîranînên bi wê re bifikire. Ji bo wî “Her tişt dê di bêdengî û bêcismiyeke mirî de, bê kar û bar, li ciyê xwe bimaya. Heta hetayê” (r. 121). Lê belê ji bo karê şîngirtinê divê di hişê subjeyî de her tişt bê vejandin û tevrakirin, divê tiştek bêdeng û bêcism nemîne.

Weku xuya dike mirov dikare bi giştî bibêje ku di warê şîngirtinê de nebehremendiyeke Filankesî heye. Lê heger ew bi giştî hinekî nizanibe şînê bigire jî, ev nayê wê maneyê ku bi her windahiyê re hevyekbûnê çêdike û wê bi awayekî melankolîkane di egoya xwe de hiltîne û diparêze. Bi qasî ku xuya dike bi tenê Luzê bi vî awayî li cem xwe diparêze, nikare di psîşeya xwe de jê veqete. Heger melankoliya wî bi Luzê re dest pê nekiribe jî bi wê re kûr û gûr bûye. Dûrketina yekem ji wê, wî dike Filankesekî wek herkesekî û ihtîmala dûrketina duyem ji wê, wî ber bi xwekuştinê ve dibe. Naxwe divê maneyeke taybetî ya Luzê ji bo wî hebe.

Dema ku me behsa pirsgirêka têkildarî zimên a melankoliyê kir, me diyar kir ku Kristeva ji bo melankolîkî dibêje ku ew di zimanê xwe yê dayikê de wek biyaniyekî ye. Ev dupatkirina wê ya li ser zimanê dayikê ne tesadûfî ye; Kristeva li ser şopa Kleinê, melankoliyê bi rewşeka dayikane ve girê dide. Li gor psîkanalîza Lacanî bav zarokî ji dayikê vediqetîne û bi vî awayî wî ji êwra hêmâyî derbasî êwra sembolîk dike. Zarokê ku berî vê vejetînê bûnewerekî biyolojîk e, piştî wê êdî dibe bûnewerekî civakî û çandî. Weku xuya dike ev tiştekî erênî ye, lewma Lacan jê re dibêje “xesandina mirovker” (bin. Tura, 2010, r. 186). Li gor Kristevayê subjeyê ku vê widahiya sereta ya derhişîn napejirîne û şîngirtinê red dike, dibe melankolîk. Li gor vê ramanê ji ber ku melankolîk windakirina dayika xwe, vejetîna ji wê qebûl nekiriye di zimanê wê de biyaniyek e. Divê subje pêşiyê windahiyê qebûl bike ku paşê bikare di nîşankeran de li dayika bigere û wê di zimên de ji nû ve bi dest bixe (Kristeva, 2009, r. 58, 69).

Di romanê de hin amaje hene ku melankoliya Filankesî bi awayekî têkildarî dayikê dikan. Filankes difikire ku ev kesera wî ya jêneçûyî “bi firra şîrê pêşî re” ketiye canê wî (r. 172). Weku eşkere ye li vê derê “firra şîrê pêşî” amaje bi pêşîrên dayikê û dawiya dawî jî bi dayikê dike. Meseleya zimanî jî digihîje cîhekî wisa. Filankes çi qasî xwedî hişmendiyeke mezin a zimanî be, çi qasî di vî warî de cehd bike jî; zimanê ku ew pê dinivîse tu carî wî tetmîn nake, hesta yekparetiyekê pê re çenake, “şûna ekla zimanê zaroktiya wî” nagire. Lewma difikire ku “zaroktî biheşteke beta ê zimanekî tak û yekgirtî ye, êdî berze ye” (r. 139). Ev fantaziya bîhuştâ winda, fantaziya tambûnê ye ku di wê de hîna kesên din û sînor tunene. Li vê bîhuştê hîna windahî û vejetîn tunene, lewma gişhêziyeke bêserûber heye ku ev amaje bi dema berî vejetiyana ji dayikê dike disa. Ev gişhêziya narsîstîk piştî vejetiyana ji dayikê birîndar bûye û kesera vê vejetiyânê mohra xwe li temamê hebûna wî xistiye. Lewma di kîliyên manîk de ev melankolî û kesera wê carinan

betal bibe ji, ew wek “xêzikên li nava kefa destan” e ku “tu av tu tav” nikare jê bibe (r. 172). Dîsa em hisêن Filankes ên ji bo dayika wî, maneya wê ji bo wî û hwd qet nabihîzin ne ji devê wî, ne ji devê vegêr. Mimkun e mirov vê yêkê wisa şirove bike: ew tişta ku ev melankolîk jê veqetiyaye, jê bêpar maye “ku nayê temsîlkirin” (Kristeva, 2009, r. 22), lewma nayê ser zimên; têkildarî dayika wî ye û lewma temsîlkirina wê ji zehmet e ji bo wî.

Piştî van milehezeyan em dikarin li ser xwesûcdarkirina Filankesî ji şirove bikin. Weku me li jor nivîşî, Freud engaşt dike ku xwesûcdarkirinê melankolîk li dij objeya wî ya hezkirî ya winda ne, lê ji ber ew obje di egoyê de hatiye hilanîn sûcdarkirin jî li wê vedigerin. Heger objeya sereke ya ku bûye sebeba melankoliyê dayik be, têkildarkirina xwesûcdarkirinê bi sûcdarkirina wê re pir hêsan e. Ji ber ku hestên ambîvalent li dij dêûbavan tiştekî asayî ye; zarok hem li ber rehma wan û hem li ber xezeba wan neçar in û lewma hem ji wan hez dîkin hem ji wan hêrs dibin. Lîteratura psîkanalîzê tije tesbîten wê yekê ne ku mirov li hember dêûbavan xwedî hestên ambîvalens in; ji wan hez jî dîkin, nefret jî dîkin. Lewma têkiliyên evînî yêن li gor modela dêûbavan jî, vê ambîvalensiye nîşan didin. Jixwe Freud diyar dike ku di melankoliyê de têkiliya bi objeyê re ji ber dubendiya têkildarî ambîvalensiye aloy bûye (Freud, 2013 [1917], r. 257). Belkî ev şirove betir di asta hişî de bêñ famkirin, lê di asta derhişî de jî xwesûcdarkirina melankolîk dibe têkildarî dêûbavî be. Wisa xuya dike ku şirovekirina Kristevayê ya li ser têkiliya melankoliyê bi dayikê re, pêwendîdarî kompleksa Odîpusî ye. Dîsa Freud diyar dike ku piraniya hesta sûcdarbûnê bi normalî derhişî ye, ji ber ku ew bi kompleksa Odîpusî ve girêdayî ye û ew jî derhişî ye (Freud, 2011 [1923], r. 110).

Ji ber ku Luz ji hêla Filankesî ve bi awayekî melankolîkane hatiye parastin, lewma carekê melankoliya wî giran dike û cara din jî wî ber bi mirinê ve dibe, divê em vê şiroveyê bikin ku ew li cem Filankesî bi dayikê re hatiye têkildarkirin. Di jiyanê de jî di edebiyatê de jî gelek caran ne eşkere ye bê li cem kesên hezkirî ci heye ku wan têkildarî dêûbavî dîkin. Ji ber ku ew tişta ku Lacan wê wek nîşankera “obje a”yê bi nav dike, bi piranî derhişî ye. Filankes jî bi vê yekê nizane, lewma dema ku li ser vê kûr bûye, difikire ku li cem mirovan “hevsenginî xerîb û veşarî hene” û ev hevsengî “hêza xwe ji wê yekê werdigirin ku tu carî bi cî nayêñ zanîn û derbirrîn” (r. 127). Lê mirov nikaribe sebebên vê yekê rave bike bê ka çawa Luz bi awayekî têkildarî dayikê ketiye cihekî giring ji bo Filankesî, mirov dikare rengvedanêñ wê bibîne.

Di psîkanalîza Lacanî de kes yan tiştekî din, tiştekî li derveyî subje heye ku wek sabîteyekê manedarbûna jiyana wî dabîn dike ku Lacan ji bo wê terma Dîkeya mezîn bi kar tîne. Dîkeya mezîn ya mirov ya pêşî dayik be jî dûre kes û tiştên din dikarin şûna wê bigirin (bin. Homer, 2016, r. 101-105). Luzê ji bo Filankesî rola vê Dîkeyê giirtiye. Ji ber vê yekê dema ku Filankes bi şâşmayîn ji xwe dipirse bê ka çawa ew qas sal kariye bêyî wê bîmîne, pê dihise ku bêyî wê nemaye jîxwe. Yanî dema ku fiilen Luz ne di jiyana Filankesî jî de ye, roleke bingehîn di jiyana wî de gêraye. Zîra Filankes li ser dihizire ku “Luz yekane kes bû ku dizanibû ew ê

rojekê bibe nivîskar.” Lewma ji “Ji bo Luzê dînivîsî. Dê Luzê çucar nexwendaya, tênegihiştaya ji tiştên ku dînivîsî, lê dîsa ji bo wê dînivîsî” (r. 205). Ev rewşederûn dişibe rewşederûna hin nivîskaran ku dayika wan nizanibe bixwîne ji ji bo wê dînivîsîn û carinan bi îthafekê vê yekê diyar ji dikin.

Bi me diyardeyeke din dîsa amaje bi cihê raser ê Luzê dike. Weku me di besên borî de diyar kir, Filankes difikire ku bi awayekî Hîv îstismar kiriye, ji ber ku li gor wî ew “[d]ê bi wê re nezewiciya, dê pê re raneketaya û nikaribûya hevaltiyeke dildarî û dostikî pê re bike”. Lê dîsa pê re dide û distîne ku ev yek “wijdanê wî nerihet” dike (r. 201). Gunehê Filankesî bi Hîvê tê û wê wek yeka “jar û perîşan” dibîne (r. 204). Hesteke manendî vê li cem wî ji bo Hesretê ji peyda dibe. Mêrê Hesretê ew bi hevaleke wê re xapandiye, wê li dij wî doza hevberdanê vekiriye û rojeke piştî vekirina vê dozê mîrik û kurê wê di qezayekte trafîkê de mirine. Ji ber vê yekê dema ku Hesret ji Filankesî re behsa xwe û cêwiya xwe dike, ferqa xwe û wê bi “bextreşıya” xwe rave dike (r. 106). Lewma ji bo Hesretê “dilovanî û dilşewatiyek” bi Filankesî re peyda dibe (r. 107). Lê herçi Luz e, tevî ku dema Filankesî ew li dû xwe hiştîye Luz bi salan li hêviya wî maye ku vegere û wê ji serpêhatiyeke nexwes a hevberdanê heyen, tu hesta dilpêşewitînê ji bo wê li cem Filankesî çênabe; hesta wî ya li hember wê zal, gunehkarî û súcdarî ye. Dema ku Luz li Amedê bi Hîvê dihise Filankes difikire ku “jê were evîna xwe dîtibû li gunehê xwe rast hatibû” (r. 215). Ev yek nîşan dide ku Filankes bi tenê Luz û pêgeheke raserî xwe de dibîne. Ji ber ku bi gelempêri dilpêşewitîn ji bo wan kesan e ku mirov wan di bin xwe re dibîne û xwesûcdardîtin ji bo wan kesan e ku mirov wan di ser xwe re dibîne.

Em di vî warî de diyardeya dawî bidin ku amaje dike Luz li cem Filankesî bi dayikê re hatiye têkildarkirin. Bi taybetî di romanê de Hesret gelek caran wek objeya arezûyê ya Filankesî tê şayesandin. Bi giştî di romanê de sehneyen pornografîk tunebin ji gelek caran arezûya Filankesî ji bo wê û pevşabûna wan diqewime. Hîv ew qasî wek yeka rebenok hatiye şayesandin, lê dîsa ji temasên cinsî yên Filankesî bi wê re di romanê de hene. Li gel van yekan tevî ku di dilê romanê de evîna Filankesî ya ji bo Luzê heyen, em işaretên arezûya wî ji bo wê nabînin; ne gotinek derbarê vê yekê de û ne ji sehneyek. Ji ber ku em şiroveyen xwe li gor daneyên di romanê de dikin, em dikarin bigihîjin wê encamê ku arezûya cinsî ya Filankesî ji bo Luzê kêm e. Freud di nivîsara xwe “Aşkta Evrensel Aşağılama Eğillimi” yê de [Meyla Biçûkxistinê ya Gerdûnî di Evînê de] li ser vê diyardeyê spekulasyonan dike. Li gor çavdêriyên Freudî hin mîr dema ku evîndarî jienekê dibin wê arezû nakin. Li gor şiroveya Freudî ev diyarde têkildarî tabûya qedexeya ensestê ye. Mêrekî wisa di derhişa xwe de evîndara xwe têkildarî dayika xwe kiriye, lewma arezûya wî ji bo wê çênabe, lê ji bo hin jinê din çêdibe ku ew ne evîndarî wan e (Freud, 2006 [1912], r. 233-250). Mêrekî wisa evîndara xwe wek dayik Meryemê xistiye cihekî bilind, lewma ew dûrî arezûya wî ye.

Ji ber vê giringiya wê, ji ber vê hebûna wê ya efsûnane, guherîneke di rewşa wê de romana Filankesî ber bi kutabûnê ve û wî ber bi mirinê ve dibe. Ev

guherîn têkildarî îmaja Filankesî li cem Luzê ye. Dema ku evîna Filankes û Luzê cara duyem dîsa dest pê dike, Filankes bi cih dizane ku Luz hîna jê hez dike. Filankes roja yekem a hevdîtinê êvarî li malê wisa difikire: “Lê ew ji bîr nekiribû. Her ji wî hez kiribû, ev yek didît” (r. 132). Lê ji ber pîskolojiya xwesûcdarker a melankolîkane ku li bendê ye tiştên xerab biqewime, hîn berî ku Luz tiştekî jê re bibêje, dema ku di rêya Amedê de li pey wê ye, ew difikire ku “wê dê çucarî ji wî hez nekira êdî” (r. 180). Li vê derê ji bo Filankes îhtimala windakirina Luzê derketiye holê, lê hîna di rastiyê de tiştekî wisa neqewimiye. Lê ev îhtimal jî derûna Filankesî tevlihev dike û ew di rêye de di xewna xwe de dibîne ku xwe dikuje. Piştî ku Luz ji Rêzanî dielime ku Filankes bi Hîvê re xayintî lê kiriye, telefonî wî dike û heqaretan lê dike, li gel gelek heqaretên din jê re dibêje “Tu ci virrkerekî ‘adî yî” (r. 214). Ji vê derê pê ve êdî Filankes wî cihê xwe yê li cem Luzê, wî cihê xwe yê di çavê wê de winda dike. Îmaja mirov a li cem kesekî hezkiî tiştekî ew qasî giring e ku li gor Lacan dema ku kesekî wisa dimire, mirov li gel şîna wî şîna xwe jî digire (bin. Leader, 2018, r. 136). Luz hîna nemiriye yan ji wî veneqetiyaye, yanî hîna nebûye widahî ji bo Filankesî, lê giringiya pêgeha wê, mirina Filankesê di çavê wê de, Filankesî ber bi mirina rasteqîne ve dibe.

Weku me got li vê derê miriyek, windahiyek heye ku ew jî Filankesê ji bo Luzê ye, Filankesê di çavê wê de ye. Li gor Darian Leader li gel karê ku Freud diyar kiriye yek ji karên şîngirtinê ew e ku biker bikare dev ji wî cihê xwe yê di çavê Dîkeyê de berde. Li vê derê heger Filankes bikare dev ji hêmaya xwe ya li cem Luzê berde, wê bikare şîna wê bigire û xwe jê veqetîne. Lê belê ji dêvla ku qebûl bike ku ew êdî ji bo wê miriye, li ser maneya xwe ya ji bo wê, maneya wê ya ji bo xwe bifikire û bi vî awayî şîna wê bigire, ew xwe dikuje. Giringiya cihê Filankes di çavê Luzê de di asteke derhişî de çêbûye, lewma ew nikare dev ji wî cihê xwe berde. Objeyeke melankoliyê ya Filankesî dayika wî be, ya din Luz e.

Nivîsîna romanekê derbarê windahiyen de karekî şîngirtinê ye. Nexwe dawiya dawî piştî ku Filankes cihê xwe yê di çavê Luzê de winda dike, dest bi nivîsîna romana xwe dike û bi vî awayekî karekî şîngirtinê bi cih tîne, lê ev şîn ji şîna wî pê ve ne ya kesekî ye. Heger dema ku subjeyek şîna objeyekê digire hemû bîranînê xwe yên pê re, demên bextxweş û demên bextreş ên pê re tîne bîra xwe, heger li ser hemû hêviyên xwe yên ji wê û têkildarî wê difikire; ku kesek hemû kesên nêzîkî xwe yek bi yek bi vî awayî bîne bîra xwe, yek bi yek bi vî awayî li ser wan bifikire, ew kes şîna xwe digire. Ji ber ku dema ku karê şîngirtina kesekî tê kirin ew kesa di navenda fikirînê de ye, her tişte ku dibe cihê ponijînê têkildarî wî ye, lê heger ev ponijîn li ser hemû kesên nêzîk û windahiyen be, ev karê şîngirtina subje bi xwe ye. Yanî ev romana Filankesî ji şînnameya wî pê ve ne tiştek e, ew şîna xwe digire. Şîna wî Filankesê mirî digire ku berê ji bo Luzê sax bû. Em vê yekê wisa şirove dikan.

Dema ku Luz bi Filankesî re diaxive û heqaretan lê dike, nivîskar bi rêkareke zîrekane bersivê Filankesî nedane, em bi tenê ji axaftinên Luzê bersivê wî texmîn dikin, herweku li hember van gotinan zimanê xwe xwaribe.

Piştî vê axaftinê mirov dikare bibêje ku “hêmaya wî ya îdeal ku hêjayî hezkirin[a] [wê] ye birîndar dibe” (Leader, 2018, r. 26). Lewma Filankes difikire ku êdî “tiştek nema vedigere destpêkê û dibe mîna berê.” Hingê “jehra kesera ku di seraserê jiyana wî de jê negeriyabû tevli bêhna mirinê” dibe (r. 215, 220). Lingekî melankolîkî li cîhana zîndîyan û yek li cîhana miriyan e û her dem mimkun e bi handana tiştekî ew bi temamî biçe cîhana miriyan. Filankesê ku tev dûrbûna bi salan tu carî ji Luzê veneqetiyaye, bi kuştina xwe vê vejetianê pêk tîne. Dema ku li ser kuştina xwe difikire vê vejetînê wîsa xeyal dike: “Vejetînêku wî heta hetayê li evînê mohr û mahr bike” (r. 179). Ew hêvî dike ku bi vê vejetînê dîsa wî cihê xwe yê li cem Luzê bi dest bixe: “Luzê dê ew ji bîr nekiraya heta ku ‘umrê wê hebûya. Belku weku bîranînekê çêtir bijiyaya li vê cîhanê bi nisbet canewerekî zindi” (r. 183).

Encam

Di vê nivîsarê de me têkiliyên vejetîn û pevgihîstînê yên di Defterêن Perrîdankan de di çarçoveya çemkên melankolî û şînê yên Freudî de şirove kirin. Freud melankolî û şînê wek encamên windakirinê dinirxîne. Di encama windakirinê de biker dikevin nav kesereke kûr û dirêj. Hin biker li ser vê keserê dixebeitin û di encama karê şîngirtinê de hêdî hêdî kesera xwe dihelînin û ji windahiyê vediqetin. Lê hin biker şîngirtinê red dikin û di encama windakirinê de dikevin nav melankoliyê ku keser di wê de bêdawî ye. Her du diyarde ji têkildarî windakirinê bin ji, di melankoliyê de ev windahî hinekî tevlihevtr e. Ji ber ku weku Freud diyar dike di şînê de windahî bêtir eşkere ye, lê di melankoliyê de carinan kes yan tişa winda eşkere be ji, dibe ku biker nizanibe bê li cem wan ci winda kiriye. Herwiha dibe ku melankolî pêwendîdarî windahiyeye derhişî be ku ev wê aloztir dike. Gelek taybetmendiyêñ melankolîkan li cem Filankesi hene. Keser, xemgînî û reşbîniyeke herdemî di vî warî de taybetmendiya wî ya herî li pêş e. Rewşederûna wî ku xwe kêm dibîne, xwe ‘adî û bêqîmet dibîne taybetmendiyeyeke din a melankolîkan e. Ji ber vê dîtina wî ji xwesûcdarkirina wî yek ji taybetmendiyêñ din ên melankolîkan e. Ew carinan ji rewşa melankoliyê dikeve rewşeke berevajî wê û manîk dibe ku Freud behsa van taybetmendiyêñ melankolîkan hemûyan kiriye. Hebûna wî ya dabeşbûyî, pirsgirêka wî ya bi zimên û derbirînê re taybetmendiyêñ wî yên din ên melankolîkane ne. Ji ber van taybetmendiyen hemûyan, me ew melankolîk hesiband. Herçi yekem objeya winda ya sebeba vê melankoliyê ye, wîsa xuya dike ku ew derbarê windahiyeye sereta û derhişî, derbarê dayika wî de ye. Lê Luz ji dîsa bi awayekî derhişî di derûna wî de bi dayika wî re hatiye pêwendîdarkirin û ew ji bo wî bûye objeya melankoliyê. Lewma dema ku ew cara pêşî bi awayekî ampîrîk neh salan dûrî wê dimîne, di psîseya xwe de jê venaqete, bi mekanîzmaya melankoliyê bi wê re hevyekbûnê pêk tîne û wê bi xwe ve digire. Ji ber ku şîngirtina Luzê red kiriye, melankoliya wî bi dûrketina ji wê girantir bûye. Filankes neh salan bi awayekî hişmend li ser wê nefikriye, lê ji wê veneqetiyaye. Luzê di encama hevyekbûna melankolîkane de cihê xwe yê krîtk di jiyana wî de winda nekiriye. Wê wek Dîkeyeke mezin roleke bingehîn di manedarkirina jiyana wî de gêraye. Ji ber vê

dema ku dubare dest bi têkiliyê dîkin Filankes difikire ku vê carê bi evîneke mezintir jê hez dike. Piştî ku Luz dibihibe ku Filankesî di zemanê xwe de bi Hîvê re têkilî daniye û xayintî li wê kiriye, îmaja wî ya li cem wê diguhere û Filankesê berê ji bo wê dimire. Ji ber ku ew ji bo Filankesî di pêgeheke pir giring de ye, nêrîna wê, awirêne wê bêyî hebûna wê ya maddî ji jiyana Filankes û nivîsîna wî manedar dîkin, Filankes nikare vê guherînê ragire û xwe dikuje. Dawiya dawî Filankes ji Luzê vediqete, lê bi tenê dikare bi mirinê vê yekê bike û hêvî dike dîsa Luz wek berê li wî binêre û wî di bîreweriya xwe de biparêze. Ev xwekuştina wî dişibe wek tevgera zarokekî ku ji ber ku bêhawetî li dayika xwe kiriye, ew ji dêvla wê ceza li xwe dibire da ku ji çavê dayikê nekeve. Freud dibêje ku melankolîk ew qasî di nav rewşederûneke xwesûcdarker de ye ku li bendê ye ku bê cezakirin, lê Filankes bi xwe vî cezayî li xwe dibire. Piştî ku Filankes di çavê Luzê de dimire, êdî dest bi karê şîngirtinê dike ku romana wî berhema vî karî ye. Lê li vê derê şîna Luzê nagire, heger karîbûya şîna wê bigirta, wê xwe nekuştaya jixwe. Bi me ew şîna Filankesê ji bo Luzê mirî digire, şîna xwe digire. Di karê şîngirtinê de tiş yan kesa winda di navendê de ye, her tiş li dora wê digere, her tiş bi wê re têkildar e. Di romana Filankesî de kesê di navendê de ew bi xwe ye; serpêhatî, bîranîn û windahiyên wî tê de tênen vegêran. Lewma me romana Filankesî wek şînnameya wî şirove kir.

Çavkanî

- Agamben, G. (2007). Kayıp Nesne. (Ş. Öztürk, Wer.) Cogito(51), 258-261.
- Aristoteles. (2007). Karasafralılık. (Ö. Aygün, Wer.) Cogito(51), 108-125.
- Borgna, E. (2023). Melankoli. (M.M. Çilingiroğlu, Wer.) İstanbul: Yapı Kredi Yayıncıları.
- Butler, J. (2015). İktidarın Psişik Yaşamı. (F. Tütüncü, Wer.) İstanbul: Ayrıntı Yayıncıları.
- Freud, S. (2006 [1912]). Cinsellik Üzerine. (S. Budak, Wer.) İstanbul: Öteki Yayınevi.
- Freud, S. (2006 [1921]). Uygarlık, Din ve Toplum. (S. Budak, Wer.) İstanbul: Öteki Yayınevi.
- Freud, S. (2011 [1923]). Haz İlkesinin Ötesinde Ben ve Id. (A. Babaoğlu, Wer.) İstanbul: Metis Yayıncıları.
- Freud, S. (2013 [1917]). Yas ve Melankoli. S. Freud içinde, Metapsikoloji (D. E. Çapkıن, & A. Tekşen, Wer., r. 241-259). İstanbul: Payel Yayınevi.
- Göle, M. (2007). Aşk Melankolisi Diye. Cogito(51), 163-169.
- Homer, S. (2016). Jacques Lacan. (A. Aydin, Wer.) Ankara: Phoenix Yayınevi.
- Klein, M. (2023). Sevgi Suçluluk ve Onarım. (A. Tekşen, Wer.) İstanbul: Alfa.
- Kristeva, J. (2009). Kara Güneş Depresyon ve Melankoli. (N. Demiryontan, Wer.) İstanbul: Bağlam Yayıncılık.
- Kulek, C. (2014). Defteren Perrîdankan. Stembol: Avesta.
- Leader, D. (2018). Depresyon Yas ve Melankoli. (A. Göçmen, Wer.) İstanbul: Encore Yayıncıları.
- Tura, S. M. (2010). Freud'dan Lacan'a Psikanaliz. İstanbul: Kanat Kitap.

Şîra Moderne Ya Kırmanckî (Zazakî) De Wuslat û Fîraq

Pınar Yıldız¹

Modern Kırmancca (Zazaca) Şiirinde Vuslat ve Firak

Öz

Bu çalışmamızda Doğu şiirine damgasını vurmuş olan “vuslat ve firak” mefhumunun modern Zaza şiiri üzerindeki etkisini göstermeye çalışacağız. Modern Zaza şiirinde toplumsal ve ahlaki meseleler ve aşk kullanılan başat temalardandır. Özellikle aşk teması modern Zaza şiirinde en fazla kullanılan temadır. Bu tema ile bağlantılı olarak da “vuslat ve firak” mefhumu da şairlerin şiir tarzlarına göre farklı şekillerde modern Zaza şiirine yansımıştir. Birçok Zaza şairin şiirlerinde ayrılık acısını, bu acının dert, keder ve elemi ile şairin isyanını ve vuslatın imkânsızlığını görürüz. Modern Zaza şiirinde vuslat ve firak kavramı genellikle dünyevi/fani aşk için kullanılmıştır ve bu şiirlerde genellikle ilahi aşk kastedilmez. Fakat yazarların üslup, tarz ve bakış açılarına göre vuslat ve firak mefhumu, modern Zaza şiirinde de farklı şekillere bürünerek şiirlerde görülebilir. Bu çalışmada şairlerin vuslat ve firak mefhumuna yaklaşımına göre, çalışmayı dört başlık altında sınıflandırdık: Toplumsal bir tema olarak vuslat ve firak, tasavvufi bir tema olarak vuslat ve firak, fani aşk teması çerçevesinde vuslat ile firak ve kadın şairlerin vuslat ve firaka bakış açıları.

Anahtar kelimeler: şiir, modern zaza şiiri, aşk, vuslat, firak.

Reunion and Separation in Modern Zaza Poetry

Abstract

In this study, we will try to show the effect of the concept of “reunion and separation”, which has left its mark on Eastern poetry, on modern Zaza poetry. In modern Zaza poetry, social and moral issues and love are the dominant themes used. In particular, the theme of love is the most used theme in modern Zaza poetry. In connection with this theme, the concept of “reunion and separation” has also been reflected in modern Zaza poetry in different ways according to the poets’ poetic styles. In the

¹ Arş. Gör. Dr., Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, pinaryildiz@artuklu.edu.tr, [0000-0002-8175-0879](tel:0000-0002-8175-0879).

Makale Gönderilme Tarihi: 01.07.2024, Kabul Tarihi: 26.08.2024

poems of many Zaza poets, we see the pain of separation, the trouble, grief and sorrow of this pain, the poet's rebellion and the impossibility of reunion. In modern Zaza poetry, the concepts of reunion and separation are generally used for worldly/mortal love, and divine love is generally not meant in these poems. However, according to the style, style and perspective of the writers, the concepts of reunion and separation can be seen in different forms in modern Zaza poetry. In this study, we classified the study under four headings according to the poets' approaches to the concepts of union and separation: union and separation as a social theme, union and separation as a mystical theme, union and separation within the framework of the theme of mortal love, and the perspectives of women poets on union and separation.

Keywords: poetry, modern Zaza poetry, love, reunion, separation.

Kilmvate

Na xebate de ma do hewl bidê ke mefhûmê “wuslat û fîraq”î yo ke morê xo dayo şîra rojawanî ro, şîra moderne ya kirmancî (zazakî) ser o senîn hewa tesîr kerdo, ey ser o vinderê. Şîra zazakî de temayê ke zaf zêde ameyê şuxulnayene meseleyê komelkîyî, exlaqîyî û eşq o. Bîhesa temaya eşqi şîra moderne ya zazakî de zaf zêde ameya şuxulnayene. Nê ra zî girêdaye mefhûmê “wuslat û fîraq”î zî nê şîran de, goreyê terz û uslûbê nuştoxan ameyo şuxulnayene. Şîrê zafê şâiranê kirmancan de ma derd, keder û işyanê cîyabîyayışî vînenê ke şârn bi bêîmkânîya xoresnayışê waştîye nalenê. Şîra modeme ya zazakî de zafane wuslat û fîraq seba eşqê fanîyî ameyo qestkerdene yanî nê şîran de qestêko tesewuffî cin o. La reyna zî goreyê terzê nuştoxan mefhûmê wuslat û fîraqî eşkêno bibedilîyo. Na xebate de ma goreyê ewniyayışê şâiran yê mefhûmê wuslat û fîraqî, xebate çar binbeşan ser o awan kerd: Sey temayêka komelkî wuslat û fîraq, sey temayêka tesewuffî wuslat û fîraq, sey eşqê fanîyî wuslat û fîraq û şîranê şâiranê cinîyan de wuslat û fîraq.

Kilîtçekuyî: şîre, şîra modern ya zazakî, eşq, wuslat, fîraq.

Extended Abstract

In this study, we tried to show the effect of the concept of “reunion and separation” on modern Zaza poetry. Social and moral issues and love are the dominant themes used in modern Zaza poetry. Especially the theme of love is the most used theme in modern Zaza poetry. In connection with this theme, the notion of “reunion and separation” is reflected in modern Zaza poetry in different ways depending on the poets' poetry styles. In the poems of many Zaza poets, we see the pain of separation, the trouble, grief and pain of this pain, the poet's rebellion and the impossibility of reunion. In modern Zaza poetry, the concepts of union and separation are used for worldly/mortal love, and divine love is not usually meant in these poems. However, depending on the style and style of the writers, the concept of reunion and separation can be seen in different forms in modern Zaza poetry.

In modern Zaza poetry, the concept of “reunion and separation” usually manifests itself as the pain of separation, waiting, and longing. Beloved's

departure is like hell. In these poems, there is usually a temporary reunion, but after this temporary reunion, a helpless separation begins again, for which the only cure is the lover. In other words, in modern Zaza poetry, in the concept of “reunion and separation”, there is a cycle of separation-reunion and separation again. Poets await the day of reunion with a shred of hope. In fact, some poets get so used to this long and helpless separation that it becomes a part of their identity and soul. The poems that emerge are generally born from the ashes of this pain. Since what is generally meant by the concept of love in modern poetry is mortal love, the concepts of “reunion and separation” are also used in this sense. In these poems, very few lovers achieve reunion. In Zaza poetry, an enthusiastic and erotic language and style is generally used to express these rare moments of reunion. In the poems, these rare moments, that is, reuniting with the beloved, are depicted with an emotionally charged atmosphere. In poems, moments of reunion are as if they were regular moments, and poets want to describe these moments in a language and style befitting these regular moments. Women poets talk about these moments of reunion very bravely, and in the description of these moments of reunion, the verses of the poets become green again, like nature. Again, in Deniz Gunduz's poems, love and the reunion of lovers means creating a new and hopeful world. That's why, when the hands of lovers meet, an exuberant and deep blue world is created. Sometimes, as seen in the poems of M.Malmışanij and Roşan Lezgîn, due to some social values that see love and reunion as shame and taboo, moments of reunion either remain incomplete or these rare moments can only be experienced in secret.

In modern Zaza poetry, only WK Merdimîn writes his poems in a classical style and tone, and in his poems, love is generally divine love. Therefore, the beauty that the poet waits to see is the representation of God's beauty. In this mortal world, the poet has no hope of reunion anyway. Therefore, reunion remains with the afterlife, the other world. However, the poet still does not regret walking on this path and for this cause, he suffers all the difficulties and hardships with desire and desire.

In the poems of poets such as Mehmet Mehdî Ozsoy and Mihanî Licokic, love is generally the love felt for the homeland, and therefore the metaphors of ‘rose and roseland’ are used instead of the word homeland, which is what is meant by reunion. Again, in the poems of Alevi poets, the lover is often called “my gentle lover” and “my balm/cure” and this lover is the cure for all troubles. And only if Xizir (Hizir) comes to manliness and softens the beloved's heart, the beloved can soften, be merciful and cure all the troubles and end this cruel separation.

Destpêk

Metnê edebî yê kirmancî peynîya seserra newêsine ra bi mewludanê klasikan dest pêkerdo ke ê yew tewirê şîre yê. Yanî şîra kirmancî zî esasê xo de peynîya seserra newêsine de dest pêkerdo (Çiçek, 2017). Nuştoxanê sey Ehmedê Xasî (1899), Usman Efendîyo Babij (1903), Şêx Muhammedê Şêx Ensarî (1947-48), Mela Mehemed Elî Hûnîyî (1971) tarîhanê cîya-cîyayan de mewludê xo nuştê (Kirkan, 2018). Seke aseno peynîya seserra newêsine ra nat bi şekilékê sistematîkî nêbo zî bi kirmancî şîrî yenê nuştene. Zafê cigêrayoxî edebîyatê modern yê kirmancî bi Kovara Tirêj danê dest pêkerdene ke ma na kovare de zafê tewiranê edebîyatîy sey şîre û hîkaye vînenê. La esasê xo de şîrê ey zaf erey çap bibê zî Mehmed Mehdî Ozsoyî Tîrêjî ra ver texmînî serra 1976î de şîrê xo nuştê. Kovara Tîrêj de zafê şîrê telîf yê Malmîsanijî yê ke badê cû ïnan kitabê eyê şîran Heraklîtosî de ca girewt û tayê şîrê ke hetê ey ra ameyê açarnayene est ê. Badê kovara Tîrêj zî zafê kovaran de şâîranê zazayan şîrê xo bi zazakî neşr kerdê. Yanî badê kovara Tîrêjî heta serranê newayan ma tayê kovaranê sey Hêvî, Armanc û Çira de, badê cû zî Kovara Vate û Şewçila de şîranê kirmancî vînenê. Destpêk ra kovaran de zaf şîrê zazakî çap bîyê. Bîlhessa peynîya serranê newayan de û destpêkê serranê di hezaran de êdî bi zazakî kitabê şîran zêdîyayê. Zafê nuştoxanê ke kovaran de dest bi nuştışê şîran kerdo, badê cû zî şâîrtîya xo dewam kerda û çend kitabı çap kerdê la ê tayê şâîran tenya yew kitabê ïnan yê şîran çap bîyo.

Şîra moderne ya zazakî de hetê şekîlî ra zafane terzo serbest ameyo şuxulnayene. Nê şîran de, bîlhesa serranê newayan de cuya rojane, meseleyê komelkî û sîyasî, dej û derdê şarê kurdî, îdealîzekerdişê cuya dewan û folklor, ê temayê ke zaf zêde ameyê şuxulnayene, ê yê. İbrahîm Dagılma babete (mewzu) û temayê ke şîra zazakî de ameyê şuxulnayene wina ïzeh keno ke goreyê ey, mewzuyê sey weziyetê dînî û mîlîyi, hesreta welaît, û sewbîna hesretî, cuya şexsan, şarî ser o tesîrê nê çîyan; û temayê sey derd û şayî, dej û rehetî, serewedartîş û zerrîweşî, urf û edetî û modernîzm, temayê şexsî û cematkî, dînî, îdeolîjî û xoserî, ê tema û babetanê serekeyan ra yê (Dağılma, 2022: 79). Reyna seba şîra zazakî Hasîp Bîngol tesnîfkerdişêko sey şîra komelkî, şîra xeyalkî, şîra folklorîk, şîra mîstîk-metafîzîk keno (Bingöl, 2019). Nê temayan ra şîra zazakî de temayê ke zaf zêde ameyê şuxulnayene meseleyê komelkî û ferdî yê. Miyanê temayanê ferdîyan de eşq cayêko zaf muhîmî gêno. Seke Shahab Vali zî bala ma anceno ser temaya eşqî şîra kurdî de temayêka bingeyên a: “Yanî bi şekilêko pêroyî eşkêno bêro vatene ke, tarîxê edebîyatê kurdkî de, tema û mefhûmanê tewr vilabîyayeyan û bingeyênan ra yew mefhûmê eşq û evîndarîye yo” (Vali, 2023: 130). Temaya eşqî, şîra zazakî de zî yew temaya ke zaf zêde ameya şuxulnayene, ïnan ra yew a. Nê ra zî girêdaye mefhûmê “wuslat û fîraq”î zî nê şîran de goreyê terzê nuştoxan ameyo şuxulnayene. Çike edebîyatê rojhelatî de, manzûman esasê xo de cîyamendiş û dûrîkewtişê aşiq û maşûqan ra hêz girewto. Miradnêqedîyayîş û pênèresayîşê aşiq û maşûqan ra, eşq û menzûmê girdî welidîyayê. Coka eşqê Tajdîn û Sitî ney, eşqê Mem û Zîna ke ê na dinya de

nêresayê pê, badê seserran ewro zî bi name û veng o. Çike eşqê Tajdîn û Sîtî seke bi wuslatî ya ameyo peynîye. Mehdî Ozsoy şîrêka xo de na rewşe ser o Tajdîn û Memî dano têver û muqayese keno: “Tajdîn bilbil ib, resa gulê xwu / Mem sisperik ib, kot mîn çile xwu” (Özsoy, 2014: 22). Îdî no cîyakewtiş û dûrîmendiş reseno yew merhele ke şâîr (aşiq), hende mîyanê ê dejî de vindî beno ke êdî nêwazeno bireso “waştîya xo.” Helbet mîyanê bawerî û edebîyatê tesewuflî de mefhûmê “wuslat û fîraq” mabêne “însan û Homayî” de yo. Coka pêresayîş yanî wuslat zafane bêîmkan o. Ancax eke însan pak bimano, beno ke badê mergî bieşko cemalê Homayî bivîno û xo biresno ey. Coka “wuslat û fîraq” yew rayero dûr û zehmetin o ke hem derdê cîyakewtişî tede est o hem zî seba aşiqî layîqê a roja pêresayîşî (wuslatî) bîyayîş muhîm o. Îtîqadê tesewuflî de, badê gêrayîşanê na dinya mexsedo heqîqî, resayîşê heqîqetî yo ke nê resayîşê heqîqetî ra qedû mexsed wuslat o. “Şîrra klasîke de na raywanîya eşqî, yew rayîrê seyr û sulûkî yo ke bi zahîr (aseye) û batînî (nêaseye) yeno pê, nê rayîrî de şiyayîş o. Şîrra klasîke zafane behsê na raywanîya wuslatî kena. Coka şîrran de babeta cîyamendişî zaf zêde ameya şuxulnayene” (Kurnaz, 2010: 447). Wexto ke însan na dinya ra bar biko û şoro, wexto ke barê bedenî ra bixelisîyo reseno ruhê xo û Heqî; ancax o wext wuslat virazîyeno. Yanî wuslato heqîqî ancax bi nê şekîliya virazîyeno. La wuslat bi xo seke êdî peynîya a raywanîya û eşqî yo. Coka “Çîyo ke şîre de yeno vatis halê cîyatîya eşqî yo. Çike şîrra wuslatî nêbena, wuslatxaneyî ra ifşaatt nêbeno, teşîrkerdiş nêbeno, weşano ganî qet nêbeno. Wuslat cayê qedîyayîşê vateyî yo (Kurnaz, 2010: 459). Eşqo ebedî fîraqî ra weliîyeno. Seke Kierkegaard zî bala ma anceno ser, “Her çî yo bipeynî (fanî) û demdemî yeno vîrrakerdene, çîyo ke maneno tenya û tenya çîyo ebedî yo, hêzê eşqî yo, bextîyarî ya” (Kierkegaard, 2018: 155).

Edebîyatê klasîkî de sebebê kederê fîraqî, zafane bîyayîş û estbîyayîşê însanî ra yo. O ruho ke kalûbelâ de, Homayî pufê ci kerdo, seba ke na dinya de (xurbete de) wayîrê ê nefesî ra dûrî mendo, fîraqêkê girdî mîyan de naleno. Reyna bawerîya rojhelatî de zî rojawanî de zî o keso ke tewr zêde ci ra yeno hes kerdene Heq/Homa bi xo yo. Kierkegaard mojneno ra ke heman ewnîyayîş esasê xo de bawerîya rojawanî mîyan de zî est o:

“Homayî ra teber, hemverê kesêkê/a bînî/e heskerdişêko gird, zaf makul nîyo. Çike eşqo fanî (heskerdişê bedenî) ebedî nîyo, sersemîyêka şîrine ya bêpeynîyî ya, bi vatisêkê hîna berzî bêtersîya fehmînêbîyayîşî ya ke coka însanî, wazênê şansê xo yê, Homayî ra hîna vêş, hîna zaf û astêka hîna berze de, însanêk ra hes bikê, biceribnê. Û na çîmtarîyîye (bêtersîye) şâîrî zaf zêde memnun kena, goşê ci rê hîna şîrin yena, înan de şewkêk virazena û bi nê şekîliya însan yeno ziwan (terennum keno)” (Kierkegaard, 2021: 29).

Nê ewnîyayîşî tenya şîrra klasîke ser o ney, şîrra moderne ser o zî tesîr kerdo. Coka şîrra moderne de zî waştî bi xo; wazeno wa na waştîye xeyalanê şâîran de îdealîze biba, wazeno rast a zî sey eşqêkê fanîyî heskerdoxî biresê pê, ancax waştîye eşkeno/a mana bido/a cuye. Waştîye, wayîra cuya şâîrî ya, coka

şâîrî bi keder û lawayan venda aye danê. Waştîye sey hukumdarêkê zulimkarî seke heme cuya aşiqî gêna binê hukumdarîya xo. Cazîbeyêko aye yo bêpeynîye est o la a bi heme zalimîya xo ançax ge-ge yena rehm û cuya şâîrî şen kena. Seke Baudrillard bala ma anceno ser, “Ê aye, tenya yew stratejîye aye est o, uca de bîyayîş yan nêbîyayîş û bi nê şekîl ya sey çilayêka tafînîyena û padîyena, tesîrêko hîpnozî kena...” (Baudrillard, 2021: 108). Esasê xo de na waştîya ke tenya mewcudîyetê aye bi xo bes o seba nê tesîrî zaf zî ked nêdana. La reyna zî a zerrîya şâîrî de û şîrranê şâîrî mîyan de cayêkê serekeyî de ya, tu hêz nêşkeno aye cayê aye ra bileqno. Beno ke a zî xora wazena ke no cayê aye yo herdemî nêxeripîyo. Çike seke Baudrillard bala ma anceno ser, “Rayer ra vetîş (baştan çıkışma) bêmerg o. Cinîya ke [aşiqî] rayer ra vejena, sey însanêkê hîsterikî wazena bêmerg biba, heta peynîye, ciwane bimana û wa sibayê (meşte) aye çinî bê...” (Baudrillard, 2021: 111). Ma nê taybetmendîyanê waştîye, şîrra zazakî de zî vînenê.

Şîrranê zafê şâîranê kirmancan de ma nê derd, keder û îsyânê cîyamendişî vînenê ke şâîrî bi bêîmkaniya resayışê waştîye nalenê. Şîrra moderne de zafane wuslat û fîraqî ra mexsed, eşqo dunyevî ameyo qestkerdene yanî nê şîrran de qestêko tesewufî çin o. Yanî şîrra moderne ya zazakî de, waştîye ra dûrîmendiş, bêîmkaniya xoresnayîşê waştîye, temayêka sereke ya û şîrra moderne ya zazakî de, waştîye; waştîyêka fanî ya. La goreyê terzê nuştozan mefhûmê wuslat û fîraqî zî eşkêno bibedîlio. Şîrranê zafê şâîranê zazayan de temaya bingeyêne, derd, dejê waştîye fanîye ra durîmendiş o û şâîrî na rewse ra gîfîyan kenê. Şîrê W.K Merdimînî beno ke mîyanê şîrra zazakî de nê hetî ra îstîsna bibê ke şîrranê ey de eşq eşqeko tesewufî yo. Şîrê ey hîna zaf didaktîk ê û şîrranê ey de zî wuslat û fîraq hîna vêş, hetê exlaqî ra xo resnayîşê astêkê berzî yo.

Na xebata ke ma şîrra moderne ya zazakî de, dekewtê rêçanê mefhûmê “wuslat û fîraqî” dima, ma çar binbeşan ser o awan kerd. Beşê verêni de, ma mefhûmê wuslat û fîraqî temayanê komelkîyan ra girê da. Ma nê binbeşî de sey nimûne şîrrê Mehmed Mehdî Ozsoy (1944-2009) û yê Mihanî Licokicî mojnayê ra. Beşê dîyinî de ma sey temayêka tesewufî dekewtê rêçanê wuslat û fîraqî dima ke, serdemê modernî de, şîrra zazakî de WK Merdimîn (1954) temsilkarê ci yo. Seba ke dewro klasîk teberê sînoranê xebata ma de bî, ma metnê klasîk yê tesewufî daxîlê nê binbeşî nêkerdê. Beşê Hîrêyinî de zî sey eşqê fanîyî ma dekewtê rêçanê wuslat û fîraqî dima. Nimûneyê nê beşî zî şîrrê şâîranê sey, J. Îhsan Espar (1956), Deniz Gunduz, M. Malmîsanij, Newzat Valêri, Îdrîs Yazar, Roşan Lezgîn, Akman Gedîk-Newzat Gedîk, Xidirê Başî, Suleyman Ozmen bî ke şîrra ïnan hêzê xo, eşq, fîraq û wuslatê waştîye fanîye ra girewto. Beşê çarînî de, ma şîrranê şâîranê cinîyan de dekewtê rêçanê mefhûmê wuslat û fîraqî dima. Seba ke goreyê ewnîyayîşê ma yew veng û uslûbo cîya yê şâîranê cinîyan bî, ma coka şîrê nê şâîran binê nê binbeşî de analîz kerdê. Nimûneyê nê beşî zî şâîrê sey Xecê, Berfîn Jêle û Bedrîye Topaçe bî ke şîrê ïnan sey kitab çap bîyê.

1. Sey Temayêka Komelkî Wuslat û Fîraq

Mefhûmê wuslat û fîraqî, şîrra klasîke û şîrra moderne de; mana û temsîlîyetê aşiq û maşûqî bîbedilîyo zî zafane bi eşqî ya girêdaye yo. La esasê xo de no mefhûm eşkêno seba sewbîna tema û armancan zî bêro şuxulnayene. Yanî wexto ke armancê waştîş, hesret û eşqê şâîran bibo sewbîna yew çî êdî derdê fîraqî û waştîşê wuslatî de zî tenya hesretê ê temayan est o. Coka mefhûmê wuslat û fîraqî eşkêno sey hesretê welatî zî bêro şirovekerdene. Çike şîrra zazakî de ma şîrranê tayê şâîran de hesretê welatî sey temayêka bingeyêne vînenê ke nê şâîrî êdî seba welatê xo nalenê û waştîşê ïnan yo tewr gird vînayîşê xelasa welatî yo.

Şîrranê Mehmed Mehdî Ozsoyî (1944-2009) de hîna zaf derd, keder û hesretê welatî est o û fîkrê wuslat û fîraqî zafane nê temayan ser o yo. Şîrê Ozsoyî bi nameyê Dîwan û Dîwan II. çap bîyê. Dîwanê ey bi Mem û Zînêka zazakî dest pêkeno. Na şîre sey beytan nuşiyaya û new beşan ra werê yena. Şîrranê ey de meseleyê komelkî, derd û kederê welatî, tarîx û mîtolojîyê kurdan ra zaf zêde nimûneyî est ê. Reyna xîretê hişyarkerdişê şarê kurdan, nezanîya şarî, ê temayanê ke şîrranê ey de zaf zêde ameyê şuxulnayene, ïnan ra yê. Coka şîrranê Ozsoyî de eşq sey temayêk, sey eşqêkî îlahî yan zî fanîyî néameyo şuxulnayene. Eşq şîrranê Ozsoyî de sey hesreta welatî ameyo vînayene. Seke yew şîrra xo de zî Ozsoy behs keno, o seba Leyl, Şîrîn, Xec û Zîn nênaleno, o tenya seba hesreta welatî naleno (Özsoy, 2021: 186). Coka o zaf reyi şîrranê xo de welatî sey gule û gulîstanî name keno. Yanî mazmûnê “gule û gulîstan” şîrranê Ozsoyî de welat bi xo yo: “Rwêc xelasê Gulîstûnî d’/ Bilbil semêd gulûn kîşyen / Gulîstûn id tim gwîn rişyen” (Özsoy, 2014: 54). Hesretkêş û heskerdoxê welatî zî ê bilbilê ke seba na gule û gulîstane feryad û fixan kenê, ê yê. Çike “hesrêt merdûn, kiştûn ma” na gule ya (Özsoy, 2021: 95). Şîrra ey a bi nameyê “Gulê Mi” de, şâîr behsê hesreta Gule keno ke reyna na Gule ra qesd yew cinî nîya, welat bi xo yo:

Ax lê gulê gula zerd
 Tu da ax û dec û derd
 Bilbil hesret tu ver merd
 Wisar iz byû puk û serd
 Gulê wisar kirdûn a
 Ti en rindê rindûn a
 Darîy heme derdûn a
 Ab' sêr tîrbê merdûn a (Özsoy, 2014: 47).

Şîrranê Ozsoyî de, seba ke welat bi xo eşq o, wuslat zî xelasa welatî vînayîş bi xo yo. Seba Ozsoyî, wilat vêw a, ti zuma / Bye Newrûz nûmherûm a, coka Newroz roşanî ra vêş sey şewa “şebî arûsî” yew veyve yo; Newrûz kîrdî r' yo vêwe w (Özsoy, 2014: 68). Çike seba Ozsoyî Newroz yan zî wisar metaforê

xelasbîyayîşê welatî yo û esasê xo de o wuslat o ke şâîr pabeyê ci yo xelasa welatî bi xo ya. La seke o şîrêka xo de vano zimistanê nê welatî derg û şewê ci tarî yê coka seke o teswîr keno morcelayê nê welatî zî mîyanê fîraqêkê girdî de rojanê wisarî pawenê (Özsoy, 2014: 69):

Bilbîl qay tu wûnenî
 Derd o hesret vînenî
 Mezelûn xwi keneni
 Ben qîrbûn tu ax Gulê
 Gulê wisar kîrdûn a
 Sebeb kulûn derdûn a
 Ser mezelûn merdûn a
 Pinda sûr ib, ab' Gulê (Özsoy, 2021: 65).

Şîrra zazakî de no pênaskerdişê welatî yê sey “gule û gulîstan” hetê Mihanî Licokicî ra zî sey mazmûn ameyo şuxulnayene. Şîrranê ey de zî şâîr hesret û dejê na “gule û gulîstan” anceno û seba ke no gulîstan wêran bîyo bilbilê ci zî (heskerdoxê welatî) feryad û fixanî mîyan de mendê:

Welat dawo verê gulan
 Gulîstan mendo bê vilan
 Kerdo zindan ro bulbulan (Licokic, 2014: 22).

Reyna şîrranê Licokicî de hêvîya welatî mendiş, hesreta ci antiş, xeyalê yew wuslatî yo:

Axînê m' welat, ez to bipawî
 Xort û xaman rê rahîr binawî (Licokic, 2014: 10).

Kitabê şîrranê Malmîsanijî, Herakleîtosî de zî zafane babete û temayî, meseleyê komelkî, derdê şarê kurdî û tarîxê kurdan o. Nê şîrran de eşq seke binê sîya meseleyanê sîyasîyan de mendo û zaf zêde nîasêno. Coka sey tema, şîrrê nê kitabî lîrîk nîyê û temaya eşqî û derdê zerrî zaf zêde tede çin ê. Beno ke nê meseleyanê komelkî û sîyasîyan ra gîrêdaye seba eşqî texîrkerdişêk û pawitişêk est o. Sey nimûne şîrra bi nameyê “Pawitiş” de şâîr na mesele wina ano ziwan:

Mesajê partî pawitiş, / embaz pawitiş
 -wa goşê yînî bireqê- / hela ayê ki erey kewenê,
 mektubê waşta pawitiş... / Derdê pawitişî nêancêno (Malmîsanij, 1988: 49).

La badê nê kitabê eyê şîrran, ê şîrrê Malmîsanijî yê ke Kovara Vate de vejîyayê de, eşqo fanî sey tema hîna zaf ameyo şuxulnayene û no derd şâîrî wel keno, zerrî lete bi letê keno ke kozirmeyê şewatî yo (Malmîsanij, 2009).

2. Sey Temayêka Tesewufî Wuslat û Fîraq

Edebiyatê zazakî seba ke berhemê xo yê nuştekî zaf erey dayê û yew trâdîsyono bêmabêن yê nuştişî zazakî de nêvirazîyayo seba edebiyatê zazakî, ma rasterast nêeşkenê behsê dewrêkê klasîkî yê edebî bikê. La ewro serdemê modernî de zî edebiyatê zazakî de heman wextî de hem şîrê terzê modernî hem zî şîrê terzê klasîkî yenê nuştene. Nê serdemî de, WK Merdimîn (1954) sey temsîlkarê şîrra terzê klasîkî nimûneyêko balkêş o ke ey serdemê modernî de şîrê xo bi terzêkê klasîkî nuştê û nameyê kitabanê xo yê şîran zî sey usulê edebiyatê klasîkî bi nameyê Dîwan û Dîwano Nêmcet name kerdo. Ey şîranê xo de sey tema hîna vêş meseleyê komelkî, wayîrvejîyayîşê kulturê xo, nezanîya şarî, xohesîyayîşê şarî şuxulnayê. Yew xususiyetê şîranê Merdimîn zî oyo ke şîrê ey didaktik ê, o şîranê xo de bi fekê şarî, zaf zêde şîretan keno (Merdimîn, Dîwano Nêmcet, 2015). Şîranê Merdimîn de ge-ge temaya eşqî est a la no eşq, eşqêko ılahî yo. Coka şîranê ey de xoresnayîşê waşa yanî wuslat çîyêko bêîmkân o. Coka êdî seba şâîrî rayerê waştîye de (eşqo ılahî) gêrayîş, xoresnayîş ra hîna muhîm o:

Pêresayîş waştî rê sere medejne

Resayîş ca verde, cigêrayîş weş o (Merdimîn, 2015: 60).

Edebiyatê tesewufî de bi saya nê gêrayîşî aşiq kemelîyeno ke Merdimîn zî nê beytanê corênan de behsê ci kerdo. Aşiq o ke bikewo dimayê wuslatî û kemîlîyayîşî zano ke no rayer rayerêko zaf zehmet û bidej o. Nê rayerî de keyf û şayî ra vêş zehmetî, derd û kederêko bêderman est o. Merdimîn cér ra şîrêka xo de bi muqayese û telmîhan behsê na mesele keno:

Heme sînayey, keyf û şayî ra sermest ê

Labelê, barê ma r' heredîyayîş kewto

Leyl û Mecnûn, Mem û Zîn aşiq' namedar ê

Sey Mansûr, barê ma r' dardebîyayîş kewto (Merdimîn, 2015: 53).

Herçiqas şâîr rayerê wuslatî de nê heme zehmetî û derdan antişî rê zerrî ra razî bibo zî o zî zano ke wuslat (resayîşê waştî, vînayîşê waştî) çîyêko bêîmkân o. Coka seke beytanê xo yê cêrênan de behs keno wuslatî ra hêvîya xo bibirno zî xeyalê ê fîkrî bi xo eşkêno hêz bido ey:

Vînayîş' waştî ra, ma hêvîyê xo birna

Labelê, tena fîkr û xeyal ma rê bes o (Merdimîn, 2015: 44).

La reyna zî ma ca-ca vînenê ke şâîr hêvîya xo ya wuslatî (vînayîş û pêresayîş) qet nêbirmeno û seba nê zî hazir o ke heme zewq û sefayanê na dinya ra dest û linganê xo bianco:

Merdimîn, tayê zewq û sefa y' xo wazenî

Axret de, "vînayîşê cemal" ma rê bes o (Merdimîn, 2015: 45).

Seke na beyta corêne ra zî eşkera aseno şîrânê Merdimînî de eşq, eşqêko ılahî yo. Şâîr seba ke Homayî ra, cemalê ey ra dûrî yo û nêreseno ci fîraqêkê girdî mîyan de yo. Coka seba ke o xo derd û kederê nê fîraqî ra bixelesno, razî yo ke heme zehmetîyan bianco. Çike eyî rê “vînayîşê cemalî” bes o.

3. Sey Eşqê Fanîyî, Wuslat û Fîraq

Mefhûmê eşqê ılahîyi, yew mefhûm o ke aîdê edebiyatê klasîkî yo. Coka zafane şîra moderne de eşqî ra, waştîye ra qesd, sey metaforîk eşqêko ılahî nîyo. Yanî şîra moderne de eşq, eşqo fanî yo û waştî/ye, waştîyêka/o rastikêñ û fanî ya. La xoresnayîşê nê waştîyanê rastikênan zî zaf zehmet o û edebiyatî mîyan de, çi edebiyato klasîk beno ci edebiyato modern beno dejê eşqî, eşqî ra girdêr o. Seke Kojin Karatani bala ma ancena ser;

“Mefhûmê “sewda”, “sewdaya bengîne (tutkulu sevda)” mefhûmêko aîdê Ewropaya Miyanêñ û ê xrîstîyanîye yo ke sey “nêweşîyêk o. No mefhûm Yunanê Kehenî de û Roma de çinî bi. Ê şarê ke eleqeyê ïnan bi xrîstîyanîye çinî bî, ïnan de zî na nêweşîya adirine, sewda bi wasitayê/rayîrê edebiyatî, edebiyatê modernî rê zî neqil bîya” (Karatani, 2021: 104).

Rojhelat de zî mîyanê edebiyatê tesewufî de zafane eşq û sewdaya bengîne, eynî mîsyonî vînenê. Helbet no tradîsyon û kulturo dergûdila serdemê modernî de yew reyde nêwedarıya. Beno ke eşqî serdemê moderni de şekil bedilna la eşq, îdealîze kerdişê waştî/ye, derdê pênêresayış û fîraqî, omîdê wuslatî şîra moderne de zî zaf zêde est ê. Seba ke şîra zazakî zafane berhemê xo serdemê modernî de, sey nimûneyanê edebiyatê modernî dayê, ma do nê beşî de çend şâîranê serdemê modernî yê ke berhemanê ïnan de eşq sey eşqê fanîy ameyo diyene, ey ser o vinderê. Ma do goreyê terz û uslûbê nê şâîran, şîrânê ïnan de şuxulnayîş û ewnîyayîşê mefhûmê wuslat û fîraqî ser o vinderê.

Îhsan Espar (1956) bi hîrê heme kitabanê xo yê şîrân; Dilopê Zerrî (2008), Sanikêka Heskerdişî (2014), Rengê Şewe Zerrîya Mi de (2018), şîra zazakî mîyan de ca gêno. Şîrê Esparî bi ziwan û uslûbê xo mîyanê şîrânê zazakî de bale ancenê. Ziwanê ey şîrkî, xeyalkî û metaforîk o. Şîrânê ey de sey tema behsê tayê meseleyanê komelkî bibo zî esasê xo de zafane eşq û estetîzekerdiş, erotîzm hîna vêş o. O bi terzêkê lîrîkî heskerdiş û eşqî mojneno ra. Şîrânê Esparî de zaf reyî, eşq û temsîlyetê nê eşqî, waşta, bi şekîlêkê zaf nazenînî teswîr benê. Na waşta hem bi mezîyetanê xo yê fîzkîyan hem zî hetê ruhanîyetî ra yena teswîr kerdene. La seba ey waşta, a kes a ke merg zî aye ra bêro sere û çiman ser o yo: “Xwezî gangêrê her kesî waştaya ey bibînî!” (Espar, 2020). Waşta tena gangêr nîya felek bi xo ya ke şâîr çerxê aye de çerixîyeno, heta xaliq bi xo ya ke şâîr evdê aye yo (Espar, 2020: 60). Na waşta gangêr biba zî reyna zî şâîr heme dej û keder o ke aye ra yeno qebûl keno. Şâîr zafane, bi qebulkerdişêk, hesret û pawitiş pabeyê aye yo. Sey nimûne şîra eya bi nameyê “Orkîdeyî” de (Espar, 2020: 63), pawitişêko bêderman est o. La no pawitiş seba şâîrî heme çîyî ra muhîmîr o:

Bêrîkerdiş îbadetêde tewr ferz o!

Ey rê ne yew kitabo pîroz

Ne zî yew perestgeh lazim o (Espar, 2020: 150).

Yanî eşq bi xo esasê xo de seba pawitiş û bêrîkerdişî yo, şâîr seke nê pawitîşî ra hes keno û ey ra hêz gêno:

Ez to ra hes kena / Tena seba ke ez bêrîya to bika!

Ti bêrîya mi kena / Tena seba ke ti mî ra hes kena! (Espar, 2020: 118).

Seke nê nimûneyan ra zî aseno melankolîyê pawitiş û fîraqî bi xo, kar û gureyo sereke yê şâîrî yo. Bi derdê pawitiş û fîraqî şâîr hertim venga waştîya xo dano:

Ya herra şîîra eşqî! / Ya şâîra mehzûne! / Bê mi mehrum meke rehma xo ra / Bê, mi biveşne adirê makîya xo de! (Espir, 2020: 140).

Seke nê beytanê corênan ra zî aseno “waştîya” ke morê xo dayo şîîranê Esparî ro çime û herrîya şîîra ey bi xo ya. A zafane şâîrî makîya xo mîyan de biveşna zî seba şâîrî mertebevê Homayî de ya. Û beno ke rojêk a, şâîrî rehma xo ra mehrûm nêka û şâîr waştîya xo reyde bireso wuslatî. Zafane, fîraqî, derd û elemê pawitişî morê xo dayo şîîranê Esparî ro û o bi hostatî derd û kederê fîraqî teswîr keno. La şîîranê Esparî de wuslat zî ge-ge virazîyeno ke nê gamî sey wextêkê bêemsalî yê. Şâîr nê gamanê nadîdeyan bicoş, şewk û şehwetî teswîr keno:

Çimanê to yê lîlan de roşnîyêka homayî

zerrîya mi de şewqêko mestbîyaye mend.

Şermeyê to keweyîya qedîha krîstale de

guneyê mi verika şewêka şade de mend (Espir, 2020: 45).

Gamê wuslatî, şîîranê Esparî de zaf tay ê. Herçiqas nê gamî zaf tay bibê zî, şâîr game û sehneyanê wuslatî zî qasê fîraqî bi hostatî teswîr keno. Coka nê gamanê wuslatî de, şîîra ey, bi coşê wuslatî xurt bena. Xora seba şâîrî nê gamanê bêemsalan de seke heme dinya vindena. Esasê xo de a game de “îllehî tayê” kar û gureyanê cîyayayan kenê la seke tenya o û waştîya xo; bedenê her dîyino ke beno yew, est ê, a game de.

... Gama ke dinya lîle bena / êdî çime ma konî / goşê ma kerrî

û lewê ma / gala yewbînî kenî (Espir, 2020: 165).

Nê gamê wuslatî yê nadîdeyî hezar bextîyarî, şadî û şahîyan zerrîya şâîrî de virazenê. Nê gamanê wuslatî de êdî waştîşo tewr gird oyo ke nê gamê bêemsalî nêqedîyê. Zafane şîîra moderne ya zazakî de yew çerxê wuslat û fîraqî est o ke şîîranê Esparî de zî ma nê çerxî vînenê: Fîraq (Demêko zaf derg û bidej o, zafane şîîrî seke nê fîraqî ra welidîyenê û nusîyenê) – Wuslat (Zaf kêm virazîyeno, sey vistikêkê wextî yo. Wexto ke bêro bi coş û êdî no wuslat, manaya cuye û na dinya

yo.) – Reyna Fîraq (Badê ê vistikêkê wextê wuslatî hertim reyna fîraq o.). Nê çerxê Fîraq-Wuslat-Reyna Fîraq de armancê zafê şâîran xo resnayîşê ê demanê zaf kêm û tayanê wuslatî yo ke badê ci bi fîraqî, reyna feryad û fîgan o. Coka zafane şîîranê Eşparî de nê vistikêkê gamanê wuslatî de, şâîr wazeno ke êdî na vistika wextî ra bialiqîyo û bimano. Çunke şâîr zano ke na gama bêemsale ya wuslatî ra vêş mîyanê cuye de, seba ey êdî bextîyarîyêk nêmenda. Yanî nê gamê wuslatî seba şâîrî temambîyayîş bi xo yo û seke a game de êdî o eşkêno cuya xo temam biko ke do çimê ey akerde nêmanê:

ez Xalîqê Corênî ra vana / -eke ti gênî / ganê mi nika bigîre

Binê nê dîmenî de / linganê na cinîke ver de (Eşpar, 2020: 167).

Deniz Gunduz bi kitabê şîîranê xo û tayê şîîrê eyê ke kovara Vateyî de çap bîyê wayîrê yew terzê cîyayî yo. Şîîranê Gunduzî hetê uslûb, ziwan û temayanê cîyayan ra bale ancenê. Şîîranê ey de yew ziwano metaforîk û xeyalkî est o. Şîîrê ey hetê babete û temayan ra zafane meseleyanê komelkî û estbîyayîşî ser o bale ancenê. Şîîranê Gunduzî de eşq û lîrîzm zaf zêde çin o. Eşq bi feryad û fîxan û lomeyanê fîraqî ya nêno teswîr kerdene. Eşq seba Gunduzî o çîyo ke di waştîyî resenê pê û wexto ke biresê pê hîna pêt û hézdar benê ke na pêtî û hézdarîye ra eskenê yew cuya newa biafirnê. Nê wuslat û pêresayîşê heskerdoxan ra yew dînyaya omîdwar, kewe û roşne ya ke coşêk cira vila beno, welidîyeno:

No birrê zerrîya to yo, ma gêrenîme pîya

Yew rayîro roşna vîyareno çimanê ma ra

Destê to destê mi de, ma benîme vîndî

Konîya ma keska êdî

Girîna, girîna, girîna (Gunduz, 2014: 40).

Şîîranê Gunduzî de, eşq û wuslatê di maşûqan, pîya awankerdişê yew cuya hêvîdar o. Hemverê heme dinya de, qayîdeyanê xedarîyan yê xedaran de vindertiş o, awankerdişê yew dînyaya newa yo. Sey nimûne şîîra ey abi nameyê Kay de, estbîyayîş û çinbîyayîş yew kayo ke qayîdeyê ci est ê, la gama ke “xedar/zalim” nê kayî, kay keno, bi xedarkî û zalîmî, nê heme qayîdeyan zî wele keno û verdano. La hemverê nê têgîrayîşê xedarî de, pêresayîş û wuslatê maşûqan ra hêvî vila bena:

La di maşiqî zî xo vîr a kenê qaydeyanê kayî

Tewr kayî bi xo zî / Tewr bi xo zî / O taw,

Raperîyeno asmên de yew mase... (Gunduz, 2016: 27).

Şîîra moderne ya zazakî de, ge-gane zî tayê qayîdeyanê komelkîyan ra, eşq zaf eşkera nêno ciwîyayîş. Coka gamanê wuslatan de zî xeşîmî û şermokî est a. Heskerdoxî nê gamanê nadîdeyan de, semedê nê qayîdeyanê komelkîyan ra nêeşkenê eşqê xo biciwîyê, heskerdişê xo bimojnê ra, zafane bi nimitkî heskerdiş

û hîsanê xo danê teber. Seke Roşan Lezgîn şîîrêka xo de vano, şewqê aşme zî sey çimşikitîşê waştîyêka şermokine yo, heskerdoxî yewbînan ra awiran remnenê (Lezgîn, 2005: 52-59). Tayê şîîranê Malmîsanîjî de zî aseno ke nê gamê wuslatî, seba ke erjê komelkîyê ke eşqî sey şerm, eyb, xirab û gune vînenê semedê ïnan ra, nêmcet manenê. Yanî qayîdeyê komelkî, dekewenê mîyanê gamanê wuslatî, dej û derd danê heskerdoxan:

Ez ke na balişna vînena, a yena vîrê mi:

Destê aye, destê mi de

Destê mi de, ereqê destê aye

-tersê pîy û birayan-

-dat û datîzan-

-der û cîranan-

-fitne û fesadan ra-

Peşmirîyayîşê şermokin yê lewanê aye (M, 2018: 23).

Semedê nê erjanê komelkîyan ra ke eşq sey eyb û şermî yeno vînayîş, şîîranê Malmîsanîjî de, zafane wuslat nêmcet maneno yan zî nêvirazîyeno:

qiseykerdiş eyb bi, destpanayîş, têhetvindetiş eyb bi,

Piyaroniştîş eyb! / lewepanayîş? / eyb o, eyb! (MM, 2021: 16).

Semedê nê erjanê komelkîyan ra coka ancax bi nimitkî, bi tayê emareyanê eşqî heskerdoxî heskerdişê xo bi yewbînan danê hîskerdene ke nê emareyê nimitkî yê eşqî zî esasê xo de gamê qiyemetinî yê eşqî û wuslatî yê:

merdim aye ra helbet çim şikneno.

Waşa nimitkî destmalêk daya merdimî,

Merdim a destmale herinda aye de şew û roj tewaf nêkeno? (MM, 2021: 16).

Seba eşqê fanîyî, wuslat yan çiyêko bêîmkan o yan zî eke bibo zî zaf kêmî yo. Ge-ge wuslat biviraziyo zî ê wextê nadîdeyî zaf kêm dewam kenê û peynîye de reyna fîraq beno para aşiqan/şaîran. Sey nimûne tenya yew şîîra Merdimînî de, şîîra bi nameyê Awir de, merdim eşqê fanîyî vîneno la na şîîre de no eşq, eşqêko nimitkî yo ke waştîyî ancax binê çiman ra ewnîyenê yewbînan ra û no eşqo ereymende reyna bi fîraqî ya qedîyeno:

Na peynîya demanê emrê ma de

ma yewbînan erey dî,

lez vîndî kerd (Merdimîn, Dîwan, 2015: 76).

Şîîra moderne ya zazakî de, şâîrêko balkêş o ke behsê eşqî keno Newzat Valêrî yo. Şîîranê Valêrî de zî reyna eşq, derd û kederê eşqî, waştîye ra dûrîmendiş

û pabeyê waştiye mendîş zaf zêde yê. Şîrânê Valêrî de zî derdê fîraqî hende derdêko pîl o ke ancax waştiye eşkena dermanê nê dejî bîba:

Valêrî vano ti ya gan, ti ya gula delale

Ti ya awa zelale, derd ez a ti ya derman (Valêrî, 2016: 21).

Seba Valêrî waştiye, darûya heme derdan a la a zî sey waştiyanê edebîyatê klasîkî hende zî zalim a:

Mi va ti darû nîya, va ney ney ez zehr a

Mi va wa bo kerem bike ez xo rê şâ bî

Va ney lawiko ney û vindî bîy û şîy... (Valêrî, 2016: 24).

Şîrânê Valêrî de zî çerxê Fîraq-Wuslat-Reyna Fîraqî est o. Coka wuslatî ra dima wexto ke reyna fîraq yeno, şîyayîşê yar bobelata bobelatan a, felaketo tewr gird o:

Ti şîya

Sêneyê mi de kerrayêka sîya menda

Yew cuya nêmcete de

Ereymendeyê miradê xo bîya (Valêrî, 2016: 17).

Valêrî şîrânê xo de nê çerxê Fîraq-Wuslat-Reyna Fîraqî bi metaforanê cîyayan bi mefhûmê wuslat û fîraqî ra gire dano. Yanî şâîr bi serrana pabeyê waştiya xo maneno (Fîraq), dima sey roşnî, sey wisarî, sey şenbîyayîşê xoza, waştiye yena (Wuslat), la no wuslat wuslatêko zaf derg nîyo, sey wisarêkê zurekerî yo û dima reyna zimistan (Reyna Fîraq) bi heme xezebê xo yeno ke na reye ezabê fîraqî hîna gîran beno. Çike êdî şâîrî yew game zî bîbo tahmê wuslatî girewto û no fîraqo peyên hîna gîran o.

La ti ke şîya ez zaf bîya tal / Zerrê mi de vildarêk bi huşk

Bi xiyalê to/Yew wisarê şenayî kena pîl (Valêrî, 2016: 27).

Ti ke şîya yarê

Ez paweyê yew wesarê şenayî ya... (Valêrî, 2016: 30).

No wisaro metaforîk, esasê xo de wextê ameyîşê waştî yo, wextê wuslatî yo. Tersê şâîrî yo tewr pîl êdî qedîyayîşê nê wisarî yo:

Ax ez tersena wisar zî biqedîyo

To ra dûrî ez dest pistan de bimana

Bêmirad bimira (Valêrî, 2016: 18).

Şîra zazakî mîyan de şîrê Îdrîs Yazarî zî bale ancenê ke nê şîrân de zî eşq, wuslat û fîraq temayê sereke yê. Şîrânê ey de zî nêameyîşê waştiye, pêneiresayîş (fîraq) cehennemo tewr gird o, merg bi xo yo:

Berî padîyenê / Kaş benê perdeyî
 Çilayî shinê hewn a / Bêrîya to bera har
 Şewe bera derg / Şewe bera verg
 Ne ti yena, ne zî merg! (Yazar, 2018: 30).

Pawitişê waştîye û şiyayîşê waştîye reyna di çekuyê sereke yê ke şîîranê Yazarî de zî xo mojenenê ra ke xidarîya fîraqî mojenenê ra. La şîîranê Yazarî de, şâîr êdî musayeyê nê fîraqî yo û coka no pabemendiş û şiyayîşî ra welûdîya edebî virazîyenâ:

Tena çekuyêk nîyo şiyayîş
 Yew cinî şina, yew lacek beno şâîr (Yazar, 2018: 23).

Reyna seba Roşan Lezgînî zî afîrnayoxa şîîre, waştî ya ke o ‘şîîran çimanê yara xo ra çîrr bi çîrr doşeno’ û boyâ şîîran viranîya waştîye ra alêseno (Lezgîn, 2005: 70, 42).

Şîîranê Yazarî de, no dejê eşqî sey ewnîyayîşê edebîyatê klasîk û tesewuffî, esasê xo de kamilbîyayîşê ruhî bi xo yo:

Asin bi adîr cerebîyeno / Û ruh zî bi dejê eşqî (Yazar, 2018: 24).

Êdî no derd bîyo parçeyêkê nuştoxî, cuya ey û emrê ey:

Zerrî tehmê enê derdê şîînî girewto!

Wa bi pawitiş biviyaro emrê mi, se beno? (Yazar, 2018: 28).

Çike şîîra moderne de zî wuslat hende mefhûmêko asan nîyo, wuslat bêîmkân o ke hetanî a roje bêra êdî şâîr wele beno û şîno:

To ke ez / Qebul kerda / Ez tawa nêmendîbî.

Kulmê wele bîya / Bierze vay ver / Wa şoro (Gedik & Gedik, 2021: 56).

Şîîranê Xidirê Başî de zî waştîye dermanê heme derdan a. La a qet nêna rehme û xora mabênenê aşiq û maşûqe de sey telîyê ke mabênenê gule û bilbilî de yê, hertim fesadî est ê. Yanî ê metaforê edebîyatê klasîkî, gul, bilbil û telîyî şîîranê Xidirê Başî de zaf zêde ameyê şuxulnayene ke o esasê xo de bi usûle qayîdeyanê şîîra şarî/fekkî û bi ziwanêkê zaf sadeyî û bi fekê şarî, şîîrê xo vatê û nuştê. Ancax beno ke Xiziro Kal bieşko zerrîya yar “har” bikero coka şâîr, şîîranê xo de venga Xizirê Kalî dano ke o werte ra ê fesadanê ke zaf heskerdoxê sey Leyl û Mecnûn zî yewbînan ra aqitnayê wedaro û yara ey hemverê ey de nerm kero. La nê şîîran de wuslat qet çînîyo û şîîrê Xidirê Başî binê zarezara fîraqî de nalenê. Şâîr şew û roj naleno û venga heme pîrozanê şarê elewîyan yê sey Xiziro Kal, Goşkar Baba û Girê Boxayî dano:

Şîyo Înîyê Xizirî hetanî çime
 Xiziro Kal qelbê to mi rê har kero (Başî, 2012: 53).

Xizir bêro comerdiye / Erê mi meymanê to kero (Özmen, 2021: 43).

Sey zafê şâîranê elewîyan şîîranê Suleyman Ozmenî de zî derdê eşqî derdêko bêderman o û dermanê nê derdî, ‘melema’ nê derdî tenya waştî ya. O şîîranê xo de waştîye sey “melema mi”, “kivara mi” name keno la na waştîya kubar û meleme zaf bêînsaf, bêrehm û zâlim a. Coka şâîrî xo eşto heme pîrozîyanê şarê elewîyan yê sey Xizir, Fatma Ana, Duzgîn û Munzûrî:

De vaze kivara mi vazê
 To ça naz kena
 Zerû piskê mi wena
 Şimê bextê Ana Fatma
 Ma rê juya xêre vana
 Kena ju muye
 Gola Xizir de şona (Özmen, 2021: 76).

4. Şîîranê Şâîranê Cinîyan de Wuslat û Fîraq:

